

مهحفه

گوڤاره کا رهوشه نیری وهرزانهیه
g.mehfel@yahoo.com

3 ژماره:



ژهستانا 2011 - دمهوک

مهحفه 3

2011

Mehfel 3



المحفلة

مجلة ثقافية فصلية

العدد

(3)

شتاء

2011

صاحب الامتياز
ريسان حسن جندي
resandinay@yahoo.com
0750 4501690

رئيس التحرير
كوفان ريسان خانكي
Xanki_kovan@yahoo.com
0750 4969810

سكرتير التحرير
حجي مغسو حسو
Hijy_mag2010@yahoo.com
0750 4576304

هيئة التحرير
مصطو الياس الدناني
مروان شيخ حسن رشكاني
الياس نعمو ختاري

الخراج الفني
خانكي

g.mehfel@yahoo.com

(272) (2010/6/10)

نافهروك

بشكا كوردى

- سه رنقيسكار سه رنقيسكار
- فه كو لينه كا نافهروكي - فورمي بو ته كستى "مه مي شان" كو فان خانكي 1
- دهرويش و مير براهيم نادهم مهروان شيخ حه سهن رهشكاني 12
- سه رهاتيا حه سو و كه له شى مستو نه لياس دنايي 25
- فهو لي به ديلا سنعته كامل ب: شيخ دهشتي ي شه مساني 31

المحتويات

القسم العربي

- عقيدة التناسخ عند الايزيدية د. عماد عبدالقادر 34
- مسرح الطفل: الاهمية، الدور الوظيفي البنائي، آليات العمل... ا. د. تيسير آلوسي 38
- النفس البشرية من خلال آراء بعض الفلاسفة ريسان حسن 51
- عرض و تعليق كتاب: بقايا الميثرائية و آثارها في اليزيدية حجي مغسو حسو 58
- حوار الاديان و مستقبل العراق ... رؤية ايزيدية حسو هورمي 66
- التنظيم الديني و الطبقي للايزدي ممتاز حسين 75
- الوقف و أمواله و أملاكه و القوانين في الأوقاف و الشؤون الدينية حسن الجوتيار 83
- شطحات نسرین اليوسف 90

Naverok

Kurdî – latîni

- Qewlên êzdiyan Dr. Eskerê BOYÛK 1
- Mûzîk, Dans û Şarqîyên Kurdî Dr. Nûra Cewarî 13
- Karê bûn (Verb to be-Être) Dr. Deham Ebdulfetah 22
- Em şaristaniya ku êzdiyan li ser erdnîgariya kurdistanê
destpêkiriye nasbikin û biparêzin Kemal Tolan 36
- Ji dîroka rexneya wêjeyî kurdî Heyder Omer 40

سەرگۆتار

سەرئەفەندى

ئەم دە چەلەيى زەفستانى دەنە و جەژنا چەلەك ئەمەيە، لەورا ئەفەندى جەژنى ل تاما چەلەگر و زەلامىن خوەيىن ئۆلى و تەفایا ئىزدىيان پىرۆزى دكن و هيفيدارن ژ خوەدى مەزن رۆزىين چەلەگرين مە قەبۇل بكت و ئەفە جەژنە ژى ب خىر و خوەشى د سەر مەرە دەرياز بىت.

خوەندەفانىن دەلال.. ئەم تەم داخوازى ژ قەولبىژ و مجبور و زەلامىن خوەيىن ئۆلى و كەسانىن كو قەول و بەيت و قەسیدەيىن دىنى و ھەروسا تەكستين فلکلورى و سەرھاتى ل جەم ھەن؛ ژ ووندا بونى رزگار بكن. ژ بەر كو راستە وان ئەفە سامانە پاراستى يە و زەحمەتەكە مەزن قىرە بريە تا كو قورتالكرن، بەلى بەريزان ئەوى ژى بزنانن كو ئەفە كەلتورە ملكى تاما ئىزدىيانە و نەيى وان تەنى يە، چەنكو دەما ئىكى وەكى شىخ فەخرى ئاديا قەولەك چىكرى ئەوى ژ كەسەكى ب تنى رە چىنەكريبە، لەورا ئەگەر ھوون (ئەقین ئەفە تشت ل بالى) فى سامانى رزگار بكن و نەھيلن ووندا بىت؛ ھوون دى خزمەتەكە مەزن ژ ئۆلا خوە رە كن، ژ بەر كو راستىيا ئۆلا مە و زۆربەريا رى و رەسمين مە د قەولان دەيە (نە گشت قەولان)، و راستىيا

تارىخا مە ژى د ستران و سەرپىھاتىيان دەيە (نە گشت سەرھاتى و ستران)، و دەما ئەفە ھەردوو توشى نەمانى دبن، ھنگى تارىخا مە و ئۆلا مە بەر ب نەمانى دچت و ئەز پرس دكم ئەگەر مللەتەك، يان ئۆلەكە بى تەكستين خوەيىن ئۆلى بت و بى ميژوويەكە راست و دورست بت دى چەند خوە راگرت و خەلك باوەريى دت؟ باش بزنانن ھەر قەولەكى ووندا دبت ئەو ھنگى ب دەھان رى و رسم و پەيف و ياسا و دەستور و پىرۆزى و ...ھتد يىن ئىزدىياتيى ب ئاسانى ووندا دبن، ب من وەرە ئەفە ژى زەرەرەكە مەزنە ھوون ل ئىزدىياتىيا خوە دكن ئەو ئىزدىياتىيا ب سەدان خاس و چاكان د درىژاھىيا دىرۆكى دە ئافاكرى و پاراستى و خزمەت ژىرە كرى و يا كو ب ھەزاران سەرى خوە لى دايى، بى گومان دەما قەولقانىن مە يىن خودان شىان ئەفە قەول و بەيتە دقەھاندن ھنگى دورست نەكرنە دا كو د قەشارتى بن، بەلكو وان وى دورست كرن دا كو بگەھنە بەر دەستين مە و ئەم تەم بخوەندن و مفا يى ژى ببينن، و ئەفە سەردەمە ژى نە يى ھندى يە نەويىن تەكستەكى خوە يى ئۆلى بەلافە بكن، بەلكو ب دەھان رۆژنامە و گوڤار و مالپەرين ئىنتەرنىتى ھەنە ھوون دكارن بەلافە بكن، ھەروسا ئەفە تەكستين بەلافەكرى ژى ھوون دكارن سەرراست بكن، ژ بەر كو گەلەك كەس ھەنە د شارەزانە د قەول و بەيتان دە و دزانن كيژان پەيف يە غەريبە و چاوە كەتییە ناف قەول؟ لەورا ئەفە ژى خزمەتەكە مەزنە ئەگەر ھات و كەسەكى ئەفە چەندە كر و ب من وەرە ژى خزمەتەكە مەزنە، ژ بەر كو ئەو ناھىلت كەسەكى دن وى قەولى شاش بخوەندت. ئەفە ژى كارەكى مەزنە تو رىيا راست رابەرى كەسەكى بكى، خوەدى ھارىكارى مە تاما بت.

دهفئ تهكستی:

بینن بینن
بۆرئ مەمئ بینن
زینی ل سەر دایینن
تەنگا ئی ب شیدینن
مەم ژ نوورا بخوینن

بۆرئ مەمئ ئانی
زین کر وەکە دزانی
مەم ل سەری مەیدانی نوورانی

بۆرئ مەمئ شی یە
رەش کربوون دەست و پی یە
مەم خاسئ خودئ یە

شیر بۆرئ مەمئ یە
رەش کربوون دەست و ئەنی یە
ناف خاسیت شیخادی یە

مەم خەلکی دوو بییری
گونەهکارا نە ئازییری
هەموو ژ شیخادی دفی

ئەو قوبا ل دوبانە
دوو شیر ل سەر راوەستانە
یەک مەمە یەک عەبدلرەحمانە

داسنی کوولو جەمە
دووملی ب قەومئ خوەفە
ل پی پرا سەلاتئ مەمە شاباش مەمە^۱

^۱ بەدەل فەقیر حەجی: باوەری و میتۆلۆژیا ئیزدیان، دەوک ۲۰۰۴.

خواندەنەکا ناھەرۆکی – فۆرمی بۆ تەكستی "مەمئ ششان"



کۆفان خانکی / زانکۆیا دەوک

پێشەکی:

گەلەك ژ خاس و بابچاکین ئیزدیان قەول و قەسیدە و بەیت پی هاتنە گۆتن، بی گومان ئەف پی گۆتنە زی ژ فالاتییی نەهاتنە، بەلکو هەر یەکی ژ فان خاسین ئیزدیان ژ کنارەکی قە جەهەکی خوە پی گرنگ د ئیزدیاتییی و جفاکا ئیزدیان دە گرتییە، ئیک ژ وان مەمئ ششانە کو قەسیدەکا تایبەت پی هاتییە فەهونان، ئی ئەم نزانن کی ئەف قەسیدە نفیسییە.

نافەرۇكا تېكىستى: وەكە تى زانين كو مەم شقان ب خودافەندى پەزى دناف كەلتورى ئىزدىياتىيى دا دەھتە ناسكرن، ئەف يەكە دنافا تەكستى زى دا خويا دبت، دەما كو سەبەقە دىبىژت:

بينن بينن
بۇرئ مەمى بينن
زىنى ل سەر داينن
تەنگا ئى ب شدينن
مەم ئ نوورا بخوينن

مەمى شقان نھا وەكە خودافەندى پەزى و ھەر وسا خاسەكى ئىزدىيان يى گرنگ جھ گرتىيە و نيشانگەھا وى ل چەندىن جھان ھەيە، نەخاسمە ل كۆمەلگەھا خانكى كو جھەكى بەرفرەھ ژ مەزارىن خاسىن ئىزدىيان ل بەر فى مەزارى ھەنە، دىبىژنى: زىوا مەمى شقان. ئانكو مەمى شقان خاسەكە گەلەك نيشانگەھ و قوبىن خاسىن ئىزدىيان ل بەر زىوا وى ھەنە و ئىزدى رىز و بەھايى دندى و چەندىن رى و رسمان ل بەر مەزارى وى دكن، تەكستا وى زى ئەفئى چەندى تەكەز دكت و مەمى شقان وەكە خاسەكى خودەدى ددت زانين:

بۇرئ مەمى شى يە
رەش كرىوون دەست و پى يە
مەم خاسى خودى يە

ھەر وەسا رىزگرتنا ئىزدىياتىيى ژ گيانەوھران رە گەلەك ھەبوويە و گەلەك ژ فان گيانەوھران جھەكى گرنگ دناف ئۆلى دا گرتىيە و كەتتە د نانا رى و رەسمان دە زى، وەكە؛ گا، مارى رەش، غەزال، شىر، تاووس، مېھ و ... ھتەد. سەرھرايى پەيوھندىيا مەمى شقان ب پەزى فە و وەكە خودافەندى وى ھاتىيە ناسكرن؛ ديسان پەيوھندىيەكا وى دگەل شىر زى ھەبوويە، ئى ئەفە ھەككى نە يە زەلالە، باشتىن نمونە كو شكلى دوو شىران ل سەر ناناھىيى مەزارى وى ھاتىيە كشاندىن، ھەر وەسا ئەف شكلى شىر نە تنى ل سەر مەزارى مەمى شقان ھەبوويە، بەلكو ل پەرسىتگەھا لالش و ھەر وسا ل سەر مەزارى مەھما رەشان ل چىايى مەقۇبى شىخا زى ھەيە، تەكستى مەمى شقان زى ئەفئى پەيوھندىيا مەمى شقان ب شىرى رە ئەشكەرە دكت و شىرى وەكە بۇرئ مەمى ب نانا دبت:

شىر بۇرئ مەمى يە
رەش كرىوون دەست و ئەنى يە
نانا خاسىت شىخادى يە

ھەر وەسا دەسبەقەكە دن دە باسى قوبا مەمى شقان دكت كو جھى وى ل دووبانا دنايە، ھەر وەكى چاوە نھا باش يە ديارە و جھەكى خوە يى گرنگ ل دەفەرئ و نانا ئىزدىيان ھەيە، ديسان ژ تەكستى ديار دبت كو رامانا ئەفان ھەردوو شىران ئەوہ كو ھەردوو ھىمانە ژ بو مەمى شقان و برايى وى عەبدولرەھمان:

ئەو قوبا ل دوپانە
دوو شىر ل سەر راوستانە
يەك مەمە يەك عەبدولرەھمانە

ھندەك نامازە ب كورتى:

سەرھرايى فان رۆنكرنن نافعروكى يىن ل سەرى، دخوازم ھندەك رۆنكرنن بلەز بدەمە ھندەك پەيقتىن دن يىن دفى تەكستى دا ھاتىن:

- **خاس:** پەيەكا دىنى يا بلندە، د نانا ئۆلىن دن دە پىغەمبەر ھەنە، ئى يىن ئىزدىيان خاسن، ئى ئەف خاس نە پىغەمبەرن. ئىزدىيان ھەژمارەكا زور يا خاسان ھەيە و مەمى شقان زى ئىكە ژ وان خاسان.

- **شىخادى:** ل فر ئەم نزانن ب دورستى ئەف تەكستە باسى كى شىخادى دكت، يى ئىكى يان يى دوويى.

ئەگەر شىخادى يى ئىكى بت؛ يەك ژ خاسىن ھەرە گرنگ يى ئىزدىياتىيى يە، ل دەردۆرىن (۱۰۷۲) ز، ل گوندى بىت فارى/ ل بەلەبەگى ھاتىيە دنايى، پشتى مەزن بوويى قەستا پەرسىتگەھا لالش كرىيە و ل (۱۱۶۲)ز، ل وىرئ قەدەم گواھىستىيە و ھاتىيە فەشارتن.

ئەگەر شىخادى يى دوويى بت؛ كورئ شىخ حەسنى داسنى يە، ل (۱۱۶۲) ھاتىيە دنايى و بو ماوھىەكى ل گوندى بوزان/ قەزا شىخان زىايە، رۆلەكى گرنگ ھەبوويە د رىفۇرما ئىزدىياتىيى دا، ل (۱۲۲۳)ز، قەدەم گواھىستىيە و ل پەرسىتگەھا لالش ھاتىيە فەشارتن.

ژ بەر رۆلى وان يى گرنگ د ئىزدىياتىيى دا چەند قەول و بەيت پى ھاتنە گۆتن و نانا وان زى دچەندىن سەبەقەيان دا دەھت، ئى گەلەك جارن زى خوەندەفان نزانن ئەفە باسى كى شىخادى يە، ئەفە زى پىدفى ب فەكۆلىنن زانستى يە.

- **دوپان:** دەفەرەكا بەرفرەھە كو دكەفتە دناقبەرا رۆبارى (خابور و دىجلە) دا، فىگا ھندەك جارن دىبىژنى: دەشتا سلىقانەيا، دەفەرا دوويانى چەندىن گوند و دەفەرئ ئىزدىيان ئى ھەنە، مينا؛ مەم

شقان، قەسر ئۆزىدىن، رېيى، كەبەرتو، خانك، سۆرگا، خېراڧا، زەينىيا و...ھتد، مەزارى مەمى شقان ۋى دكەفتە جھەكى ديار يى فى دەفەرى.

- **عەبدلرەھمان:** ئەم چ ۋ فى كەسايەتتىن نزانن، تىنى دزانن براىى مەمى شقانە ھەر وەكو تەكست ديار دكت و نيشانگەھا وى ۋى ب رەخ ستونا مرازان فەيە ل پەرستگەھا پىرۆز يا لالاش.

- **داسنى:** بەرى ۋ ئۆزىدىن را ھاتىيە گۆتن داسنى، ھەتا فىگا ۋى پاشماۋى فى پەيىقى مانە و دىيژنە دھۆكا فىكا؛ دھۆكا داسنى يا، ئانكو دھۆكا ئۆزىدىن، چونكى بەرى جھى ئۆزىدىن بوو.

- **دووملى:** نافي ئىلەكا ئۆزىدىنە و ل چەندىن جھان د بەلاقەنە، مەمى شقان پىرى وانە، ھندەك ۋ مالين فى ئىلى نھۆ ل كۆمەلگەھا شاريا/ پارىژگەھا دھۆك دژين.

- **پرا سەلاتى:** د باوهرىا ئۆزىدىن دا ئەو پەريە دەما كو كەسى ئۆزىدىن دىمىرت د سەر فى پىرى را دەرياز دكن، ھەر چەندە پەركە ديار ب فى نافي ل پەرستگەھا لالاش ھەيە (پرا عنزل)، و دەھمان دەم دا جارنان ئەف پە وەكە پەركە نە ھەست پىكرى ۋى دەيت.

فۆرمى تىكىتى:

فۆرم ۋ بۇ ھەر تەكستەكى ئەدەبىي گىرنگىيا خوە ھەيە و نەخاسمە ئەگەر ئەو تەكست تەكستەكى وەكى شعرى بت، بى گومان فۆرمى تەكستەكى وەكە شعرى ۋ چەندىن پىكھاتەيان پىكھاتىيە ھەتا كو دەفەك ھاتىيە ئافراندىن؛ مينا كىش، سەروا و پىكھاتەيىن دن، ئەم ۋى ل گۆرەيى شيانان دى ۋ فى كىنارى فە ۋى تەكستى خوە شروڧەكن.

كىش: ۋ گشت وان بىرگەيان پىك دەيت كو دىرا ھۆزانى دورست دكن و رىكخستەكى د شعرى دا پەيدا دكن، ئەفى ۋى رۆلەكى خوە يى گىرنگ د تەكستەكى مينا شعرى دا ھەيە، و وەكە ئاوازا تەكستى "شعرى" دەيتە ھژمارتن، و ئەف كىشە ۋى ئىك ۋ وان تايەتمەندىانە، يان ۋى پىكھاتەيانە كو شعرى ۋ پەخشانى جودا دكت.

بى گومان ئەدەبىياتا دىنى ئۆزىدىن ۋى ب قەول و بەيت و تەكستىن خوە يىن پىرۆز فە بى كىش نەھاتنە ئافراندىنە، ئى ب تەكنىكا خوەفە ۋ شعرى د جودانە، ئى ۋ بەر كو مە چ بىردۆزىن تايبەت ب شروڧەكرنا ئەدەبىياتا خوە فە نىنن، ئەم نەچارن پىشت ب تىورين ئەدەبىياتى گەرم بكن:

- بىاننا بىاننا (۴) بىرگەيە
- بۆارىئا مەمى بىاننا (۶) بىرگەيە

- زىانى ل سەرا داىيانن (۷) بىرگەيە
- تەنكا لى با شادىانن (۷) بىرگەيە
- مەم ۋا نووارا اباخوىانن (۷) بىرگەيە

- بۆارىئا مەمى ئانىا (۶) بىرگەيە
- زىن كرا وەاكە دا زانىا (۷) بىرگەيە
- مەم ل سەرائى مەى دانى نووارانىا (۱۰) بىرگەيە

- بۆارىئا مەمى شىا يەا (۶) بىرگەيە
- رەش كرابوون دەسات وا پىا يەا (۷) بىرگەيە
- مەم خاسنى خوادىا يەا (۶) بىرگەيە

- شىرا بۆارىئا مەمى يەا (۶) بىرگەيە
- رەش كرابوون دەسات وا ئەانىا يەا (۸) بىرگەيە
- ناڧا خاسىتا شى خادىا يەا (۷) بىرگەيە

- مەم خەل كىئا دووا بىارىا (۶) بىرگەيە
- گونەھاكارا نە ئازىارىا (۸) بىرگەيە
- ھەمووا ۋا شى خادىا داڧىا (۸) بىرگەيە

- ئەوا قوابا ل دوابا نەا (۷) بىرگەيە
- دووا شىرا ل سەرا را وەس تانەا (۸) بىرگەيە
- يەكئا مەمەا يەكئا عەبادل رەح مانەا (۹) بىرگەيە

- داسانىا كووالوا جەامەا (۷) بىرگەيە
- دووام لى با قەوامىا خوماڧەا (۸) بىرگەيە
- ل اپىا پارا سەلاتى مەمەا شاباش مەمەا (۱۳) بىرگەيە

- وەكە دىبىنن كو (۲۲) رىزكن، ۋ سەرجمى ڧان رىزكان:
- كىشا (۴) بىرگەيى: (۱) جارى بكار ھاتىيە.
- كىشا (۶) بىرگەيى: (۶) جاران بكار ھاتىيە.
- كىشا (۷) بىرگەيى: (۸) جاران بكار ھاتىيە.
- كىشا (۸) بىرگەيى: (۵) جاران بكار ھاتىيە.
- كىشا (۹) بىرگەيى: (۱) جارى بكار ھاتىيە.

- A مهم خه لکئی دوو بیړی
- A گوننهکارا نه نازیری
- B هه موو ژ شیخادی دئی

وډکه دبینن ریژکا (۱ و ۲) ب په یقین "بیړی، نازیری" دگهل ههف د سهروادرن، ئی ریژکا سی ژ وان یا جودایه. سهره رای قی ریځخستنا سهروایی، دیسان ئەم سهروایا لاواز زی د قی بهیتئ دا دبینن، ب تایبته زی د سه بهقا داویئ دا:

داسنی کولوو جهمه
دووملی ب ههومی خو هفه
ل بی پرا سه لاتی مه مه شاباش مه مه

دیار کو په یقا "جهمه" ل ریژا ئیکئی و په یقا "مه مه" ل ریژا سی، سهروایا وان یا بهیژه، ئی نه هفه ههردووکه دگهل سهروایا ریژکا دوویئ یا لاوازه، چونکی ب نهرینا من، دهنکی "ه" ب تنی نکارت سهروایه کا بهیژه دورست بکت.

دیسان د تهکستی دا دیار دبت کو سهخمه راتی چیکرنا سهروایی په یف بیئ هاتینه گهورین و ب قی گهورینی چ مانایین په یفی نه هیرینه، تهنئ دا سهروایی چی کت، وډکه قی ریژکی:

بۆرئ مهمی شی په

ب نهرینا من په یقا "شی په" چ مانایا خوه د قی ریژکی دا نینه ژ بلی کو ب تنی ئه رکئی چیکرنا سهروایی و گیشی یی گپرایی، یا دورست زی نهو په یقا "شیره"، چونکی د ریژکه کا دن دا و چه نکو نهو په یف پیشقه بریبه و نه کریبه په یقا سهروایی ب دورستی دیار بوویه:

شیر بۆرئ مهمی په

ب کورتی؛ ئانکو ب فهر دیتی په کو گرنگی بی ب دته فورم و ئیستاتیکا تهکستی، پتر ژ هندئ کو مانایه کی بکه هینت ب تایه تی زی د وی ریژکا نافرئ دا یا کو په یقا "شیر" تیدا کریبه "شی" ئانکو بیتا "ر" لادایه، بی گومان لادان ژ یهک ژ خالیئ هه ره دیار و گرنگه ژ فورمی تهکسته کی وډکو یی شعری کو شاعر په ینایی دبنه بهر، و نه هف لادانه زی ل سهر چه ندین ئاستان وډکو لادانا فونیمان، یان په یقان، یان مانایئ و ... هتد دهیته نه نجامدان.

- کیشا (۱۰) برپه یی: (۱) جارئ بکار هاتیبه.
- کیشا (۱۳) برپه یی: (۱) جارئ بکار هاتیبه.

ژ سهرجه می فان کیشه یان، کیشا فولکلوری کوردی ب ریبا برپه یین (۷، ۸ و ۱۰)؛ (۱۴) جارن بکار هاتیبه، ب قی چه ندئ کیشا فولکلوری یا کوردی کونترولا تهکستی مه می شقان کریبه، کیشا فولکلوری یا کوردی زی؛ کیشه کا هه ره کهفن یا کوردی په، و په یدابوونا وی زی بو کوراتیبا تاریخی دچت.

سهروا: دهما کو فونیمین په یقین داویئ بیئ دوو په یقان یان زی زیده تر د دوو ریژکان و زیده تر دا د وکی ئیک بن، هنگی سهروا دورست دبت، ئی گشت چا خا سهروا د په یقا داویئ دا دیار نابت، نهو زی دهما کو په یقین پستی په یقا سهروا هاتن؛ هنگی په یقین سهروایی جهی خوه دگهورن و پیشقه دهین.

قهول و بهیتین دینی ئیزدیان زی ب سهروا و ب چه ندین جوړین سهروایی هاتینه ئافرانده، ژ بهر کو ژوربه یا قهول و بهیت و هه سیده یین ئیزدیان د سی ریژکینه، نه هف تهکسته زی ئیک ژ وانه وی فیهانندی زی ل گوری قی ریکی چویه و تهکستی خوه ب سی ریژکی ئافرانندی په، د هه مان دم زی کا چاوه هندهک قهولین ئیزدیان ژ سی ریژکان زی دهر باز کرنه، نه هف زی یی وسایه و سه بهقا ئیکئی ژ سی ریژکان دهر باز کری په، ئی نه هف چه نده زی ب دورستی ئەم نزاننه ئایا یی نه هف بهیته چیکری سه بهقا ئیکئی کریبه (۵) ریژک؟، یان زی دوو سه بهقه تیکهل بوونه.

نه هف تهکستی ل بهر دهستی مه، (۷) پارچه نه، و بهیتفانی هه ولدایه بهیته خوه ب سهروا قه هونت و قه هونایه زی، د هه ره سه بهقه کی دا سهروایه ک بکار ئانی په، ئانکو ژ هه ره سه بهقه کی؛ ریژکا ئیک و دوو و سی ئیک جوړه سهروا بوویه، هه تا کو پارچا ئیکئی زی کو پینج ریژکه، گشتان ئیک سهروایه، بو نمونه:

- A **بۆرئ مهمی ئانی**
- A **زین کر وډکه دزانی**
- A **مه م ل سهرئ مه یدانئ نوورانی**

وډکه دبینن کو په یقین: " ئانی، دزانی و نوورانی" ئیک سهروا هه بوویه. ئی دگهل قی چه ندئ زی د پارچه کی دا دبینن کو نه هف ریک پهیره و نه کریبه، نه هف زی ئەم نزانن نه بهیتفانی وسا چیکریه، یان چه نکو ل سهر زاری مایه و وسا ئی هاتیبه، ئی دیتنا ب هیژتره نهو ژ نه نجامئ سهرزازی یا وی وسا ئی هاتی؛

دووبارەكرن: نفييسەر دەنگەكى يان دوو دەنگان، پەيشەكى، دەستەواژەكى، يان رستەكى چەند جاران دووبارە دكت و بۇ چەند دەلالەتتەن تايبەت، ئانكو دەما نفييسەر پەنايى دبتە بەر دووبارەكرنى و ئەنجام ددت؛ هنگى مەبەست يا پى ھەيى، و دەما ب مەبەست پەنايى دبتە بەر دووبارەكرنى، هنگى تەكستى خوە ژ مانايان زەنگين دكت، ئەگەر نە و ب رەنگەكى نەھشيار و بى مەبەست ئەف دووبارەكرن ئەنجام دا؛ هنگى دبت ئەف دووبارەكرنە ب رەنگەكى نەگەتيف كارتىكرنى بكتە سەر دەقى.

دياردەيا دووبارەكرنى د سى ئاستان دا دەيتە ئەنجامدان ژ دەنگى دەست پى دكتە و پاشى پەيشى، پاشى رستى يان ھەفۆكى، ئەم ژى دى ئامازى ب دووبارەكرنا پەيشان و رستان كن، باش ديار دبت كو د تەكستى مەمى شقان دە ئەف ميكانيزما دووبارەكرنى بكار ھاتىيە، دەما دىبىژت:

دووبارەكرنا پەيشان: ئەف جۆرى دووبارەكرنى ژى ب دوو رەنگان دەيتە ئەنجامدان، ئەو ژى؛ دووبارەكرنا پەيشان ب رەنگەكى ئاسۆيى و ستونى:

- ئاسۆيى: ئەو جۆرەيە كو پەيف ب رەنگەكى ئاسۆيى دووبارەدين، ئەف جۆرە د تەكستى مەمى شقان دا ل چەند جەھەكان بەرجەستە دبت، بۇ نمونە:

ئەو ھوبا ل دوپانە
دوو شىر ل سەر راوستانە
پەك مەمە پەك عەبدولرەحمانە

پەيھا "پەك" د رىژكا سى دا دووبارەكرىيە، ئەف دووبارەكرنە ژى جونكى ژمارە بوويە ب مەرەما دەستنيشانكرنى ھاتىيە دا كو يەكى بۇ لايى مەم ببت، و يەكى بۇ لايى عەبدولرەحمان ببت. ھەمان جۆرى دووبارەكرنى ل جەھكى دن:

داسنى كولو جەمە
دووملى ب قەومى خوئە
ل پى پرا سەلاتى مەمە شاباش مەمە

پەيھا "مەمە" د يسان د رىژكا سى دا دووبارەكرى يە، ھەروسا دكارى ژى پەيھا "مەمە" يا ئىكى لا ژى بدت بى كو زەرەرى ل مانايا رىژكى بكت، ل ئەف دوو بارەكرنە ژى ژ بۇ دووپاتىي بوويە. ستونى: ئەو جۆرەيە دەما كو پەيف ب رەنگەكى ستونى دووبارەدين، ئەف جۆرە ژى د تەكستى مەمى شقان دا ھەيە:

بىنن بىنن
بۆرى مەمى بىنن

پەيھا "بىنن" ل رىژكا ئىكى دوو جاران، دگەل پەيھا "بىنن" رىژا دووى دووبارەكرنا ستونى ئەنجامدايە، د ھەمان دەم دا دووبارەكرنا ئاسۆيى يە ژى، ئەف جۆرە د گەلەك سترانين فولكلورى يىن كوردى دا دكەفتە بەر چاف، ئەف دووبارەكرنا پەيھا "بىنن" ب سى جاران، بى گومان ژ بلى ئەركى وى يى كىشى و ئاوازى، دووپاتكرن و فرمانە ژ بۇ يى بەرامبەر كو بۆرى بىنت.

دووبارەكرنا رستى: ئەف ئەو جۆرەيە كو رستە دنافا تەكستى دا دەيتە دووبارەكرن، فيجە ئەف دووبارەكرنە چ ب رەنگەكى تەكستا و تەكست بت، ئانكو بى گھورين، يان ژى نە تەكستا و تەكست بت، ئانكو ھندەك گھورينين بچووك ب سەر دا دەين، د نافا تەكستى مەمى شقان دا ئەم دووبارەكرنا ژ جۆرى دووى دىبنن، ئانكو چ رستە تەكستا و تەكست و بى گھورين دووبارەنەكرينە، بەلكو ھندەك گھورينين بچووك دەسەردە ئانينە، بۇ نمونە:

- بۆرى مەمى بىنن
 - بۆرى مەمى ئانى
 - بۆرى مەمى شى يە
 - شىر بۆرى مەمى يە

- زىنى ل سەر داىبنن
 - زىن گر وەكە دزانى

- مەم ژ نوو را بخوينن
 - مەم ل سەرى مەيدانى نوورانى

- رەش كرىوون دەست و پى يە
 - رەش كرىوون دەست و ئەنى يە

وەكە دىبنن ئەف رىژكىن ل سەرى د نىزىكى ھەفن و ھەر يەكى ژى تىشتەكى بچووك يى جودايە و يا دن يە وەكە ھەفە.

دپالۆگ: ئەو دەما كو د تەكستى دا دان و ستاندىن دناقبەرا كەسايەتتەن تەكستى دا دورست دبت سەبارت بابەتتەن جۇرا و جۆر و ل گۆر بابەتتە بەرھەمى، گەلەك جاران ژى كەسايەتتە سەرەكى يا تەكستى ھەر خوئەيى تەكستى ب خوئەيە و لايەننى بەرامبەر ژى جار ھەيە كەسەك بت، جار

دهرويش و مير براهيم نادم

دەرگه:

دناف هر ملله ته كيدا هندك كهس هه نه ناف و دهنگي وان
دبهر به لافن و دنافدارن د بياقن جورا و جورا و نافين وان
وهكه ستيرين گهش ل نهمانا د تهيسن نافين وان د
ديروكي دا ب بيتين زيرن ل قهلهمدانه دناف ديانه تا
نيزدياتيذا زي گهلهك كهس هه بويينه كو ميتولوژيا نيزديان
سهرهاتي و سهر بور بهيت و قهول دقه سيدين وان هه ميبز
كرينه وهكو سمبول دهينه ديتن و بونه نمونين پايه بهرز
دريكا دين و ديانتيدا دا وريكا خودي ناسي و دهروشي
وخوه دورئخستن ز خوشي و شاديا دنياي و ناخهرهت ز
خورا كرينه نارمانج نيك زفان كهسان شاكردئ ريبا
دهرويشي و دهروش و قهلهندهر و خودي ناس و خهرقه
پوش و خلمه تكاري مالا شيوخادي و لالشا نوراني ريناسي
ريبيا خودي و شيوخادي تيني و برسيي نول و نيمانا
نيزدياتي ذهرويشي نافدار مير ب رومهت و مالدار (مير
براهيم نادم) يان (مير براهيم نادم) كو هه تانها لگهري
تاوسي و ل روزين جهزن و عيدا و ل تازيا ل دهمي قهول و
بهيت و دوعا و دروزه دهينه گوتن بهحسي دهروشيا وي
خودي ناسيا وي دهينه كرن و قهول و قه سيدين وي دهينه
گوتن. پتر ز جارهي ل سهر في مير و دهروشي هاتيه



مروان شيخ حسن
رهشكاني/زهينيات

زي ههيه جفاك ب گشتي، يان ته خهكا جفاكي بت. هندك جارن نهف كه سايه تيبه د راستگونه و
هندك جارن د چيكرينه، هندك جارن زي خوهدي تهكستي دخوازت هندك تشتان ل سهر
زارى هندك كين دن بدته گوتن و جارن زي خوهدي بهرهمي ل سهر زاري كاسايه تيبه كا نه
مرؤف ديار دكت و... هتد، ز نهجامي نهف ديالوگي زي چهندين تشتين نوو پهيدا دبن، چونكي
هنهك جارن وهكه پرسيار و پرسفان زي ل دهيت، د تهكستي مهمي سفان زي ده هم ههست ب
ديالوگي دكن كو ديالوگ دورست بوويه بي كو هم ههست ب كه سايه تيبان بكن، نانو كه سايه تي
نه د ديارن، يا ز من فه نهفه زي تهكنيكهكا خوهدي تهكستي يه، دهما ديپزت:

بين بين

بورئ مهمي بين

زيني ل سهر دا بين

هنگي بي فه رمانئ (نهمري) ل هندك دكت كو بورئ مهمي بين و زين بكن و زيره كار بكن، ل
بهرامبهرى في يهكي زي د سهبهقا پيرا بهرسف دهينه دان بي كو هم ههست ب كه سايه تيبان
بكن، دهما ديار دبت:

بورئ مهمي ناني

زين كر وهكه دزاني

ديار بوو كو بورئ مهمي بي نانين و بي زين زي كرن، نهف چهنه ب باشي ديالوگي دهف تهكستي
دا ديار دكت.

نقیسین و سهرهاتیا وی و بابی وی وهکو تیکست هاتیه ل قهلهمدان . ل ههتا نها نهو سترانا ل سهر هاتی گوتن نههاتیه نقیسین ههلبهت ستران ژی دهیکا وی خهجیجا ل سهر گوتیه و ههتا نها نهه ستران ل دهقهرا جیایی شنکال ل کوچ و دیوانا و ل تازین مریان ستران بیژ دسترین ب ناوزهکی غهمنگین و دل شهوات و پهقیقین دل زیز . مهبهستا من ژ فی نقیسینی نهوه دا کو نهه ستران ژی جهی خوه بگریب دناف روپهلاندا و قورتال ببیت ژ وندابون و نهمانی و خزمهت و زهنگین گرنا کهلتوری کوردی بی رهسهنه .

پیشگوتن/

میر براهیم کی په؟ دمیتولوژیا دیانهتا مهدا (نیژدیاتی دا) دهپته زانین کو بنهمالا میر براهیم سهر جهفت بابا کارئ دهرویشی کرینه و شکهستی و خلمهتکارئ لالشا نوراتی و مالا شیخادی بوینه مال و میراتی و فریژا دنئ هیلانه و ریکا ناخرهتی گرتینه و ب شهف و روژا کارئ وان عبادت بو ژبو خودئ و ریبا شیخادی . ژدایک بوون و کراس گهورینا میر براهیم نههاتیه زانین ل ههف دم و ههف چهرخ شیخادی (سلاق ل بن) بو میر براهیم کورئ دهرویش ئادم کورئ دهرویش قاتان کورئ دهرویش مسکین کورئ دهرویش گورگین کورئ دهرویش وهحید ژ بنهمالا قاتانیی په^(۱) سهردارئ سی سهد و شیست و شمش سوارئ مالا ئادیان بو ههر وهکو د میتولوژیا نیژدیان دا دهپته گوتن دیسان ژ فی بنهمالا دهرویش و خلمهتکارئ لالشا نورانی دانهرئ قهولا نه ژی وهکو دهریش قاتان کو (قهولی بهحرا) دانهپنه ژ سهبهقا داویئ ژ قهولی دیاره و دبیزیت.

ژ قهولی دهرویش قاتانی

علمی خودئ بهحره ژئ دجن جوی و کانی

خاس خاسن چونه بهر نورا رحمانی

تهمامهتیا فی قهولی ل خودانی^(۲)

دیسان قهکولهر د.خلیل جندی د بیژت ب رونی دیاره دانهرئ فی تیکستی دهرویش قاتانی په لئ سهبهقا داوی ژ قهولی بهحرا

بفی رهنگی لخواړئ هاتیه گوتن

ژ قهولی دهرویش قاتانی

شیخادی بهحره ژئ دجن بهحر و کانی

چونه بهر نورا رحمانی^(۲)

نهفی میرئ گران تهف مال و ملک و میراتیا خورستانی ل پاش خوه هیلا و قهستا لالشا نورانی کر لسهر خاترا ئیمانی و ناخرهتی و خللمهتا مالا شیخادی ههر وهکو هاتیه گوتن :

جهفت ئاشی زهعهفرانی

جهفت لاندکی مان دانی

جهفت دستئ شیلانی

ژ بلی مال و ملک و میراتیا خورستانی

ههمی تهرک کر و ههست کره لالشا نورانی سهر خاترا ئیمانی^(۳).

دیسان دفی بهندا سترانی دا ژ سترانا (غهریبو) دا هاتیه دهمی دبیزت:

غهریبو بلا حالی من ب حالی دهرویشی باژارئ شامی بی.

ل حالی دهنون المصری و حسن البصری ئیکی وهکه میر براهیم ئادهما

تهرکا پا و تهختی خورستانی دان و بهرئ خوه ژ مال و میراتی خوه گیران

بهرئ خوه دانه ناخرهتی غهریبو , غهریبو^(۴)

خوندهفانی هیژا: نها ژی سهرهاتی و سهربور دهرویش ئادم و میر براهیم ئادم نهمی راخن بهر جاقین وه بهلکو نهوهکو تیکست لئ وهکو پهیف و گوتنن دیوانکی دههمان دهمدان هندهک سهبهقین قهولی ژی دگهلدا هاتینه کا جاوا ئهم نیژدی دبیزن مه ئیماننه ژ قهولا ئیماننا مه میرئ نیژدی ژ علمی خودئ و شیخادی و گالگالا مهلك فهخرهدين یا تهمامه دیسان د دهرهقی فی سهرهاتی نقیسههرا خدرئ سلیمان و خلیلی جندی دبیزن (سهرهاتیهکا نهفسانه خوه تیدا خویا دکهت نهف چهندهژی تشتهکی نهیی دوره ناف ملهتهکی دیندار دا باوهری مترالیی ههبت^(۱) دیسان دبیزم مهبهستا من نه فهکولینهکا دور و دریژه سهر فی بنهمالئ تهنئ سهرهاتی وهکو گالگالی و دوو دهقی سترانی نه من بتر روناھی دایه سهر وان و سهرهاتی جاوا هاتیه گوتن من وهسا ل قهلهمدایه، سهبهقهکه ژ بهرتوکا نیژدیاتی (خدرئ سلیمان و خلیلی جندی) هاتیه وهرگرتن خودئ و شیخادی هاریکاری دئی راست بت. سهرهاتی:

(چی سهبهکه نهدهره

ناف خاسید شیخادی بوویه خهبهره

دهرویش ئادم دچپته سهقهره

چی سهبهکهک ب نیشانه

ناف خاسید شیخادی بوویه خهبهره دانه

دهرویش ئادم دچپته خورستانه^(۲)

درویش ئادهم^(۸) كاری خوه كر ژ لالشی دهرکهفت و ژ خوهرا دگوت یا دهستورا خودی و شیخادی نهزی رابم تهرکه سهری دنیا بیبم و نهفه پینج بابنه هم درویشی دکهین تو ملوک و میر ژ بنه مالا مه نه رابونه خودی ئی که رومه بهلکو خودی رزقه کی بدته من ههلبهت تشتی خودی بقیت دی بت و دی چیت . دبیزن درویش ئادهم ژ لالشی دهرکهفت و بهری خوه دا روژه لات ب جل و بهرگی درویشی کا ب دریژیا چهنه قوناغا ههتا گهها بازاری خورستانی، ل وی دهمی شیخ محمدهی خورستانی میر بو ل وی دهری و جهی وی که لا خورستانی بو ل قهسرا رحیحیی و دهست هالاتا خوه ل ویدهری گهراند و ل وی دهمی دقهه ههمی روژ پهریز بون. شیخ محمدهی خورستانی کههک ههبو نافی وی خه جیجا بوو گهلهک یاب ئیمان بو و هیژا و بهرکه تی بوو و ههر کهسه کی ژ خودان ئو جاخ و مالبات و کهد خودا و مروقی خویابین وی دقهه ری ل وی سهر دهمی چوپا خواستنا خه جیجایی دقیا بو لسهر بهری خوازگینیا رونشتبا و زنجیرهک ب بهری خوازگینیا فیه یا گریدا بیوو لگه ل تهختی میری ئانکو شیخ محمدهی خورستانی و ل دهمی لسهر بهر رونشتبا ئیکسهر زهنگلی لیدا و میر زانی کهسهک وی هاتی خه جیجا بخوازت یان ژی داخوژهکا وی ههیه . و خواستنا خه جیجا نه ب زیر و قهلهن و دراف بو تهنی ب شهرتا بو . ههلبهت تشتی خودی نفیسی بو ههر کهسه کی دی بت . درویش ئادهم چو قهسرا رحیحیی و لسهر بهری خوازگینیا رونشت و دهنگ ژ زهنگلی هات میر گوته بهنیا کا بنیرن نهفه کییه هاتی لسهر بهری خوازگینیا، بهنی چوئن دیتن مروقهک درویش و جل و بهرگی وی یی که دایایه، زفرین ل جهم میر گوتنی میرم درویش کهه، میر گوت ج درویش، د گوتنی درویش کهه دایایه . میر نهمر دا درویش بینن چفاتا وی و ئیکسهر درویش ئانین چفاتا و بشتی سلاقی، میر گوت درویش تو هاتی خواستنا کجا من درویش گوت بهلی میر گوته کجا من ب شهرتایه و شهرتی کجا من ژ ته نای و گهلهک وهک ته هاتنه و شهرت ب جه نه ئانینه و من سهری وان ژیفه کریه و دانایه سهر سهری که لا خورستانی درویش گوته شهرتی کجا ته چ یه که رومه بیژه :

نهگهر مال نهزی ژ تهرا بینم ژ دنی یه.
نهگهر دورن نهزی بینم ژ بهحری یه.

و نهگهر من ب جه نانی تی کجا خوه بدی من و نهگهر من ب جه نه نانی سهری من بیره و دانه سهر سهری که لا خورستانی، میر گوته باشه شهرتی کجا من سی دورن ژ بهحری درویش ب فی شهرتی قایل بو و ژ با میر دهرکهت دبیزن روژا دن سهه وی زوو دوعا ژ خودی خوهکر تشتی د ئنیهتا ویدا ب جه بهیت و گهها سهر بهحری ب قوهتا خودی خدر لیاس لبر حازریو سلاقی ل

کر و گوته ته خیره درویش، درویش سلاقی ل فهدا و گوته شیخ محمدهی خورستانی سی دورن ژ من خواستینه شهرتی کجا وی نهگهر ببم وی کجا خوه بده من و نهگهر نهبم وی سهری من بپرته و دانیه سهر سهری که لا خورستانی ههلبهت تشتی خودی بقیت دی چیت . ب قوهتا خودی خدر لیاس دهنگ ل بهحری کر و ههر موخلقه کی بهحری دورهک ژ وانرا ئینان درویش سی دورن ژوان بژارتن و ب قوهتا خودی و خدر لیاس ل گه ل موخلقی بهحری وندابوو درویش ههرسی دورن ل گه ل خوه برن و چو چفاتا میر . سلاقی ل میر کر و گوته که رومه نهفه شهرتی کجا ته. میر گوته نهفه نه دورن و نه دقیا کجا خوه بدهته درویش ئاقل مهندی چفاتا وی گوتنی میر بهلی نهفه دورن بین ته دخواست ئیدی میر قایل بو ب وان دوران. میر کجا خوه کره د ئودهکا قهسریدا و دهرکهه و پهنجهره ههمی گرتن و داخستن و گوته درویش ههره من کجا خوه داته . ب قوهتا خودی دبیزن :

درویش بو مهعرمکی تهپاره
دپهنجهری قهسریدا هاته خواره
نژییا نیفا گهزیان و گوهاره
پچک خهرقی خوه ب کهچکی سپاره
گوته ههگه پسهکی تهبو
بلا نهسهکنه بیته ههکاره

ل روژا دن لگه ل دهرکهتتا روژی میر چو با کجا خوه و گوته کا ئهوی من ل با تهدا هناره، کجا وی گوته بابو ئهوی ته

ل با من دا هناره ببو مهعرمکی تهپاره
دپهنجهری قهسریدا هاته خواره
نژییا نیفا گهزیان و گوهاره
پچک خهرقی خوه ب من سپاره
گوته ههگه پسهکی تهبو بهلا
بلا نهسهکنه بیته ههکاره

نهه مههی خه جیجا تهمام بون خودی کورهک دای نافی وی کر براهیم (میر براهیم) . خودی سحود و ئیخیال دا میر براهیم و ناف ل کهت و بو میری خورستانی و کاری وی بو راف و نیچیر و خودی دانهکا مهزن دای و خودی لگه ل کر د بیژن روزهکی ژ راف و نیچیری زفری هاته مال گوته شیخ محمده بابو شیخ محمد گوته نهز نه بابی تهمه و گوته مالیا شیخ محمد دای گوته نهز نه

دیا ته مه هره پرسیارا خوه ژ دایکا خوه خه جیجا بکه ئه و دئ بیژته ته کا دایکا ته کی یه
هاته جهم دایکا خوه و گوتی :

دای تو ب وی که ی ئیلاهیة
دئی راستی بو من بیژیه
کا بابی من کییه

دایکا وی خه جیجا گوتی :

والله هی کورئ من دئی جهوابی ب ته دمه .
زانینا من زئی زانی بابی ته دهویش ئادمه .

وه دیسان میر براهیم گوتی :

دایی تو ب وی که ی ئیلاهیة
دئی راستی بو من بیژیه
مهسکهئی بابی من ل کییه .

دهیکا وی خه جیجا گوتی .:

کورئ من زانینا من زئی زانی .
مهسکهئی بابی ته مهرج و ههرشی دمرئ کانیا سپی یه
خلمه تکارئ لالشا نورانیه .

پشتی ئهف ژ زاردهفی دهیکا خو زانین لدور بابی خوه بو ماوهکی خوه ژ بیر کر و بی دنگ بو
لسهر بی زانینا لدور بابی خوه . دبیژن روژهکی ل لالشی بو بهس و خه بهرئ میر براهیم و
شیخادی گوته میرا ئیکی وهکی میر براهیم ژ مالا قاتانیی سهر شش بابا مالا وان دهرویشی کریه
و نها ل قهسرا رجیجی ل باژارئ خورستانی و چی نابیت و دقت ناگهه بکنه دا بهیته لالشی ژ
به لالشا نورانی جهی و ییه دبیژن دووخاس ژ خاسین شیخادی و ب قهوهتا خودئ ب رنگی
کهفوکا خوه بهره فکرن و قهسد کرنه کهلا خورستانی ب شهف گههان و دانینه سهر سهرئ
قهسرا رجیجی میر براهیم زانی هندهک وئ لسهر بانئ قهسری وه گوت:

ئهف کینه لسهر قهسرا من .
ئهوان گوت :
ئهمن ئهم ژور هاتن قره
مه وندا کرنه حیشره

میر براهیم دگوته وان:

قهسرا من رجیجی یه
مهسکهئی تهیرا ئی نی یه

مهسکهئی حیشره وئ لبئی بهر ییه

دیسان خودئ قومت دا کهفوکا و گوتی :

کو پاکی دبتیه پسئ دهرویشا ل قهسرا ره جیجی
بنفت ل نافه لیفا و دوشهکان و بهعلکیا

دقت تو وهری لالشا نوری خلمهتا مالا شیخادی بکه ی .

ههر دوو کهفوکا فری و گههان لالشی و دیسان میر براهیم ئهف زی نهکر تشتهک خوه ژ بیر کر
مال لسهر میراتیا خوه و لسهر راف و نیچیرا خوه. روژهکی ژ روزان جو نیچیری و غهزالهک دیت و
لبهر غهزالیدا هات و تیرا خوه کر. دکهفانده دا بکوژیت. دبیژن خودئ وهسا هسکر زار و زمان
کره ددهفی غهزالی دا و غهزال ب زمانی مروغان ل گهل میر براهیم ناخفت و گوتی :من نها
نهگوزه من دوو گار ههانه نها دبرچی نه ئادا خودئ بیت ئهز ههرم گاری خوه شیر بدم و بزفرم
و ئهز نیچیرا ته میر گوته غهزالی باشه دئ چهندی چی و بزفری گوتی سی سعهتا یان زی نیف
دانئ روژی سعهتهک چون و ئیک هاتن ئیک دئ کارین خوه شیردم میر براهیم گوتی ته کار
ههانه. غهزالی گوت .

بهئی من دوو کار ههانه دمیزینم
لبهیرا ژیری دگهرینم .

ئی ژ بهر سهیادین میر براهیم نکارم ب خومرا بگهرینم .

میر قایل بو و غهزالی ب غار و بهز بهرئ خوه دا بهری ل دهمی نیزیک کارین خوه بوو چافی
کارا ژ دورفه لئ کهت و دیتن ماکا وان ب غار و بهز نهوهکی ههر جار دهیت وانزی ب لهز و بهز
لسهر ژیر کرنه غار و غهزالی گازی کارین خوه کر گوتی وهرن نهرفن کار راوهستان و گوته ماکا
خوه ته خیره تو ب فی لهز و بهزی هاتی غهزالی گوته وان ئهز نیچیرا میر براهیمم و من ئاد
داییه کا وهرن شیرئ خوه بخون دا بلهز بزفرم ژ بهر ئیکی وکه میر براهیمی ئادم لبهر گهرما
روژی ل هیفیا منه کارا گوتی ماکئ وهختی ئیکی وهکی میر براهیم ئادما لبهر تیکا روژی ل
هیفیا ته بیت کو تو نیچیرا وی ههما ههری خودئ ب تهر و ئهم وی شیری زی ناخون هیفیا مه
خودئ غهزالی دچی و بازدا وب غار و بهز گهها میر براهیم. میر براهیم گوتی غهزالا خودئ ته
گوت ئهزی سی سعهتا کیر و بجم و ئهف ژ نو سعهت و نیف تهمام بو تو هاتی غهزالی گوت
کارین من گوته مادهم میر براهیم ئادما ل بهر تیکا روژی ل هیفیا تهیه و تو نیچیرا وی یی
ههما ئهم شیر ناخون ههره خودئ ب تهره میر براهیم ژ نو هزرکر و گوت یا رهبی دهیک و بابی
من گوت ئهم نه یین تهنه و من پرسیار ژ دهیکا خودکر و گوته من بابی ته دهرویش ئادمه

وجهی وی لالشا نورانی یه و من ژ یا وی نهکر و دوو قاسد هاتن سهر بانئ قهسرا من و گوتنه من جهی ته لالشا نورانییه و تو پسی دهر ویشایی و تو دناف لحیفا و دوشهکان و بهعلگیندا دنقی و من ژ وان ژ ی باوهر نه دکر و ئەف حه یوانئ خودئ و ادبژت لهو دقیت ئەز قهستا لالشا بکه.

میر براهیم تیرا خوه بهردایه
وکهفانی خوه شکینایه.
بهر خوه گرتن بهرئ و چپایه

ول دونیایی کهت و گه هشته شفانه کی سلاف ل شفانی کر و گوتنه شفانی ئەف په زئ کی یه ؟
شفانی گوتئ ئەف په زئ میر براهیمه .

میر براهیم گوتئ :
ئەز میر براهیم ب خومه .
ئەزئ چوخئ خوه پته دمه .
من ل کهپهنئ ته هه یه تهمه .

شفانی گوتئ :

چوخئ ته یئ هشکه .
تژی ماره تژی دوپشکه .
شفانی تی نه بت بار و پشکه .

میر براهیم گوتئ :

چوخئ من تومانه .
خهرج و خهراجئ مسرئ ههفت سالانه .
یئ ته لقایه که ژ لقایئ بهرخانه .

شفانی گوتئ :

کهپهنئ من مانی حه لاله و زحه متا منه .
ئەز ههفت سالا ل بهر فی بهزی مامه .
من شیری وی نه کریه تامه .
چنکو ئەز زانم ل روژا ئاخهرتئ ل من یئ حرامه .

شفان گوتنه میر براهیم وهره دا ئەم ناگره کی بکهن چوخئ ته و کهپهنئ من بکه دنافدا .
میر براهیم گوت باشه :

میر براهیم ناگره هندوته .
چوخئ خو لئاف دانی و سوته .
مار و دوپشک ژ ناف دهرکهتن چوت ب چوته .

میر براهیم ناگره گی ژهنیه

و جوخئ خوه لئاف دانیه .
مار و دوپشکا ل بهر خوه گرتن بهری و چپیا .
شفانی گوت میر براهیم مانه دورا منه میر براهیم گوت بهلئ دورا ته یه .

شفانی ناگره کره
و کهپهنئ خوه لئاف وهرکره .
بو نور علی نور چو عهرشئ فاخره

شفان ناگره کی دی ژهنیه
و کهپهنئ خوه لئاف دانیه .
بو نور علی نور چو عهرشئ عیلى یه .

ل دنیایی کهت و بهرئ خوه دا روژنافا وگهها بازاری موسل یئ پهریشان و وهستیایی و تینی و برچی و ئەف ماقوله یئ پیلاف قهتایی و ئەو ملوکه هوسا یئ رهزیل چو با ئیکی پیلاف چیکه گوتئ پیلافا من چیکه من پاره نینه یا من کهشکوله چ کهته کهشکولا من ئەز بدهمه ته یئ پیلاف چیکه گوت ئەز جئ ناکه م ئیک ب رهخفه بو گوتئ وهره وهره ئەزئ پیلافا ته چیکم لئ تو قرار دکی چ تشتئ کهته کهشکولا ته دا تو بدهیه من ئەرئ قرارا خودئ ئەز بدهمه ته و پیلافا وی چیکر . لدهمی میر براهیم ل مانی نه زفری دهیکا وی زانی وی بهر ب لالشی چویی رابو هندهک خولام و بهنی لگه ل خوه کارکن و گهلهک مانی دنئ ژ زیر و دراف بارکر ل حیشت و دهوارا و ل په ی میر براهیم کهت ژ قودرته خودئ دهیکا وی گه هشتئ و گوتئ دئ هه رچی لالشی میر براهیم لئ زفراند گوتئ بهلئ دایی ئەفجا دهیکا وی ئەو بارخانا گران ژ مال و زیر و دراف هه می دایی گوتئ کورئ من ئەفی مالی لگه ل خوه ببه میر براهیم رابو ئەو بارخانه هه می دا یئ پیلاف چیکه ر و گوتئ رزقئ ته یه ئەف کهته کهشکولا مندا و دهیکا وی خاتر ژئ خوهستن و دوعا ژئ رهکن و بهرئ خوه دا خورستانئ و ئەوی بهرئ خوه دا لالشا نورانی و گهها باژیرئ شیخ مشلج باژیرکی مهزنه ژ ئیزدیا و بوسلمانا و جهوا و فلا پیک هاتیه سی روژ و شه فال باژاری شیخ مشلج^(۹) گه ریا ئیکی پاریهک نان ب عه شقی خودئ نه دایی . داوه تک ل رهخه کا باژیری دگه ریا قهستا داوه تئ کر هاته با کابانیئ وا گوشت د کهلینت ل بهر بروشکا گوشت راوه ستیا گوتئ بچهک گوشت نادهیه من که بانئی دهست هافیته هه سکوا خوه ل بهروشی هلانی هه ستیئ شیخ مه ند و شیخ فخر دهرکهت زفراند و چاره کا دی دهرانی دیسان ئەو هه ستی دهرکهت و جارا سیئ هه ر دیسان ئەو هه ستی دهرکهت ئەوی خوه ل هه ستیئ گوشت دا کابانیئ هه سکو ل ئەنیا وی دا

و شکاند و خون ژئ هرکی نهوی ب وی خویئ فہ نهو گوشت دا بهر گهزا هنگی یئ برچی بو و هنگی دئی وی ل وی شهوتی نفرهک ل خه لکی وی بازاری کر ئیدی گونه هی خودئ تهعلا لئ هات خودئ مارهک ل وی بازاری سه لتاند یئ مرفبت ساخ نه هیلا و ههمی داعوراندن و ب نه مر و فهروار خودئ نه بی موسا هاته نه ردئ و ل بازاری شیخ مشلح راوه ستا دا حوکمی خودئ تهعلا ببینت بهرئ خوه دا باژیری و گوت :

یا ره بی من بهلده و شارستانه

تو بگه ری دوو روژا و سیانه .

تو نابینی دهوسا دوو پیانه .

رهب العالمین گوتہ موسا : دهر وی شه کی من ی دهر وی شانہ .

گه ری ل وی باژیری دوو روژان و سیانه .

ئیکی نه شقی من نه دایی پاریه ک نانه .

موسا گوت . یا ره بی من گوشتی ل ده ستانه .

ئاش ئاری ده افیت ب مستانه .

یئ بی خوهی و بی خودانه .

یاره بی من ته نوره گوره پیته .

ئاش ئاری ب مستا ده افیتہ .

ئی وهیبه وهکی خوهی نو ژ بهر هلیته .

یاره بی من نیك مروفی ل دهر وی شی ته دا خودئ تهعلا مورستانه ک لبن لنگئ موسا دا دهر کر و مورنگا گرتہ له شی وی و له قه ک لیذا و نه بی و نه بی موسا^(۱) لنگئ خوه بلند کر و دانی سهر مورستانی و گه له ک مورنگ گوشتن خودئ گوتئ نه بی موسا نیکی له قه ک لته دا و ته چه ند گوشتن و یاله ق لنگئ ته دایی هیژ یاساخه گوت یاره بی من ههر تو و وشولاته و کس ب شولا ته نزانن و ههر توی نه بی موسا داخواز ژ خودئ کر گوت یا ره بی من دقیت نه ز وی ماری ببینم کا یئ چه نده و خودئ فهروار دا کو موسا مهعر ببینت و موسا گوت :

نه بی موسا گوت سا محیر .

که رمکه و مره هیر .

ده ستور دایه من جییر .

مهعر هات لغان و لفا گوتئ خوه بده ئالی نه کو له فکا من لته بکه فه پاشئ نه زئ نه زئ گونه هکار بم ژ ره بی خوه مهعر گه ل^(۲) تزی کر و موسا وهکاز دانا نانا خوه و مهعر و گوت :

اقف یا محیر .

ده ستور دایه من جه بییر .

موسا گوتہ مهعر نه زئ پسیاره کی ژ ته که مه مهعر گوتئ که رمکه موسا گوتئ ب خودئ که ی مهعرئ وهکی ته ل دوژه هئ هه نه مهعر گوتئ :

مهعرئ دوژه هئ د حهفت سهرن .

دوپشک وهکی که رن .

خاله کی من هه یه یئ بهر زهره .

لنفا پرو و بژوانکا نه ز چه دهر .

مه زلی پینج سهد سالی ب ده فتره .

خاله کی من هه یه یئ مهعینه .

روژئ خوهرئ وی حهفت گری ئاخینه .

میر براهیم ژ باژیری ویرانگری دهر که ت بهر وه لالشی چو و گه ها چیا جزره تی و ل جوتئ قوبا نیری و ژورده خوه بهر دا لالشا نورانی و گه ها مرازا خوه کارئ دهر وی شی کر و نهو نیشانگه ها وی وا ل لالشا نورانی یه .

خوه ندقانی هیژا :- دبت کی ماسی د سهرهاتی و سه به قین قه ولی دا هه بت ژ بهر نه ف سهرهاتی و قه وله بهری سه دههان ساله هاتی یه گوتن بی گومان قه ول بیژ بو قه ول بیژه کی دن کیم و کاسی د که فنی لئ وهکی بهری نه ا من دای خویا کرن چاوا هاتیه گوتن هوسا هاتی یه ل قه له م دان .

نه فه زئ دوو دهقی سترانینه په یقین وان گه له ک د نیژیکی نیکن ده می دهیکا وی خه جیجا ل په ی که تی و مائی دنی ژ زیر و دراف و بارخانا گران ژیرا ئانی میر براهیم گوتئ نه ز نا زفرم دهیکا وی په یقین فی سترانی ب فی ئاوی ژیرا گوتن .

دهقی نیکی :

خه جیجا دبیزه باغچه کی بابئ من هه یه سورا فی باخجی زیفه .

بلبلئ مالک شهوتی ل سهر داره کا سور گولا دانیه حه مایلوکه کا زیری ب ستوکورا و یقه یه .

خه جیجا دبیزه پشتی میر براهیم ئادهما پا و ته ختی زیرین ملکئ خورستانی نه زئ ب بم ب کویفه .

خه دیجا دبیزه باغچه کی بابئ من هه یه سورا فی باخجی زیره

بلبلئ مالک شهوتی سهر داره کا سور گولا دانیبو حمایلوکه کا زیری من چیکری ژیره .

خهجيڄا دبیژہ پشتی میر براهیمی ئادہما پا و تہختی خورستانئ فی ملکی زپړین
ئہزئ نزانم فی بارخانا گران ب ہیلیم ژ کپړہ .

من تلپا خوہ ل سینگی بلبلی خوہدا من گو رابہ چما دہنگی تہ نینہ
بلبل دگوت ہرہ جافی من یی ب ئاف وھیسترا دلی من یی بگول وبرین وکہسہرہ ئہز نکارم
بخوہندم خوہندن و زمانئ

من نینہ

ئہزئ حزینمہ ہہگہ یی وکہ میر براهیمی ئادہما بہرئ خوہدانہ مالیت مرنئ
دنیا ملکی خودئ پہ دنیا ژکہسیرہ نامینئ

خهجيڄا گوتئ :- باخچہکی بابی من ہہبہ ل دہشتئ

سہعتا میر براهیم کتہ بہر روژا فہرواری

سہرئ من ب دورا سہرئ جبرائیل بگرہ یی بچہنک وبازبوو ہات وبہری من گہہشتئ

خهجيڄا دبیژہ ہہچیئ مزگینہکی ژمنرا بینئ میراتپا خورستانئ

وہ ئہف بار خانا گران بلا تہمام ئاوببہ وہ زپړہ^(۱۷) .

خهجيڄا دبیژہ باخچہکی بابی من ہہبہ تہمام خوځ و زمرہبینہ

من ل بلبلی مالک شہوتی نپری لسہر دارہکا سورگولا دانیبو حہمایلوکہکا نا زپری نا زیفی ب
ستوکورا بلبلی من فہ نینہ

ئہز ل باغچئ خوہ فہ تیلیم باغچئ من مہللول بو پهلین خوہ ودراندینہ من گو باغچئ من چما
خہملا تہ نینہ

ئہز فہتلیم من ل بلبلی خوہ نپری من تلا خوہ ل سینگی بلبلی خوہ دان من گو رابہ مالک
شہوتیو چما دہنگی تہ نینہ

دگو ہہرہ خهجيڄا ہہرہ دل ب کوئ ہہرہ ژيامکہ مرن لسہر میر براهیمی ئادہما نینہ

ئہز زانم پشتی میر براهیمی ئادہما دنیا ملکی خودئ و رہب العالمینہ .

خهجيڄا دبیژہ باخچہکی بابی من ہہبہ خوہیا دکہ لبہرئ چہمہ

من ل بلبلی خوہ نپری لسہر دارہکا سورگولا دانیبو چ بلبہکی دل ب غہمہ

خهجيڄا دبیژہ پشتی میر براهیمی ئادہمہ

پا و تہختی زپړین ملکی خورستانئ نزانم فی بارخانا گران ژ کپړہ بہمہ^(۱۸) .

دہقئ دووئ:

خهجيڄا گوتئ: میر براهیمو باخچہکی بابی من ہہبہ ل بہرئ فی چپایی

ئہز دہرکات مہ فی دنیا یی ہہگہ من ل بلبلی خوہ نپری حہمایلوکہکا زپری ستوہی بلبلی من
دا نا بادایی

ہہگہ ئیت وکہ میر براهیم ئادہما بہرئ خوہ دانہ مالیت مرنئ وگو مہ ئیک و دوو نهدیتی و
نہ بیئایی

بانگینا من خودئ پہ بکہ ب جافی سہرئ خوہ ببینہ و بکہفہ گوہیت وی چرفینا دہرگہئ
بوہشتئ .

خهجيڄا گوتئ :- میربراهیمو باخچہکی بابی من ہہبہ سورا وی زپړہ

بلبلی مسکینہ ہہگہمن ل ستوہی بلبلی خو نپری حہمایلوکہکا زپری وا پیٹہ

ہہگہ ئیت وکہ میر براهیم ئادہما بہرئ خوہ دانہ مائی مرنئ ئہز نزانم فی بار خانا گران ببم ژ
کپړہ

خهجيڄا گوتئ :- میر براهیمی ئادہما باخچہکی بابی من ہہبہ تہمام جاو وچیمہندن میئر
وکانینہ

ئہز دہرکتمہ فی دنیا یی ئہف ئہر وئہزمانئ خودئ من نا حہملینہ

ئہز ل بلبلی گہریام من دیت لسہر دارہکا سور گولا نکلی خوہ ل ئاف بہرئ خوہدا دانپہ

ژپډہر و پہراوډز

۱. ژ زار دہقئ بابی من (شیخ حہسہنئ رہشکی ژ دایک بوویئ ۱۹۱۷). ئاکنجیئ گوندئ زہینیاہ،
کؤمہلگہہا خانکی/ دہوک.

۲. کؤفان خانکی: کاغہزین رخنہیی، خواندنن پیکہاتی - سیمانتیکینہ بو چہند تہکستین
ئہدہبی، دہوک ۲۰۱۰، ل ۷.

۳. د. خلیل جندی: پہرن ژ ئہدہبی دینئ ئیزدیان، بہرگی ۱، دہوک ۲۰۰۴، ل ۲۲۷.

۴. ژ زار دہقئ شیخ حہسہنئ رہشکی.

۵. ژ زار دہقئ حکمہت عملی ہہویری (ژ دایک بوویئ ۱۹۶۲) ئاکنجیئ خانکی یہ/ دہوک.

۶. خدر سلیمان و خہلیل جندی: ئیزدیاتی ل بہر روئناہیا ہندہک تیکستین ئؤلا ئیزدیان، ۱۹۷۹
بہغد، ل ۱۴۷.

۷. ژپډہرئ بہرئ، ل ۱۴۸.

۸. ئہف سہرہاتیہہ ژ زار دہقئ شیخ حہسہنئ رہشکی ہاتیہہ ودرگرتن و چاوہ گوئیہہ من وسا ل
قہلہم دایہ.

۹. دکہفتہ پشتا باعدری و چپایی پشتا لالش و ہہتا نہہا قوبا شیخ مشہلہح ل یہ خوہیاہ.

۱۰. د باوہریا ئیزدیان دا نہبی موسا کہلیمچیئ خوہدئ یہ.

۱۱. گہلیہکی کورہ دکہفہ نیژیکی دارا سنگا ل دہوروبہرئ لالشا نورانی و ہہتا نہا ژئ دبیژئ
گہلیئ مار.

۱۲. ژ زار دہقئ فہقیر میرزا فہقیر دہرویش سنگالی، سترانبیژہکی ژیہاتی یہ دسترانا

فلکؤلوری یا کوردی دا ژ دایک بوویئ ۱۹۶۶ ل چہمئ جہفرا.

۱۳. ژ زار دہقئ سترانبیژ خہلو قاسم خدر، ژ دایک بوویئ ۱۹۲۳ گوندئ سمئ ہیستہر و نہہا
ئاکنجی یہ ل کؤمہلگہہا بؤرگ ل سنگالی.

تپیلینی: ہندہک پیزانین ل دؤر فی بابہتی ب ریبا بہریزان مجبور پیر حسین و مجبور خواجہ
کو ہہردوو ئاکنجیئ خہتاری نہ و ب سوپاسیفہ گہہشتہ من.

سەرھاتىيا

ھەسۆ و كەلەشى^(۱)



مستۆ ئەلياس دنايى

وھك دەھتە زانين كو دىرۆكا ئىزدىان يە زەنگىنە ب چىرۆك و سەرھاتى يىن خوە، فى جارى ئەم دى بەھسا سەرھاتىيەكى كن كو مېرخاسى و ئەقىنى و چەند بابەتتېن دن تىدە ديار دكن. بويهريىن وى ژى دكەفنارن و فەدگەرن سەردەمى كو دەفەرېن ئىزدىان دگەھشت ھەتا دەفەرا كەلەكا ياسين ئاغا(۲) دەما كو بەرى فەرمان ب سەرى وان دا بەيىن ژ ئەگەرى ئايىنى. ل وى سەردەمى ئىزدى ل كەلەكا ياسين ئاغا دژيان؛ مەزەنەكى موسانا(۳) ھەبوو ب نافی ئومكى موسانى، قىزەكا وى ھەبوو ب نافی (كەلەشى) ب ناف و دەنگ بوو ژ بەر كو ئا سپەھى و بەركەتى بوو ژ ئالىيەكى فە، و ژ ئالىيى دن فە قىزا ئاغاى ئىلى بوو. بابى كەلەشى سۆز دابوو برازيى خوە كو قىزا وى ژ وىرا يە.

ل وى دەمى ھەسۆ ەگىدەكى فەنج بوو و مېرخاسى ئىلا موسانا بوو، و كەلەشى ژى يا دل ب كۆفان بوو، ژ بەر كو نہ ب دى بوو مېر ب پسمامى خوە بکە و يا قەول كرى بوو ژ وىرە. ل وى دەمى قىز و ژنېن وى دەفەرې دچوونە سەر دەلاھىن ئافی دا خوە بشۆن و جلگىن خوە و يىن مالى بشۆن ژ سبى ھەتەنەكى ئىفارى ل وىرى د مان. ھەسۆ د چوو نىچىرفانىي و پشكدارى د غەزى و تالانكرنا ئىلېن خەلكى دا دكر، جارەكى و ل دەمى فەگەريانا وى ژ نىچىرى، ھاتە سەر وى دەلاھى ئافی يى ژن و قىز ل سەر. كەلەشى خوە ژ ھەفالىن خوە فەكشىا و ھات بەر ب ھەسۆ دا زىچىرى و رەنگى وى نەيى باش بوو وھك مرۆفەكا تىشەكى خوە وندا كرى و دل مايى.

ھەسۆ گوتى : كەلەشى .. تە خىرە؟، چما تو وھايى و كى دى تە ھىلايە؟ كەلەشى بەرسقا وى دا و گۆت: ئەز يا دل مايى مە .. راستە وھكە تى دىژى، مى (من) كورمامى خوە نافی و مى نافی بىم ھەف ژىنا وى. بەلى بابى مى سۆز و قەول ب وى دایا. لى ھەسو خوزى ژ خىرا خودى را ئەف سۆز نەبە دا تە زانېيا چ ل دى مدا ھەيە. ھەسۆ لى فەگەريا و گۆت : كا بىژە، ئەو چى يە ل دى تە دا؟ كەلەشى نەخەرەگ ھالاند و گۆت: ھەسۆ .. تى (تو) مېرخاس و ەگىدى ئىلا موسانايى و نىف مالىي بابى منى، و ھەر و ھەر ھش و ئافلى مى ب سەر تەدا بوون و خوەسكا خوە مى ب تە خوەستيا، و ئا نھا كاری خوە بکە و م ب رەفەينە ژ خوە را .. ھەسۆ گۆت: جاوا ئەز و تى قى ب بابى تە بكن و سەرى ئىلا خوە ل نىف ئىلا دابىن، و ئەمى ب كودا ھەرن؟

كەلەشى گۆت: دى كا تى مى ل پشت خوە سواركە ل سەر ھەسپى، و چ دى بلا بىي. جارەگە دى ھەسۆ لى فەكەراند و گۆت: ئەفە تى دىژى چىنابى كەلەشى، و ئەم ب كودا ھەرن بابى تە وى بگەھە مە. جارا سسىي كەلەشى لى فەگەراند و گۆت: ھەسۆ .. كا مى ب رقىنە ژ خوەرا و بەرى خوە بدە چىايى شنگالى (كەلەھا خويىنپايە و ت جارا دەخىلى خوە نەدایە كەسى).. چىايى شنگالى پۆزى وى يى بلندە و چەند فەرمان ب سەرى دا ھاتىنە و خوە نہ چماندىە .. دى كا مى ل پشت خوە سواركە و بەرى خوە بدە شنگالى. ھەسۆ ب دەستى كەلەشى گرت و بلند كره سەر پىشتا ھەسپى و ژ ئاھا كەلەكا ياسين ئاغا دەرکەت و دانە رى ل موسل را بەرى خوە دانە چىايى شنگالى ھەتا گەھىشتنە ئاھا وى.

ب رېځه .. حهسو ګوته کله شې: ئېلهک ل چپايې شنگالې هه بوو، خودانين ناريشان دحهواندن و ناريشين خه لکي چاره سهر دکر، نافي وي ئيلا سموقيان (۴) بوو و هه تا نها نه ف ئيله هه يه، و مهزني وان دبيژني مه حمودي که مبهل.

شهف و روژ قه داندن هه تا گه هيشتنه جهي يي خوه لي گرتين. ب شهفي را گه هيشتنه گوندي باري (۵)، که لهک د وهستيایي بوون و د برجي بوون و غه ريب و ري نه ناس بوون، ل دهرئ که ليي باري دا سه کنين ژ ناليي ژوري فه ل ويړئ شکهفتهک هه بوو و نهو شکهفت کر نه قوناغا خوه، نانکو بيهنا خوه لي قه کرن.

خه وي کله ش دزي و نفست. حهسو زي هه سپا خوه شداند و ژ خوه را گوټ: کا نه ز دلهيله کی بيبينم دا خوه بگه هينمه مهزني سموقيا و هه رسا دا نه ز خوارنه کي ژ خوه و که له شې را بيبينم.

بهري خوه دا گوند، و ل پيشيا گوند ناشه کی نافي هه بوو نار و داني گوند پي دهيران. حهسو خوه گه هانده ناشقان (قه راشي ناش)، و هه رشان زي بهري هات ژ بهر وي ديت نه فقه مروقه کی غه ريب وي دهپته گوند. ل دمه کی گه هيشتنه هه ف و سلاف ل هه ف کرن، حهسو گوټي: نه ز مروقه کی غه ريبم، ب عشقا نافي خودي هه که زادهک ل با ته هه يه بده مي .. نه ز ژ خو و هه قالا خوه را بيم؟ نانکه و گه لوازه کی هيژيرا ل با ناشقان هه بوو دا حهسو و گوټي: که رهمکه.

حهسو فه گه ريا شکهفتي، ديت که له شې هيژ يه رازايي يه. دهنک ليکر .. زادي خوه خوارن. فه جرا سه هې ليډا .. و ب روژ دهرکه تن را، په ز و ته رشې سموقيان دهرکه ته چيري، بده کا غه ربا هات ل تالانې واندا و ته رشې وان ژ بني برن.. هاوارا سموقيان ل پي تالان که ت، لي نهو غه ريبين هاتين کومه کا گران بوون و ب سهر قه وه تا سموقيان دکه تن .. نه ما کارين تالانې خوه فه گه رين و يو حزرهک د نيڤ واندا .. چاوا خه لک تالانې مه بيه و تشتهک ژ مه نه يي!

لي في دهمي دا حهسو يي گوهداره چاوا نهو بدا غه ربا هات و ل تالانې سموقيان دا .. و حهسو نهو حهسو يه يي ب ناف و دهنگي وي ل دهفه ر و ئيلا موسانا دا دهرکه تي ب ميړ خاسي و عه گيدي! هه ما حهسو ل هه سپا خوه سوار بوو و ب دو تالان که ت و گوټ: ل حردا ؟ وان غه ربا گوتنه يه ک و دو .. بدني هه دايه کي ژ في حلالي. حهسو ل وان فه گيړا و گوټ: نه ز نه ل هه دايا دگه رم، وي تالانې بهيلن و هه رن؟ وان زي خوه دانا بهر شه ر .. و نهو و حهسو ل نيڤا هه قرا چوون و هاتن ب دوژمناتي، هه تا خودي ناموس و نسره ت ب دهستي حهسو فه ناني و

غه ربا نه رکا تالان دان و رهفيان. حهسو تالان دا بهر خوه و ثانيه دهرئ گيلي دا و بهر دا سهر دهلافې کانيا نافي، و دهنک ب سهر گوند که ت وا تالان هات.

مه حمودي که مبهل (مهزني ئيلي) پرس کر و گوټ: زوو جه وايي ژ منرا بينن، کا کي تالان فه گه رانديه، ژ بهر کو نه ز زانم نه که سه کی سموقي نه ف تالان ناني؟ ناشقان چو با مهزني ئيلي و گوټي: دوه ئيفاري، مروقه کی ميڤهان هات با مي و زادهک ژ مي خوه ست و گوټ: نه ز مروقه کی ميڤهان و غه ريبم. نه ز دبيژم وي ميڤهاني تالان فه گه رانديه.

مه حمودي که مبهل دوو زلام شانده جهي وي ميڤهاني و زي پرسکرن کا يي چ که سي يه و ژ کي ئيلي يه و چاوا گه هيشتيه نافي سموقيان؟

حهسو گوټه وان: سلافا ل مه حمودي که مبهل بکن و بيژني .. مي تالانې سموقيان فه گه راندي، نه ز حهسو مه و ميړخاسي موسانان مه. مي قيزا مهزني موسانان رهفانديه و خوه ل مه حمودي که مبهل گرتيه، نهو زي مهزني سموقيا نه. نهو په يڤ گه هيشته مه حمودي که مبهل، و هه ر وي زي دهنک ل سموقيان کر و گوټه وان: قيز و بووکين خوه ب رهه ل بکن و هه رن که له شې ب خيل و خوشي بينن.

په يفا وي ب جه ناني، و چوون که له شې ل سهر هه سپي کرن و ثانيه نيڤ گوند ل بن کونه کی فه گرتي دا، داوه تا وي کرن .. دمه کا دريژ .. که له ش و حهسو ل گوندي باري مان و هه ر ب قه در و قيمه ت ل با مه حمودي که مبهل و سموقيان بوون.

ل روژده گي .. مه حمودي که مبهل، برهگ سوارين سموقيان ب خوه را کارکرن و بهري خوه دا که له کا ياسين ناغا، و قه ستا مالا ئومکي موساني کرن و بوونا ميڤهاني وي. پشتي هه ف و دوو ناسکرين .. مه حمودي که مبهل گوټه ئومکي: مه دفي قه دري مه ل با ته هه يي، وا نه م هاتينه ل سهر دوژا که له شې و حهسو دايبين و ستاندي بکن، و هه ردوو زي ل با منن.

ئومکي لي فه گه راندي: نيڤه مالا خودي نافي، هه ردوو نه چوينه دهرکه غه ريب يان با غه ربا هاتينه با وا. هه ر هوون مروقي وانين و نهو زي ل با مروقي خوه بوون. ئومکي ديسان گوټ: وه يي هوون ب خير هاتن، مه حهسو و که له شې عه فو کرن ل سهر خاترا هاتنا وه. هه که بقين ل با وا بن .. سه د جاري لسهر خير يي و بلا دي خوه بن. و هه که بقين بينه نيڤ ئيل و خه لکي خوه .. بلا ب خير و سلامه ت بين .. ديسا نه م دي داوه تا وان چي بکه ن و وان ل هه ف پيروژ کن.

پشتی میفغانیا وی ل با ئومکى موسانى .. مهحمودى كه مبهل فهگه پيا گوندى خوه يى بارى ل شنگالى و گوته حسو: مى عهفوا ته ژ با ئومکى ئانى، و وی تی و كه له شى ل ههف پيرۆز کرن و ئەمانهت ب منرا يه ئەز بيژمه وا .. ههكه هوون بمين، ل سهر جهعفا (چافا) بمين و بقهدر و رومهت. و ههكه هوون بخوازن ههرنه نيّف ئيل و خوهيپن (مروفيين) خوه .. ئومكى گوت: بلا بخير بين. منيكا حسو و كه له شى بوو جارەكى ل وار و ئيل و خوهيپن خوه فهگه پرين، ل په يفا مهحمودى كه مبهل دا، حسو گوت: وهى مزگينيا ته ب خير بى، ئەف زى خهونا مه بوو، و ههر ل حزرا مه دا بوو ئەم فهگرنه وهلاتى خوه، ژ بهر ههكه چه ندى مروّف ب قهدر و رومهت بى ههر رومهتا گرانت ل وهلاتى وى يه. و ههر حسو گوت: هيژايى ئيلا سموقيان، ئەز و كه له شى د خوازن ئەم فهگه پرنه كه له كى ل نيّف كەس و خوهيپن خوه. مهحمودى كه مبهل دهه سوار ب كه له ش و حسو را كاركرن و ههر دوو جها خاتر ژ ههف و دوو خوهستن. كه له ش و حسو و ههر دهه سوار ب وانرا بهرى خوه دانه كه له كا ياسين ئاغا ههتا گه هشتنى. و ديسا داوهت و خوشى هاته گه راندن ل نيّف ئيلا ئومكى موسانى دا ل دهمى ههفت روژان دا و دۆهل و زرنه ليدان. و وهكى بهرى حسو فهگه پريا و بوو ئەو ميخراسى بهرى ل ئيلا خوه.

پهراویز:

- (1) ئەف سه رهاتى ژ زار دهفئى مام (عابد حەسن فەندى) هاتىيه وەرگرتن ل كو ژ بنه مالا حەسن فەندى يه ل ناحيا سنونى.
- (2) ل سالا ۱۷۴۳ زايينى، نادر شاه بو سهر كيشى فهرمانه كه له شگه رى يا مهزن و بهرى خوه دا مووسل. دهمى گه هيشته بازارى (ئه لتون كوبرى)، خه لكى ده فه رى خوه گه هاندى و گوتى هندهك ئيلين ئيزديان هه نه ل قيده رى و ئەو دى بنه ئاسته نگ ل پيشيا ته و له شگه رى ته ل رى مه شينا ته بهر ب موسل دا (ئەف يەگ ژ وان خالين بين گرنگه كو ئيزدى ل رهخين كه ركوكى هه بوون). ئەف فهرمان تيت يەگ ژ وان فهرمانين مهزن و دژوار ب دهست و سه ركيشيا نادر شاه ب سهر ئيزديان ئانى. نادر شاه بريارا خوه دا (عهلى قولى خان) كو ئيريش بده سهر ئيزديان و گونديين وان تالان بكه و بى رحم ب سهر وان دا ههرى، و وان بكوژى ههتا يەك ژ وان نه مينى. دهمى دنگ و باسى فهرمانا نادر شاه گه هيشته كه يشتا ئيزديان، ل بهر خوه سه كنين و ژ زيڊا بارى دهه ههزار كەس وهكو له شكه ر كو مكرن. له شگه رى (فه زلباش) هاتبوو ژ دوانده ههزار بكوژى و ئيريش ژ خا فلدا دانه سهر ده فه رى ئيزديان ژ رهخا (شبلان) فه و ژ گه له ك ئاليان فه. ئيزديان زى دريغى نه كر و ل بهر وان دانه شه رى ژ خاترا پاراستنا خوه، راسته ئيزدى ب سهر

كه تن ل پيشيا وى شه رى دا، لى پشتى هيژين يه دهك ب هاوارا هيژا شاه هاتى، بهرەكى شه رى ل كيم دا ژ ئاليى ئيزديان فه، ژ بهر كو هيژين مهزن نه بوون و چ كنارى چهكى فه د ههزار بوون، ژ بهر فى چه ندى شاه ب سهر كهت، و ههزارهكا مهزن ژ ئيزديان هاته ئيخيركرن و هه موو هاته نه كوشتن. (مأساة الايزيديين – الفرمانات وحملات الإبادة ضد الكورد الايزيديين عبر التاريخ)). د. عدنان زيان و قادر سليم.

(۳) ئيلا موسانا: بابه كه ژ فه بيلا خالتا، و ئەو و قزلا برايه كن، موسانا ژ نافى موسى هاتيه .. وهك نمونه مالباتا (نايفى جردو) و مروفيين وى ل كومه لگه ها خانه سو رى يى ب موسانا تينه هلدان و ب سهر ئيلا حه ليقيا فه نه و تينه هه زمارتن بابه ك ژ بابين حه ليقيا. نها ل گوندى ره مبوسى ل فه زا شنگالى و هندهك ده فه رين دن زى ب كت كته دژين. (ئەف پيزانين ژ زار دهفئى ته مر سليمان ئەحمو هاتنه وەرگرتن كو يەك ژ ماقولين فه بيلا خالتا يه ل گوندى ره مبوسين))

(۴) ئيلا سموقيا: ئيله كا ب ناف و دهنه ل چيايى شنگالى و دوو گوند و كومه لگه هين وان هه نه (گوندى بارا ژورى، گوندى بارا ژيرى، كومه لگه ها دووگرئى)، ئەف گوند و كومه لگه ه د كه فنه ئاليى ژيرى ل چيايى شنگالى ب سهر ناحيا سنونى فه، نافى سموقيا ژ نافى سفوكى (سماق) خوارنه كا تام ترشه هاتيه، ل دهمه كى ل وى ده فه رى سفوك يا زهحف بوو. فيجا هاته ب نافكرن ب نافى سموقى. وهك تى زانين بارا ژورى؛ نيزيكى ۶۰ مالى لى هه نه و خه لكى وى هه موو ئيزدينه. بارا ژيرى؛ نيزيكى ۷۰ مالى لى هه نه و خه لكى وى هه موو ئيزدينه . كومه لگه ها دووكرئى = نيزيكى ۴۰۰۰ مال لى هه نه (كيم يان زيده تر) و خه لكى وى هه موو ئيزدينه . (من ئەف پيزانين ژ زار دهفئى سه عيدينى ملحم وەرگرتنه كو يەك ژ ماقولين ئيلا سموقيا يه ل كومه لگه ها دووكرئى) .

(5) گوندى بارى: ده فه ره كا د كه فيته قونتارا چيايى شنگالى ژ ئاليى ژيرى فه، ل روژنافايى ناحيا سنونى. ئەف ده فه ر ب ناف و دهنه ك ب دارين هيژيران و مشمش و خوچ و ئينجاسا و كه هريزين ئافى، لى مخابن ل فان دهمين سالا دا و ژ سالىن هه شتيان يى سه دى بيستى باران كيم بارى و وسا دار و به رين داران ل چيايى شنگالى عشك (هشك) و بين بارى زى دناف وان ده .

قهولک به دیلا سنهت کامل



به لافه کرن:
شیخ دهستی یی شهمسانی

خوندهفانین هیژا، ئەف قهول بو جارا ئیککی یه دهیته به لافه کرن و دئی جاری ژی دا تهنی شازده سه به قه ل بهر دهستین مه هه نه، لی دگهل هندی ژی ئەم دخوازن فان چه ند سه به فان ژی بدن وه شانندن دا کو خزمه تا ئەده بیاتا مه یا ئولی بکت و ئەگهر که سه کی دن، یان قهول بیژه کی مه هندهک زیده هی یان هندهک سه به قه بیین دن هه بن دکارن به لافه بکن دا کو ئەف قهوله ژی ب تمام بت و ب رهنگه کی باش مفا ژی بهیته گرتن.

خوندهفانین هیژا.. ئەف قهول سه ره رای کی مییا سه به قه یان، لی چه ندین بابه تین گرن گ باس کرنه و ژ وانا ژی گوئی یه روژه کی به دیلا خودان که ره ما دئی بته سنهت و روحی وان دئی چته عه سمانا و گوئی یه ل وی ده می که ره ما ل عه ردا نامینت و گه لهک سیردار دئی ب ریا نایین ملله تی خاپینن و ئەم هیقیدارن خه لک ل پی علمی مه یی ئولی هه رت، چونکو ژیده ری راستیا ئولا مه یه.

هاتیوو به دیلا سنهت کامل
قه شیرین ئم تیارین عادل

ئه قه بوو عیفا وی تماری
ژ وان باژیرین زوری خالی
عه ول دی چته باژیری معاوی

ئه قه بوو یا مه ژ علمی هلانی
ته رجالی ل شامی دانی
موگمی بی خوفا ب فوه ره هلانی

ئه ز فه بیر کره ب هه ر چار روکنا
دا بوو ژ بهر من مه موو رهنگا
من زانی مه مکه ما قیامه تی نابت هندا

رهنگه کی ژی سه رفا دینه
هه جی یی بیژت قیامهت نینه
شیخ فه مری نادیا ژی یی بگازینه

ته قدیر هاتی دی بته وه فایه
نه باژیر دمینت نه چام ئایه
نه دهشت دمینت نه چپایه

ئه و کی یه فه تا من نامونت
علمی من نا مه بینت
قورنی سیژدی به دیلا نه ه سه دی قوه دناسینت

که ره ما وان چن بوو
رو ئایا وان نه یا بلند بوو
ل قورنی سیژدی به دیلا نه ه سه دی ئه و هل بوون

ل قورنی سیژدی ل به دلا نه ه سه دی
رومی سیژدارا هاته عه ردی

که ره م و رو ئاهی یه ل ژور بوو

عقيدة التناسخ عند الايزيدية

ئەوان ژ تايي فەبەر دا
ئەوان نزانى علمي فوهدى مفعەتە سەر چقاس دەردا

ئەوان سېرکەرا نە مەيىن
مەندى دەين و فوہ دلەزىن
رؤژا بابەكى ژ تەلپى گران ئەو دشوونده دمىن

ئەوان سېرکەرا چ نيشانە
کەرەم و رۇناھى يە ل ژۆر بوو
ئەوان ژ تاريى فەبەر دانە
جواميىرى ل قورنى سيزدى بەدلا نەھ سەدى ب علمي فوهدى دانە سەر
ريانە

قورنى سيزدى بەدلا نەھ سەدى بوو
کەرەم و رۇناھى يە ل فزىنى بوو
بوختانى يە ل بەدىلى بوو
نفرىنا شەھسوارى دەشتا بيىانى و مير ئامادىنى شەمسە يە ل بەدىلى بوو

ل قورنى سيزدى ل بەدلا نەھ سەدى
گەلەکا ژ دەرەوى ئاساس چيگر
و ژ نەبووى و بوختانيى لى کر
شەھسوارى دەشتا بيىانى و مير ئامادىنى شەمسە و عەبدولعەزىزى مەربى
غەزوو لى کر

مەندى دەرەوين ل دنى نە
مەند ب زير و مالى فوہ ل پى نە
رؤژا بافەك گىرووى نەفسى نە

مەند د دەرەوين
و مەند دەين ژيزە د تەوين
رؤژا بافەك ئەو ژ تەلپىن گران شوونده دمىن

() () () ()

()

()

()

() () ()

()

()

()

()

() () ()

()

()

" :

()

()



()

(:)

(:)


()

()

(:)

()

(:)



**مسرح الطفل: أهمية، الدور
الوظيفي البنائي، آليات العمل و
الأهداف**



أ.د. تيسير عبدالجبار الألوسي
رئيس جامعة ابن رشد في هولندا
رئيس البرلمان الثقافي العراقي في المهجر

www.arsivakurdi.org

..... ()

*

()

()

www.arsivakurdi.org

()

()

[]

]]
[]

Projection

()

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

()[[...
...
] ...
()
:]
] ...
()[[...
[] []
] ...

(... \)

..()[[

...

...

...

:

:

:

..

...

..

...

(.)

•

•

•

•

•

•

•

•

•

•

•

•

...

] \

-

[]

[

]

[

||

...

()


...

(...)

[...]

...

...



www.arsivakurdi.org

•
•
•
•
•
•
•
•
•
•

[]

:

:

\ () \ \ :

_____ :

•
•
•
•
•
•
•
•
•
•

() ...

\ \ _____
•
•
•

الفلسفة البشرية من خلال آراء بعض الفلاسفة



/

www.arsivakurdi.org

()

(ھ -)

)

()
()

()

()

()

(- ")

)

()

(ھ -)

() (-)

بقايا الميثرائية (في الحضر و كردستان العراق) و
أثارها في اليزيدية



!!

" () ":(-) () -

!!!

" () () () ":() - ,

(()) - : ())

!!

(()) ()

()

() - : () ":() - : ())

" "

..()

() ":() ()

(گه لی زرد)

.() ":() ()

(/) ()

- : ":()

()

()

() - ()


".() ()

()

() ()

()

!!



www.arsivakurdi.org

()

()

) " ()

:" ()

() ":()

) ()

:"()

()

" □(-)

!!

(-)

()

() ":()

:" ()

()

:" ()

((- -

()

:" ()

www.arsivakurdî.org

hun taji /

(Taji/)

()
)

(hatin

": ()

()

": ()

()

()

()

()

()

()

()

(...)

()

": ()

()

()

()

": ()

!"

()

()

!

!

": ()

(

:"

(

)

()

)

:"

."

حوار الأديان و مستقبل العراق
رؤية أيزيدية



/

:

[]

()

":()

()

.(

()

":

.()

www.arsivakurdi.org

:

() - ()

[] ..

..

()

() () \ ()

...

...

...

...

:

..

..

..

[[:]]

()

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

« »



(/ /) () *

www.arsivakurdi.org

نو هيٺين وي ب چي رنگا بوو
كي پيشمام بوو كي هوستابوو

و قول (ناشتي مه حبه تي):
دهستا ژ تهريقه تي بهر نه دن
مه لهك شيخ سن پيشمامي خو بگه ن
كانييا سبي ژ خورا قبولهت كه ن

:(baba çawîş)

() (çaw /) ()

()

()

:(baba gavan)

()

()

()

()

(kalo کالو)

:(pêşîmam)

-:

-:

-:

-:

-:


:()

•
•
•
•

:()

نهو كي بوو بهري ئادهم ل عهردا بوو

() :
() :
() :
() :
() :
() :
() :
() :
() :
() :
() :



()

(pîr)

()

()

() :
() :
() :
() :
() :



()

() (+)

()

() () ()

اخ الآخره (براي اخرتي/birayê axretê)
()

-:

-
-
-
-
-
-

()

ئو شفاتە ب نیشانە

پرا سەراتی ئالییهک بەهشته

ئیک تاری یه

و ئیک دۆزهیه

هاوهکه یار و بریت ئاخرتی سەر گونههکارتیت برانه

()


()

()
()

()

()

() ()



الوقف و أمواله و أملاكه و القوانين في الأوقاف و الشؤون الدينية



()

()

()

()

()

()


()

()

www.arsivakurdi.org

www.arsivakurdi.org

شطحيات



نسرین الیوسفی

.(

() ()

()

()

(/ /)

.. ()

()

...

...

...

..

:

little



fat)

()

()

()

()

(boy)

() (man

: ()

()

()

)

..(

()

()

:

()

)

QEWLÊN ÊZDIYAN

1. Qewl û folklor (zargotina gelêrî)

Qewlên Êzdiyan kevnin. Ji kûraya dewrana tèn. Çiqas ji min va eyane, tu bingehê wan a nivîskî nehatîye, negihîştîye me. Ew bi zarkî ji nivşekê derbazî nivşên pey xwe bûne. Ji sedî nod bi zaravê kurmançî ne. Heta roja îroyîn jî gelek ji wan rind hatine parastin. Eger bi zarkî hatine xweyîkirin usan e wan jî curek ji nimûnê zargotina (folklor) kurdî karin navkin.

Çawa eyane nimûnên wejêya her gelekî cihanê usan jî ya kurdan bi du rîya hatine gihîştine rojên me:

-**Wejêya nivîskî**, bi nîşanên nivîsandina cûrbicûr li ser keviran, daran, ser çermên sewalan, ser mêtalan, kaxazan û tiştên din gihîştine me.

-**Wejêya devkî, yanê zargotin**.

Zargotina kurda, ya gelêrî pirr dewlemend, pircûre û pir sercem e: çirokin, destanin, beytin, bîranînin, kilamin, mesele, metelok, têderxistinok, laqirdî, pêkenok, nimûnên dînî ne, nifir, çêr û gelek-gelek tiştên dinin. Ev navên, ku me dan jî ji sirya xwe da beşên wan yên cuda hene. Mesele kilam (sitiran) li ser gelek beşan tèn

parevekirin: kilamên dîrokî, yên mêranîyê, şerra, yên dila, govendê, xerîbîyê, şinê, yên dema xebatê tèn gotin, yên dema bûkê siyar dikin, yên dayîk li ber lûrka zaroka xwe dibêjin û hîvd.

Beşek ji zargotina kurdî nimûnên (têkstên) dînî ne. Di nav wan da jî nimûnên dînê êzdiyan: qewl, beyt, due'a-dirozge, xizemok, lavêjok, fayzok, çivanok û tiştên din cîyê xwe yê layîq digrin. Dînê êzdiya bawarîke kurdewarî, ya kevnar e. u'lmê vî dînî, çawa me berê jî got, bi dewrana, bi zarkî (kurmançî) hatye xweyîkirin. Civaka êzdiyan jî bi wî u'lmî rêva çûye.

Eyane, ku êzdî rêke dîrokî, ya pirr dijwer ra derbaz bûne. Di halên tunekirin û zordariya dewrana da, dema gelek civak, netew, dewlet, bawariyên jî êzdiyan mezintir û bi bandortir li ber tofana bawariyên nû teyax nekirin, ser û binî hev bûn, helîyan, bûne bîranînin, di bin kelefê xwe da man, êzditî ma, unda nebû, nehelya. Di vî werî da rola u'lmê vî bawariyê pirr mezin e. Usan e wî u'lmî bersîva guhestinên dewranê, bersîva xwesteka bawarmendên xwe, di qewlên jîyana nû dida, bi felsefe û kûraya fikirî ji bawariyên nû danedixist... Çiqas jî zulm û zor, qirr û birr, neheqî, fermanên tunekirî yên xezeb anîne serê vî civakê, rêya rev û malwêranîyê dan ber wê, nikaribûn u'lmê bawariya êzdiyê ji serê êzdiyan derxin. Êzdiyan u'lmê dînê xwe xweyî kirin. U'lmê dîn jî ew xweyî kirin, ziman, xeyset, ruh û kurdeyatîya wan xweyî kir, anîn gîhandin roja îroyîn.

Di nav folklor kurdî gelêrî da, ulmê dînê êzdiyan ça cûrekî zargotinê, bi xisûsî û tebyetmendîyan e. Xasma di werê **Qewla** da... Dema lêkolînan, çend varîyantên nimûneke zargotinê, yên cuda-cuda, (ji heremên Kurdistanê ye başçe-başçe, ji zarên zarbêjên cuda hatine nivîsar) didine ber hev dibînin, ku di nav varîyanta da cudatîyê pirr mezin hene, him ware ziman, him naveokê, him kêşesazîyê. Carna tek naverok hatye xweyîkirin, heta gelek nav û bûyar, cûre û pîrgirêk jî hatine guhestin, hinek tişt hatine jibîrkirin, hinek zêde bûnê, tiştên ne cî hatine ketinê, bûyar û nimûnên cuda tevlihev bûne û hvd... Cîkî bi sitiran tèn gotin, cîyê din tèn şirokirin.

Zarbêj jî di warê zanîna ziman, şureta şirokirî, ji hev hildanê, ji hev fêrbûnê da weke hev nînin. Eger nimûna zargotinê ji zarê zarbêjekî zaneyî bi şuret tèn nivîsar, ewî jî ji zarbêjekî zane ew nimûne hildaye, qîmetê wê varîyantê jî mezime. Payê zarbêjayî pirrê gelekî bêxem nêzîkî nimûnan dibin. Çîrokbêjî- zarbêjî wek dengbêjîyê di nav gelda tucar nebûye pêşe, mijûlbûn, ji bo bingeha nimûnan ya nivîskî tune pirr cara bi gorî xwe, bi zaravê xwe zarbêj wan şiro dikin, çap, rîtm û mûzîka wan xweyî nakin, yekîyê



Dr. Eskerê BOYÎK
\\ Elmaniya

diteribînin, qewimandina li nav hev dixin, gorî xwe tişta zêde yan kêma dikin. Carna fikir û ramanê xwe jî dikine nav wan. Heta roja îroyîn jî hinek dengbêj miqamê kilamên kevn hildidin û li bejna kilamên xwe yên nû dikin û bêy fedîkirin dibêjin: „Peyv û mûzîk ya mine...“

Çi me derheqa zargotinê da tomerî got, di warê u'lmê ayîna dînê êzdiyan da, ilahî derheqa Qewla da mirov nikare usan bêje.

Di nav ulmê dînê Êzdiyan da, yên here pîroz Qewlin. Ezdî bi hurmeteke pîr mezin û fesal nêzikî qewlan dibin, guhdarya mezin dafînin li ser xweyîkirina wan, dibêjin: “ *Me îman ji Qewlê ye*”.

Dîndarên ku ulmê dîn rind zanin li nava civakê da pîr bi qedir û qîmetin. Zû têne naskirin, civak pey wan diçe, teva zefîr wan teqlîfî şîn û mesrefa dikin, fikira wan ra hesab rûdinên, para wan jî di xêra da mezin e. Ji bo wê jî, her dîndarek dîcedîne zanebûnê xwe yên oldarî û civakî dewlemend bke û ji dewsa xwe (şûna xwe) ewledên xwe hazirke, ku wê pêşikêşîyê û kanîya aboryê ji destê ocax û malbeta xwe bernede.

Civaka Êzdiyan di dîroka xwe ya dûr û dirêj da mîna adê ji hev qetyayî, li nav derya xezeb da jiyane (li Rûsîyayê, Kurdistanên Bakûr, Başûrê Rojava, Başûr û gelek heremên din). Der-dora tim bi çevê neyartyê, neqencyê û tunekirina dîn û bawarya wan nihêrîne. Di navbera wan heremên Êzdiyan da pêwendî, hatin-çûyîn pîr kêma bûne, lê dema sebeqên qewlên di nav wan parên êzdiyan da hatine parastin didine li rex hev dibînin ku qewl li her dera jî rind hatine xweyîkirin.

Em du sebeqa (malik), ji destpêka qewla ŞÊX Û AQÛB, ku ji du çevkanîyên ji hev dûr hatine hildan bînin û himberî hev bikin:

1. Şêx go: „Aqûbê mino, çendî roje, çendî şeve, Min e'cêvek dîtîye ewe, Mesîkî be'rêdaye durreke deve, Ewî me'sî, ew dur, ew be'r, dikşand xweve.	2. Çendî roje û çendî şeve Ez fikrîme ber xova Min masîyak li behrê dît dîrektli deve Ew behre ewî masî u ewê durê di kêste cem xove
Aqûb go: “ Seydayê mino, tu xudanê surre, Qe ne ji wî me'syê, ne ji wê berê, ne jî wê durrê, Kesî ne dîtîyê kişmîş ser berê.	Aqûb dibijît: Hey şêxê mino sîrrê Heke ji ber behrê nebe masî û ji ber durrê Dê çawa min û te mewîj dibane li ser wê berrê

Ev Qewla sala 1973 a li gundê Quruerz, nehya Hoktêmbêryanê, li Ermenistanê ji zarê Ahmedê Şêx Osê hatye nivîsar. (Ordîxan û Celîlê Celîl, Zargotina Kurda, Moskva 1978.)	(Xidir Pîr Silêman, EZIDYATÎ, Dihok 1996.)
--	--

Em nimûnekê ji du nivîsarên Qewla **SEREMERGÊ** bînin. Yek me hildaye ji Kovara LALIŞ hejmar 7 a (Dihok-adar-1997). Ew qewil ji alyê Bedel Feqîr Hacı da (4. 7. 1974). ji zarê bavê xwe, alimekî dînê êzdiyatî Feqîr Hecî kurê Feqîr Şemo hatîye nivîsar. Ya din ji pirtûka ÊZDANAME 1 (Weşanên Laliş, rû.119). Nehatye kifşê gelo kê ji zarê kê nivîsye. Lê bi texmîna me qewlbêj ji Kurdîstana bakûre.

<u>Ji ya Bedel F. Hecî</u>	<u>Ji Êzdanamê</u>
Rojekê ji rojane Xelkê; êrifî zana Hilûn ji mirinê bidin beyane.	Rojekê ji rojan e Werin xelkê êrifî zana Ji mirinê bidin beyan e
Xelkê; êrifî zane werin Li beyana bifikirin Sitreke ji mirinê bo xo hilgirin.	Xelkê erifî zane werin Li beyanê bi fikirin Sinetekê ji mirinê hilgirin
Ew sura min dikuji Dest û ser û pê û qalib nijî Miskîno bin ademo hilû bijî.	Rojekê ez nebûm Sirekê ji xewle bûm Li ber mithê xaliqê xwe bûm.
Ji bona nizil bû ew sure Nesîbek afirand bû ji minre Liraz(?) ne heke hindeke û heke pire.	Ew bû sirra min dikuji Dest û pê serî û qalib dinijî Benî ademo hil û bijî
	Bihara nizilî sîrr e Xwedayo te jîyan afirandiye ji min re Ez qayîlim heke hindik e heke

Ji himberîhevkinên herd mînanan jî rind tê texmîn kirin, ku di nav dewrana da êzdî berk qatî Qewlên xwe bû ne. Eger hinek guherînên peyvan, kêmbûn, zêdebûn pêk hatine, ew jî femdariye. Payê wan Qewlayî pirê bawarkî 800-900 sal berê hatine efrandin. Nivîsarên li ser kevira jî nava ewqas sal da nikarin bê zîyan, weke xwe bimînin. Ew jî di dirêjaya dîroka êzdiyaye bi xûn da, li nav tirsê, înkarkirî, veşartî, bi sirrî, ewqas jî mane, gerekê şikirbûnê ji Xwedê binin.

Li nava Êzdiya da her qewlbêj hostayê wî, mamostê wî hebûye. Mamosta qewl peyv bi peyv, sebeqe bi sebeqe mejûyê peyhatiyên xwe da cî kirine, nivîsîne. Êdî ez nabêjim, malbetên qewlbêjaye qedîmî ji dewrana girtî heta roja îro heyîtiya xwe xweyî kirine, kar û pêşê wanî hîmlî qewl gotin, qewl xweyîkirin, qewl şirokirin e. Wan ra Êzdî dibêjin **Qewal**.

Her qewlbêjek qewal nîne. Qewal mirîdin, ew jî wek çinek, ji xelegen civaka êzdiyan e, werê wan, li Başûrê Kurdistanê gundên Başik û Bazan in. Ezdî qedrekî mezin didine vê çînê. Li nav meclîsa êzdiya, ya rihanî da Meznê Qewalan: bavê Qewal heye. (Niha Meznê Qewala, oldarekî bi navî fikirzelal, zanekî ulmê bawarya êzdîtiyê, Qewal Silêman e). Heta niha jî, Merkeza Rihanî û Mîrê Şêxan, hersal ji Lalişa Nûranî, qewala rê dikin li nav êzdiyên heremên din. Ew jî li nav êzdiyên wan hereman da bi def-şîbab, bi Tawis digeryan, xêra Şîxadî top dikirin û ulmê bawarya êzdîtiyê li nav êzdyên wan herema da geş dikin.

Civak û êlên êzdiyan, yên dûrî merkezê, kîderê qewal nikarin tim bigihîjnê, şîn-şayî û mesrefên wan da beşdar bin, şêx , pîr û feqîrên wê heremê wê wezîfa pîroz pêk tînin. Parastin, gotina u'lm va ew mijûl dibin. Aboriya wan jî wê wezîfê va girêdaye.

Ji zargotina gelêrî xisusike qewlên êzdiyan jî ewe, ku helbestvanê her qewlekê û dema e'frandina qewlê e'yane. Wê yekê nikarin derheqa nimûnên zargotinê yê din, heta yên here mezin û bi nav û deng da jî bêjin. Kêne efrandarên ewlin yên destanên **Mem û Zîn, Ker û Kulikê Silêmanê Silivî, Xecê û Syabend, Kela Dimdim, Dewrêşê Evdî, Zembûlfiros** û gelek-gelek nimûnên zargotina mê, yên li nav gel da belabûyî û hizkirî? Kî demê ew xuliqîne? Kes nikare bêje.

Hinek helbestên helbestvanên kurd yên sedsalên navîn jî bi zar gihîştine me. Lê dema ji pey lêkolîna pêwîst ra dihar dibe ew helbest

yên kêne, ji zargotina gelêrî tîne veqetandin û cîyê xwe pirtûkên xweyê xwe da digrin.

Dema efrandina qewlan û navê qewlvana jî eyane. Wedeye ew helbestvanên mezin cîyê xwe di nav dîroka edebiyeta gelê xwe da bigrin.

Dema Şîxadî (sedsala 12 a) û wexteke kin jî pey ra tevrabûnek, agirek, hişyarbûneke bîr-bawariya fikirê, xwenaskirna xwedênasîyê li Kurdistanê, di nav civaka kurdên êzdî da geş bû. Gelyê Lalişa Nûranî bû cîyê kombûna oldar, dewrêş, filîsof, helbestvan û fikirdarên wê dewrêye gewre, cîyê gulvedana edebîyet û medenîyetê, felsefa Xwedênasîyê, zanîyarîyê. Ku bikaribin xwe ji lêya olên nû biparêzin tevî danîna hed û seda nû usa jî pêwîstiya nûkirina edeb, felsefe û ulmê bawariya êzdîtiyê hebû.

Dema desthiletariya lawê Şîxadîyê duyemîn Şêx Hesên (1194-1246)* (1) mîrtya êzdiyan pir bi hêz bû. Bingeha dewletê dihate danîn, kitêbên Êzdiyan yên pîroz MISHEFA REŞ û CEWLE usan jî 40 MIŞÛR ji bo 40 binemalê pîran hatin nivîsar. Ji bo gulvedana çandê, edebîyetê bingeha xurt çê bû, bingehê usan ku li ser wê bingehê helbestvanên wek Şêx Fexrê Adiyân, Pîr Reşê Heyran, Pisê Cemê û gelekên din pêşda hatin. Tu demê rêvabirîya Êzdiyan ewqas xurt, zane û bi hêz nebûye çiqas wê demê.

Wê demê gelo dibistan, xwendîgeh li Lalişê hebûne ? Nivîsar-xwendin bi çi zimanî bûye? Eger tune bûne yan bi zimanê erebî bûne lê ev edeba bi kurmançîya delal çawa li ser çi bingehê hatîye xuliqandin? Li ser hîmê zargotinê, bê zanebûna qewl û qanûnê zimanê kurmançî efrandina ewqas qewl, beyt û nimûnên edeba ola Êzdîtiyê ne nêzikî aqilane. Bi texmîna lêkolînvana ji sedî tek 1-2 nimûnen efrandinên wê demê hatine parastin û gihîştine me. Xêrî Bozanî gotara xwe ya bi navê "**Şêx Fexirê Adiya: Qewlan û Extyarê Mergêhê**" da wa dinivîse: „ Êzdiyan li ser demê Şêx Fexir (11 behir) anga 11hezar qewil, beyt û qasîde hebûne û piştî mirina wî (4 behir anga 4 hezar qewl, beyt û qasîde man, ji ber ku xelkê nikaribû hemyan jiber bike, nexasme bi şewê devkî bûn û nehatibûn nivîsîn, di destpêka sedsala 20 an de para pirtir ji van tîkstan wînda bûn....niho hemû tîkistên mayîn nagehin 200 an". (15) X.B.

Ne nêzikî aqila ne usan jî ew fikir ku evdek, yan çend evd ewqas berhemên edebî ezber zanibin. Qewlê **Şêx û Aqûb** da sebeqeke wa heye, ku pirsra me ra kare bive bersîv:

Aqûb dibêje: Şêxê mino,

Hey Şêxo ji mala Şêx Şeref e

Tu xudanê kitêban û mishef e (10)

* Dîroknaş û lêkolînanan pir derheqa Şêx Hesên û dema wî da dinivîsin. Xidir Pîr Silêman Pirtûka xwe ya ÊZIDYATÎ da wa dinivîse: Piştî babê xo şêxîni u mîryatîya miletî kirye, dîndarekî zana u mend u zor jîr bûye, şeş sala xewle maye heta kitêba CEWLE danaye. Gelek rê û rismê nû di nav me da danayne. Piranya mişûrê pîra bi handana wî hatîne nivîsîn. Şêsimîs wezîrê wî bû, Şêx Fexir extiyarê mergehê bû. (EZIDYATÎ; Dihok, 1996; pel 55.)

Wî şert û şûrtê bingeha dewletê datanî. Der û dorê Erebb ji hewildanên wî tirsyan. Wê demê paşayê Mûsilê bû Bedredîn Lolo. Qewlekê da wa tê gotin:

Hey Şêxsîno yî bin Adîyê

Te LALIŞEK ava kirye.

Rêya heca ji Mekehê birrye.

Şêx Hesên lê vedigerîne

Hey Bedredîno yî Mûsilîye

Bi wî kim êkî bêrfîye,

Heca me Zimzim û Mîxar û Kanya Sipîye

Padşa bi xwe Şîxadîye.

Bedredîn Lolo du êrîşên mezin bir ser mîrgeha Şêxan. Yek di sala 644 a (sedsala 12, zayîne). Di vî şerî da Şêx Hesên digrin û davêjne zindana bajarê Mûsilê, paşê dixeniqîn. Cara dudan, çawa Îbin Al-Fûtî di kitêba xwe: Al hewadîth al-camîca wêal-tecarîb al-nefiâe fî al-mîa al-sabîca dinivîse: “ Bedredîn Lolo sala 652 an (1254 ê zayî) êrîş bir ser Êzdiyan, gihîşte Lalişê, gora Şîxadî kola, hestiyê wî derxist, şewitand. i texmîna min, qewlê da zelal tê gotin ku Şêx Fexrê Adiyân xweyî **kitêb** bûye. Berhemên wî wê kitêbê da nivîsar bûne. Dibe qewl û beytên wê bawariyê, yê berî dema Şîxadî jî nav wan 11 hwzar têksta da hebûne? Berhem jî tev kurmancî ne, usane kitêb bi nivîsara kurmancî bûye. Gelek Qewl û beytên Êzdiyan, yên din da jî, besa **qelem**, **kitêb**, **defter**, **xwendinê** tê kirin. Usane wê demê xwendin nivîsar li nav wê civakê da guneh nî bûye. Hela bi şahnazî wê derheqê da tê gotin.

Peyra rojên ne xêr Êzdiyan ra hatin. Êrîşan û fermanan dan pey hev. Civak kete dorpêça dîn dijminatîyê, devê şûrê neheqîyê û li nav nezani-terya dewranên xezeb. Eger goristanên xasan dihatin şêlandin, hestiyên mirîya dihatin şewitandin, qira oldara tanîn êdî kitêb- nivîsar, peykel û sîmvolên berbiçev wê çawa bihatana

xweyîkirin? Êzdî ku xwe û dîne xwe ji nexwezên der û hundur biparêzin, mecbûr bûn her tiştên xwe veşartî, dizîva xweyîkin, sirra xwe ber tu kesê olên din dihêr nekin. Civaka êzdiyan di gelek tiştan da xwe ji civaka dor xwe îzole kir.

Qewlên Êzdiyan her cîya, ji alîyê her kesî û her dema nayêne gotin. Qewl hene, ku tenê ser mirya, dema definkirîne tîne gotin, hinek eydada, hinek li nav civakan da û hvd.

Çawa me berê jî got, bal êzdiyan Qewl pîrozînan û bi dewrana ji evdên olên din veşartî, bi sirrî hatine xweyîkirin, usa ku nivîsara wan jî çar tiştêkî gune hatye dîtin...Min ji devê gelek şêxên êzdiyan yê Ermenistanê bihîstye, ku ji bo gotina **Qewlê BOREBORÊ** gotî noginek bê serjêkirin. Heta niha jî hinek qewlbêj berk nahêlin qewla ji zarê wan binivîsin.

Eger em wa binirxînin, qewlên êzdiyan ji nimûnên zargotinê yê din cuda dibin û pirr nêzikî tîkstên nivîskî dibin. Raste ew li ser kevira, kaxêz, çerm yan tiştêkî din nehatine xweyîkirin, lê ew bi xemxurî li serê qewlbêja da hatine nivîsar û tu wedeyî navbirî neketîye navbera nivîskî qewlbêj ji nivîsê din.

Qewl tevî nimûnên bawariya êzdiyan yê din pareke edebîyeta gelê kurd ya kevnarin. Her nimûnek heykelekî dîrokî yî nemir e. Her yek ji wan kare sera edebîyeta her miletekî (çiqas jî ew xweyê edebîyeta pêşketî, zengîn û kevn be) bixemilîme. Payê wanî pirê 8-9 sedsal berê (hinek jî dibe ji wan zûtir) hatine efirandin. Meriv kare wê demê hesabke **êtapeke gulvedana edebîyeta kurdî**.

Çiqas jî dewran buhurîne dîsa wan berhemên edebî qîmetên xwe ji alîyê bedewnivîsarê, dayîna bersîva pîrsgirêkên demê, felsefê, dinêzanebûnê, xwedênasyê da unda nekirine, îro jî aktûalînan û cawa gelek pîrs-pîrsgirêk û guhertinên olî-civakî didin. Ew bi çap, rîtm, mîlodya û qanûnê helbestê hatine efirandin. Bi teqil û ewazên xweyê der û hundur va xwendevanan ecêvmayî dihêlin. Malikên qewla, kîjana ra **sebeqe** tîne gotin payê pirê bi sê xeta ne. Ji alîyê qewlbêja va hinek cî bi sitiran, hinek cî bi ezber, carna jî bi sirovekirin tîne gotin. Mîlodya gotina (sitirana) qewlan da xisûsîke nee`yan heye, ew ji sitiranên milî cuda dibin, bawarmendan dikin di nav hisa xiyalî, sirrî.

Gerekê bi heqî bê gotin bermayên vê xizna edebî, ku kare edebîyeta kurdî çend sedsala berbi kuraya dîrokê bive, aqara cihanî da jêra nav û rûmeta mezin bîne, ji guhdariyê der maye. Heta roja îroyîn jî ev wara ji pirtûk û xebatên edebîyetzanên kurd der dimîne. Helbet sebebê obyektîv jî hene: alîkî da

Êzdiyan ew bi sirrî xweyî kirine, ji der doran veşartine, nehîştine bèn nivîsar, ku nekevin dest xêrnexwezên wan, aliyê din da nivîskar û zaneyên kurden bawariyên din jî, ku payê pirê oldar bûne, bi sedemên dijîtiya olê guh nedane van berheman.

Qewlên êzdiyan û helbesta kurdîye sedsalên navîn jî pir ji hev cuda dibin. Qewl bi çap, naverok, teqil û kêşîya xwe kurdewarî ne, bi ruh û curê kurdî hatine efrandin, ziman, fikirandin nêzikî efrandinên gelêrî ne, zelalin lê ne pirîmîtîv-sadene. Ji helbestvaniya Erebi û Farzî yê dema xwe cuda dibin.

Ji helbestvanên Kurd yên sedsalên navîn ra cure, tiradîsiya û naveroka vê helbestvaniyê bi tomerî ne bûye hîm, bingeh. Ew yan haj vê xiznê nî bûne, yan ji wek bawarmendên bawariya nû xwe nêzikî vî ulmî nekirine. Tevî wê jî dema efrandinên hinek ji wan helbestvanan bi texmîn û çevê zanîyariyê tèn lêkolînkirin dîhar dibe ku wan jî nikaribûye xwe ji hinek bîr-bawarî, reng û ewaz heta teqil û rîtmî vê helbestvaniya kal-bavan xwe biparêzin...Ew yek gelekî ferih di helbestên Mele Batê û Feqîyê Teyran da tê xanê. Gelek sebeqe ji qewlên êzdiyan ketine di nav efrandinên wan.

Dem û nihêrîn hatine guhestin. Bawarkî payê wê edebîyetê yê pirrê hatîye berevkirin, nivîsar û weşandin. Ji bo bi fireyî lêkolîn û qîmetkirinê, xwendevanên kurd û yên cihanê bi wê xiznê hisandinê ra hemû mecal çê bûne.

Bi texmîna min babeta “**pêwendiyên e’deba bawariya Êzdiyan ya kevnar û helbestvaniya Kurda ya sedsalên navîn**” hewcê lêkolîna berfire û zanîstîye.

Lê gelo, **qewlnivîsariya dema Şîxadî** ra çî bû bingeh...Qewl û qanûnên zanariya dînê êzdiyatîyê, edeba wê berî êtapa Şîxadî çawa bûn? Di wî werî da nee’yanîke tarî heye...Eger perda nedîhar ji ber bûyarên dema berî Şîxadî bèn kişandin gelek pirsên dîroka gelê kurd wê ronîbin.

Qewlên Êzdiyan bi çap, teqil û curê xwe **gelekî nêzikî GATAYÊN Zerdeştîyê** ne. Qewl peyveke erebî ye lê Gata îranî ye, nêzikî kurdî: Gata yan gotin, gotar... Gelo pevgirêdanek navbera wan da heye...Êzdiyan ew curê ji zerdeştîya hildane yan zerdeştîya ew curê edeba ebûbeta kevnar ji Ezdayê hildane...Eva jî pirsê ku lêkolîna zanîyarî dixweze.

Di nav sebeqe û malikên nimûne (têkstên) dînê Êzdiyan da gelek sîrr xêşartî hene. Lêkolînkirina wan kare bersîva geiek pirsê bide, û gelek girêyên dewrana veke.

Mûzîk, Dans û Şarqîyên Kurdî



Dr. Nûra Cewarî/ Istiraliya

Sala 2002-a li Anqerê çapxana “Ozge” 3 pirtûkên giranbiha li ser mûzîka kurdî bi sernivîsa “Mûzîk, Dans û Sarqîyên Kurdî” ku Mehmet Bayrak hazirkiribû çap kir.

Pirtûka pêşin gotarên zanîyariyê û rojnemevaniyê li ser çande û bi teybetî li ser mûzîka kurdî bi serecemên başqe-başqeva, nivîsara Zozan Ozmanîane dîplomîye li ser Destanên kurdî tevî berevoka dengnivîsarên Destana û dawiyê Bibliografîa mûzîka û çanda kurdîye ku M. Bayrak hazir kirîye.

Pirtûkên dudu û sisya berevokên stran û awazên kurdîne bi têkst û notenivîsarên awaza ku bi hevkarîya N. Cewarî û Z. Ozmanîan hatine hazirkirinê. erî van hersê pirtûka li ser mûzîka kurdî gotar, tîzên doktoryê û masteryê, berevokên başqe yên mûzîka kurdî li Ewropayê, Ermenistanê, Kurdistanê çap bûne bi tevîbûna zmanê almanî, kurdî, ermenî, russî. Lê ji kêmbûna pirtûkxana, sêntrên çandeyî, dûrihevjiyana pêşekzanan gele cara roşinbîrên kurd ji van karên kirî bê agahdar û bepar diman. Bes hine agahdarî bi rya programmên konferansa, sêminara, ji hevpeyvîn û ji parên “Pirtûkên nû” yên malperên kurdî dighîştine û dighîjin xwendevanan. Ê cara yekemîn bi fikra nivîskar, lêkolînêr, rojnemevanê emekdar Mehmed Bayrakra derbaz bû hemû gotar û

têzên nivîsar komke, tercmeyî li ser zmanakî - tirkî bike usa jî Bîblîografîa û fotoalboma çanda kurdî hazirke û çapke. Evan hersê pirtûka emeka karên wîye salên dirêjin û di nava karên wîye kirîda, bi dîtina min, pir giranbihane, sertacin.

Hersê pirtûk bi tevayî melûmetyên xurt derheqa çanda kurdî yê gelerîda didin û her xwendevan dikare derheqa pir pirsên çanda kurdîda agahdarbe. Ew pirtûk usa jî nişadayîna dereca mûzîkzanya û bi temami çandezanya kurdîne di wextê meda ku îdi gaven xweye pêşine merdva dinêda tene naskirinê. Hersê pirtûk bi tevayî weke 1840 rûpêline.

Pirtûka pêşin weke herdê din mezine. Gotarên li wêda cîwarbûne pirs û problêmên mûzîka kurdî tînin ber çeva û pêra jî deba gelêye çandeyî, pirteherya çiqil û janrên mûzîkî, hacetên sazbandyê, edet, reqas, cilen geleryê bi zanîarî, bi îzbatî û bi wêne yên xweşik tene nişandainê. Pêşekzanên profesîonal û ne professional, rojnemevan û roşinbîrên kurd û bîanî bi şirovekirina, bi mesela, bi analîza, bi notenivîsarava û wêne, bi çevkanyên hewaskar bi zmanên Ewropî, kurdî, russî, ermenî, tirkî, farisî fikrê xwe anîne li ser kaxaz. Evan gotarana bi piranî yên zanîaryêne. Gele xudanên gotara û têza bi xwe qinyatên lêkolînên xwe bi rya êkspêdîsîa berevkirine û li ser wan têz û nêrînen xwe nivîsîne.

Di nava xudanên gotarada gele navên naskirî hene wek Tomas Boîs, Stêphan Blûm, Ditêr Krîstênsên, Mûhamêd Mokrî, Amîr Hasanpûr, Nûreddîn Al-Salihî, Kendal Nezan, Mehmed Bayrak, Nûra Cewarî û yêd mayîn. Yên ku zimanê tirkî nizanin dîsa ji bi meselên dengnivîsar/notenivîsarava, analîzên profesîonalva, wêne u çevkanyava dikarin di gele prisên mûzîkî û çandeyîda tê bighîjin û melûmetyên baş ji wan pitrûka ji xwera hildin. Ew gotar, dengnivîsar, çevkanî, wêne bi temami heja û kêrhatîne. Bes carna di dengnivîsarên pêşekzanên bîanîada gîana kurdeyatyê kem tê texmînkirinê çî ku tiştêkî normale. Her kes nikare mûzîka gelê kurd bi temami û bi kurdewarî femke û nexşê teta texmînke.

Nvîsara Zozan Ozmanîan têzên mastêrîne ku ewê wexta temamkirina xandina xwe li Konsêrvatorya Yêrêvanê nivîsiye. Zozan cêribandîye nimûnên baş ji stranên Destanên kurdî yên çapbûyî komke, dengnivîsarên xwe yên baş jî li serda zedeke û berevoka stranên Destanên kurdîye balkeş bi peşgotina zanîaryêva hazirke. Pêşgotinêda derheqa dîroka dengnivîsarên Destanada, usa ji berevokên folklorîda li kîjanada destan çap bûne tene gotine bi rexne û qîmetkirina wanava. Usa ji anegor dereca têzên mastêrî ew

dengnivîsar/notenivîsar tene analîzkirinê, lêkolînê bi nişandayîna teybetyên wan.

Di nava dîroka notenivîsarên stranên kurdîda berevokên li ser janrekî folklorê kêmin. Piştî berevoka kompozîtorê ermenya yê klassîk Komîtasra yên 13 stranên Destanên kurdî /"Melodies kurdes", recueillies par Archimandrite Comitas, Moskva 1903/ berevoka Z. Ozmanyân gaveke balkêşe ji bo nişandayîna janra folklorîda meye nebînayî – Destanan. Di berevokêda dengnivîsarên Komîtasin, yên Spîrîdon Mêlikyan û Aram Koçaryanin, yên Nûra Cewarî û Cemîla Celîlin. Dawyê dengnivîsarên Zozan Ozmanîanin ku cara yekemîn çap divîn. Herwiha berevokêda 4 şaxên stranên destana "Memê, Zînê", 7 şaxên "Kerr û Kulik", 3 şaxên "Leyl û Mecrûm", şaxek "Seva Hacê", 2 şaxên "Zembîlfiroş", 4 şaxên "Memê Eysê", 3 şaxên "Xecê Sîabend", şaxek "Ûsiv û Zelîxe" cîwar bûne.. Bi tevayî 25 stranên Destananin.

Çar stranên dawyê - şaxeke " Sîabend û Xecê", şaxeke "Memê, Eysê", 2 şaxên "Kerr û Kulik" dengnivîsarên Zozanêne ku ji stranbêjên kurdên Qazaxistanê - xûşk û bira Xanim û Ebdilbaqîyê Filîlî û Emerê Tefûr wexta êkspêdîsîa N. Cewarî tevî malbeta xwe li Qazaxistanê, sala 1986-a hatine nivîsarê. Bi komek û xemxurî Mehmet Bayrak stranên kurdên Qazaxistanê bi notenivîsarên Zozanê û bi notenivîsarên min yên stranên govendê û dewatan ku pirtûkên dîda û sisyada cîwarbûne cara yekemîn çap divîn.

Em zanin ku stranên Destana ji gele xanîanin/malanin li kîjanada têkst tene guhastinê lê awaz li ser mezmezkekî /formûlekî lado-întonasiyê şax vedide, hine par kin divîn, hine par çivane didin dirêj divîn. Hetanî dengnivîsarê Zozanê ji alyê mûzîkzana bes xanîkî awazê hatîye notenivîsarê bi texmîn ku awaz xanîyên mayînda guhastinên mezin çênake û ji bo xandina nota û femkirina awaza stranê xanîkî têrê dike. Eva tehera notenivîsarê bal hemû gelên dor û ber qebûlkirîbû, him jî ji bo xandine hêsabû, pirtûkada jî cî kem digirt. Nivîsarên wî teherî usa jî ji bo lekolînan dibûne bingeh. Lê bele wext hate guhastinê. Wextê nûjenda notenivîsara stranan ji despêkê hetanî kutasyê mûhîme ber ku di awazada her guhastineke çûk dikare cava pirsên zanîaryê yên pirteherî bide, prsên teybetyên mûzîka kurdî şiroveke. Bi saya Zozan Ozmanîan Destanên "Sîabend û Xecê", "Memê û Eysê" û 2 şaxên "Kerr û Kulik" ji despêkê hetanî kutasyê bi hostetî hatine notenivîsarê û bûne hebûna zanîarên mûzîka kurdî.

Berevoka Destanada cî girtî dengnivîsarên mûzîkzanên ermenî Komîtas, Sp. Melîkyan, A. Koçaryan hejayî qîmetên bilindin û cêrga notenivîsarên meselên mûzîka kurdî nimûnên başva dewlemend dikin, dixemlînin. Bi saya Mehmet Bayrak usa jî cara yekemîn di emrê kurdada Bibliografîya mezin li ser çande - mûzîka, zargotina kurdî çebûye, çapbûye. Ji Bibliografîyê em navên pêşekzan û pisporên çanda kurdî usa jî derheqa pirsên ku gotarada hatine şirovekirinê pê dihesin. Ûsa jî navên gotarên li ser kar û jîana stranbêjên eyan wek Eysê şan, Şvan, Mehmed Şexo, Kawis Axa, Tahsin Taha, Nasir Rezazî, M. Arif Cizîrî û yêd mayîn, komên mûzîkê, şirovekirinên êtnografî, hacetên sazbandyê di Bibliografîyêda cîwar bûne.

Gêografîya çevkanya mezine – ji welatên Ewropî, Ermenistanê, Russîayê hetanî Rojhilata navîn. Dema wan çevkanya jî dirêje – ji 1870-î hetanî 2002-a. Çevkanîyên Bibliografîyê bi zmanên fransî, almanî, înglîs, kurdî, tirkî, ermenî, russîne ku tercemeyî li ser zmaneki – tirkî bûne.

Her çiqaş jî Bibliografîyêda pirtûk û gotarên bi serecemên başqe tevayînin /Bibliografîa bi alfabêt hatîye hazîrkirinê/ ew bi temamî karekî bingehî û bihagirane, ji ku her pêşekzan dikare xwera gele çevkanyên hêja bivîne.

Para paşin ya pirtûka pêşin ew navên arşivanin ji kîjana M. Bayrak qinyat - wek kasêt, docûment, wêne berevkirine, kopîkirine. Ew bi piranî arşivên bajarên Kurdistanê Bakûrin, Ûnîversîtêten Tûrkiyê yên eyanin.

Pirtûkên dudu û sisya ew berevokên mûzîka kurdîne. Di jîana gelê kurda cara yekemîne ku bi jmarekî pir mezin – weke 750 stran û awazên gelerî bi tevayî tene çapkirinê, nîşandayîne.

M. Beyrak di nava pêşgotinên xweda derheqa berevkirina nimûnên mûzîka kurdî dinvîse û ew merya ku têkst û awazan ji qeytanên têypê, yanê jî dîska anîne ser kaxez bi bîr tîne. Berku ez tirkî nizamim, ezê weke texmîna xwe navên merya bîr bînim. Yê ku berevkirine ew Mehmet Bayrak bi xweye, Seyîdxan Kurije, N. Cewarîye, Hûmanê Çîane, Mûnzûr Çeme. Awazên strana N. Cewarî, Z. Ozmanîan notenivîsîne, têkstên strana Ahmed Çamlîbêl, A. Alxasî, N. Cewari anîne li ser kaxaz.

Gêografîya stranên berevokên M. Bayrak mezine – ew bi piranî stranên kurdên Bakûrin, kurdên Ermenistanêne bi zaravê kurmançî, û hine stran zazakîne ku nezîkî stîla stranên kurmançîne.

Di berevokada stran bi pirçiqîlî û pirjanrî xuya dikin. Himberî çiqîlên Aşiqyê, Bajaryê, stranên Ola êzdyê, stranên Gundîtye pir dewlemend û pir janrîne. Di para çiqîlê stranên Aşiqyêda stranên Evdalê Zeynikêne ku mîreta Evdalê Zeynê yê folklorî bi nimûnên başva zêde û dewlemend dikin. Stranên Bajaryê bi piranî li ser têkstên şairan tene humanê. Berevokêda stranên li ser têkstên Cegerxwîn usa jî stranên Aramê Tîgran, Mehmûd Baran û Beşîr Botanîne ku bi xwe xudanên teksta û awazanin. Nimûneke Beytê êzdyê bi sernivîsa “Borê Reş” pirtûka dudada cîwar bûye.

Di nava çiqîlê stranên Gundîtyêda stranên govendêne, yê dewata – xerîbyê, stranên êposa “Dim-Dim”-ê, stranên debê – yê zarok mijûlkinê, stranên zaroka û pêra jî yê bihagirane – stranên evîntyê, yê dîrokê - çawa ku kurdên Ermenistanê nav dikin stranên mêranyê û yê Destananin - wek “Cembelî”, “Cefer û Emê”. Usa jî awazên hêla Maraşê, Kurddaxê ew herd berevokan dixemlînin.

Salên dirêj min ji binelyên Ermenistanê, Gurcistanê – yê kurdên êzdî usa jî ji kurdên Qazaxistanê stran û awazên geleryê berev kirine ji bo lêkolîna. Pêra jî çiqaş mecal hebûne stran û awazên kurdên Kurdistanê /ji selik u kasêtan, ji mêvanên stranbêj/ nivîsîne.

Di salên karkirina mine paşinda li Înstîtûta Akadêmîa Ermenistanê ya Hunermendyêda ez bi pirsên tîpologîya mûzîka kurdîva mijûl dibûm kîjan bi sîstem kirina strana despê bibû. Min stranên berevkirî çawa bi janra usa jî bi stîla, bi lado-întonasya paravekiribû û dest bi analîzên tîpologîyê kiribû. Karên xwe min ji stranên bi stîla Reqasê/bi stîla pêrîodîk despêkir ku peyra hedî – hedî ber bi stranên bi stîlên mayîn wek yê Lîrîkyê, Şirovekirinê, Rêçîtatîv-weke xeverdane bimeşim. Stranên bi stîla Reqasê bi rîtm û mêtren wekehev, bi awazên sivike kinin û di nava gelda gele belabûne, dîtina wana ne zehmete. Ew stranên govendêne, yê dewanin, yê debê û karkirinêne. Sedî zêdetir stranên wî stîlîye baş mira qinyatinên başbûn ji bo lêkolîne. Hema ew berevoka min tevî stranên M. Bayrake berevkiribûn û di nava herd pirtûkên “Mûzîk, Dans û Şarqîyên Kurdî”- da çap bûn.

Berevoka min bi rengêkî zanyaryê hazîr bibû – bi pêşgotin, pênasîna. Nimûnên stranan bi tîpên lado-întonasya paravekiribûn. Pirtûkên M. Bayrakda stranên berevkirî bi alfabêt hatine cîwarkirinê û stranên ku bi teherên mûzîkayê paravekiribûn ketine cîyên başqe, yê dûrîhev.. Pêşgotineke nû ku min ji bo çapkirina dengnivîsarê xwe nivîsibû para gotarên pirtûkên “Muzîk, Dans û Sarqîyên kurdî”-ye pêşinda cîwarbû /binher pirtûka pêşin, rû 315 /.

Dawya wê pêşgotinêda para pênasinê heye bi navên stranbêja, naven mûzîkzanên ermenya ku stranên kurdî notenivîsîne bi hejmarên stranava. Berkû stranên pirtûkên M. Bayrak bi alfabet cîwar bûne ew hejmar îdi nayêne kêranîne û stranên dewerên başqe, stranên ku stranbêjên ermenî gotine û mûzîkzanên ermenî notenivîsîne nayêne xuyayê.

Û dîsa ji başe ku notenivîsarên stranên kurdên Ermenistanê, û hine stranên ermenya hatine çapkirine, hatine xweykirine.

Kutasya pirtûka sisyada Fotoalbome bi wêneyên hewaskarva. Eva para bi wêneya nivîskarê ermenya Xaçatûr Abovyanva despê dive ku kutasya sedsalya 19-ada derheqa kurdada lekolîneke hêja nivîsîye û çap kirîye. Usa jî wêneyên stranbejên kurda Eysê Şan, Meyrem xan, Tahsîn Taha, ermenî Karapêtê Xaço, Gulbihar, Xeyranok xan, hacetên sazbandyê yên pircûre wek tembûr, ûd, keman, meya, fiqe, duzele, def, sazbandên êzdî, Ahl-ê haq, kurdên cihû yên Îzrayêlê, wene yên komên sazbandan hene.

Herwiha, cara yekemîn di dîroka çanda kurdîda Berevokên lêkolîn, stran û awaza, Bibliografîa û Fotoalboma çande û bi taybetî mûzîka kurdî hatîye hazirkirinê û çapkirinê. Ew ne karekî zanîaryêye lê bi dewlemendya pirs û melûmetya, nîşandaîna çanda kurdî bi heralîva karekî pir heja û giranbihaye ku dikare bive rewşa her pirtûkxana kurdî yên şexsî û dewletê.

Dengnivîsar/notenivîsar û nivîsarên têkstên strana bi texmîna min li ser dereca bilindin, bi zanebûn û qedirgirtina folklorê ew par hatine hazirkirinê. Bes hine kemasyê teknîkyê di notenivîsar û têkstada tene texmînkirinê. Note Z. Ozmanîan li ser kompûtêre berevkirine. Ez haj têkst berevkirine tineme. Di notada carna ber kilîta rêzên mûzîkî nîşanên dengên niv tonî nehatine danîne û hine cara jî çawa têkstên bin notada usa jî têkstên stranada şaşîyên herfa kifş divin.

Tevî van kêmasiyên biçûk hersê pirtûkên “Mûzîk, Dans û Şarqîyên Kurdî” di dîroka çanda kurdîda tiştne nebînaîne û nayê bawarkirinê ku merîkî karibûye karekî usa mezin bike, aqa qinyat – gotar, pirtûk, stran û awaz, wene berevke, tercmeke, berevokên hêja yên mûzîka kurdî, Fotoalbom u Bîblîografîa çanda kurdî hazirke, çapke. Ew karê kirî ji zora merîkî dere. Rastî jî, merî çiqê gere evîndarê mûzîka xwebe, çiqê gere evîndarê gele xwebe wekî heykelên çandeyî yên ha bedew hazirke û pêşkêşî xwendevana û dîroka çanda kurdî bike.

Hersê pirtûkên qîmetbilind kêrhatîne ji bo mûzîkzana yên bi pirsên dîrok û teorîa mûzîkêva mijûl divîn, edebyetza yên ku çapamanya şyêrên folklorîva mijûl divîn, dîroka yên dîroka gel û çandeyîva mijûl divîn, zmanzana yên pirsên dîalêktava mijûl divîn, êtnolocîsta yên cil, deb, hacetên sazbandyê û gele pirsên mayîna mijûl divîn.

Pêra ji merî difikire ku piştî 8 salên çapbûna van pirtûka hê jî derheqa wanada kem tene gotinê. Menî yeke: hê jî pêşekzanên me yên ku pey cewahirên gel bimeşin û pirsên çandeyîva mijûlbin kêmin, têrê nakin. Kutasyê em dixazin çend pêşnarê xwe hêja Mehmet Bayrakra bêjîn ji bo karên wiye pêşrojê. Berî ewlin bi texmîna me baş dibû wekî gotarên pirtûkê usa jî bi kurdî bihatana tercmekirinê yanê jî ew gotar bi zmanê orîcînal bihatana çapkirinê. Stran û awazên berevkirî bi qîmetên xweye folklorîva bihatana bijartinê ku nimûnên nehêje di berevokada kembûna, pêra jî stranên giranbiha – yên Destana, dîrokî, evîntyê, awazên bihagiran zêdebûna. Xastina paşin jî ewe ku baş dibû parên nasandinan ji bo wan stran û awazanra li ser yêr, nav û paşnav, sal û karên stranbeja, sazbanda çêbûna.

Tevî van xastina em dîsa jî bimbarekyê didin hêja Mehmet Bayrak ku di nava emrê xweye kêrhatîda karekî haye bihagiran pêşkêşî gelê xwekir û dimînin bi hevya berhemên nû.

KARÊ BÛN

(Veb to be-Être)



Dr. Deham Ebdulfettah

[Min ev mijar ji destnivîsa xwe "Kar" hilçiniye. Mebesta min ji belavkirina mijarê ew e, ku ez vî karê rêzder û aloz, ji hemû hêlan ve tevbidim û nêrînên xwe yê taybet jî raberî xwendevanan bikim. Hêviya min ji şarezayên zimên heye ku nêrîn û têbiniyên xwe derbarî vê lêkolînê (berî çapkirina destnivîsê) berçav bikin].

"Bûn" karekî rêzder e, Aloz û arîşedar e. Aloziya vî karê awarte ji du hêlan ve berçav dibe:

-Teşe(form).

-Veguhestin.

Teşe(Forom):

Di zimanê kurdî de (2) kar bi teşeya "Bûn" hene. Her du "bûn" jî nederhingêv(Têneper)in. Lê ji hêla wate û veguhestîna ve her du kar jî hev cuda ne, yek ji wan rêzder e(awarte ye) û yê dî asayî ye.

- "Bûn" a rêzder bi wateyeke nêzî wateya (hebûn, heyîn) bikar tê:

- Ez dostê te bûm (ez dostê te hebûm)

- Nuha jî ez dostê te me. (nuha jî ez dostê te heme)

- Sibe jî ez ê dostê te bim. (sibe jî ez ê dostê te hebim)

- "Bûn" a bi wateyeke nêzî wateya (çêbûn), ku têgeha guherînê digihêje rewşa karayê (kiryarê) vê "Bûn" ê :

- Em bûn dostên hev.
(me hev nedinasî, va em bûn dostên hev)

- Em dibin dostên hev.

(berê em ne dost bûn, va em dibin...)

(dostanî çêdibe)

- Em ê bibin dostên hev.

(nuha em ne dost in, lê em ê bibin...)

(dostanî dê çêbibe)

Ji van mînakên xuya dibe ku wateyên her du "Bûn" an jî hev cuda ne. Bikaranîna wan jî, di pêvajoya hevokan de jî hev cuda ne, tenê di dema (nêzbûriya xwerû) de, eger pêvebir(pêxistî)(11) hevalnav(rengdêr) be, hingê her du "Bûn" bi yek rawe û yek formê di pêvajoya hevokê de bikar tên.

Wek:

- ava ku min vexwar sar bû (bû rêzder e)

-xwarin li ber bê sar bû (bû asayî ye)

Lê carinan, "Bûn" di yek hevokê de wateya her du karan (rêzder û asayî) bi xwe ve digire. Anku, dibe ku "Bûn" rêzder be û dibe jî ku asayî be.

Wek:

-sêv sor bûn

Ev hevok wateya her du "bûn" an dide:

- "Bûn" a rêzder : dema min sêv kirrîn sor bûn.

- "Bûn" a asayî: sêvên kerik, di darê de sor bûn.

Derbarî vê tevheviya her du "bûn" an, pirs ev e : Gelo, em ê çawa van her du karên hevteşe, di hevokê wisan de, jî hev binasin û wateyên wan jî (li wê gorê) destnîşan bikin?!

Dengdayîn(stress):

Ev kêşeya tevheviya her du "Bûn" an diyardeyeke danganî(fonîtîkî) ye. Dengê bilêvkirina her du "Bûn" an ne yeksan in. Dengê (û) di "Bûn" a rêzder de hinekî kurt û sivik dibe, nêzî dengê (u) bilêv dibe, wek:

- Hevalê te ez bûm.

Lê dengê (û) di "Bûn" a asayî de, hindêkî dirêjtir yan bilindtir tê bihîstin:

- Ez bûm hevalê te.

Ev diyardeya danganî di hemû zimanên de heye. Zimanzan nîşandek bo kîta bilind(dirêj) daye xuyakirin. Di zimanê me de jî ev diyarde peyda dibe, lê ew nîşeya cudakirina dangan hêj cih negirtiye. Hinek şarezayan ew nîşe bi nave "kurpandin" daye nasîn

û hindekan jî nave "derbedayîn" lê kiriye. Ev her du nav jî bi mebesta "dengdayîn" hatine. Di zimanê Ingilîzî de "stress" hatiye, di yê Firensî de "accent" hatiye, di yê Farisî de "tikeyê şiddet- تکیه شدت" hatiye û di zimanê Erebi de "nebre- نبرة" tê gotin.

Vêca ku em nîşandekê, wek (—) dînin ser yan bin kîta dengdayî, em ê bilêvkirina bêjeya wê kîte ji hevteşeya wê binasin û em ê wê ji ya dîtir cuda bikin.

Nimûne:

-Xwarin: (weku kar) dengê kîta "rin" asayî ye:

- zarokan sêv xwarin.

- (Weku jêder) dengê kîta "rin" bilindtir tê xwendin(xwarin)

Li vê gore jî em Karin dengê bilêvkirina jêder û karan ji hev binasin:

Jêder	kar
- Hat in	ew hatin
- kuşt in	wan ew kuştin
- ket in	em ketin
- sorb ûn	gul sor bûn

Bi heman pîvan jî, dengê bilêvkirina her du "Bûn"an ji hev tèn nasîn û wateyên wan jî, ji hev cuda dibin:

- dar mezin bû (berê mezin bû)

- dar mezin bû (berê biçûk bû)

-Veguhestin:

Di veguhestinê de form û raweya hevokên her du karên "Bûn" ji hev cuda ne:

- **Demên Borî:**

- **Nêzboriya xwerû:**

Di vê boriyê de raweyên her du "Bûn"an li gora celebê pîvebir(pêxistî), wekî hev tèn, yan jî cudayî hev tèn:

- Eger pîvebir hevalnav(rengdêr) be, hingê her du "Bûn" li pey pîvebir tèn:

- Tirî reş bû (rêzder)

- Tirî reş bû (asayî)

- Lê eger pêvebir nav be yan cînav be, "bûn" a rêzder li paş pêvebir têt, û "bûn" a asayî li pêş têt:

- Azad serok bû

- Azad bû serok

Li vê gorê, veguhestina her du karan di nêzboriya xwerû de bi van raweyên jêrin pêk têt:

Bûna Rêzder

Erênî:

- Ez dirêj bûm

- Tu dirêj bûyî

- Ew çi bû?

- Em şagirt bûn

- Hûn şagirt bûn

- Ew çi bûn?

Neyînî:

Di warê neyînkirina "bûn" a Rêzder de, alava "ne" dikeve ser pêvebir (ez ne geş bûm), lê di neyînkirina "bûn" a asayî de "ne" dikeve ser "Bûn"ê bixwe (ez geş nebûm):

Bûna Rêzder

Neyînî:

- Ez ne dirêj bûm

- Tu ne dirêj bûyî

- Ew ne kes bû (Rêzder)

- Em ne şagirt bûn

- Hûn ne şagirt bûn

- Ew ne tişt bûn

Bûna Rêzder

Pirsyarî:

- Ma ez dirêj bûm?

- Ma tu dirêj bûyî?

- ka ew kî bû?

- gelo em şagirt bûn?

- Ma hûn şagirt bûn?

- Ew çi bûn?

Her weku me berê jî gotibû, "bûn" a Rêzder di demên borî, yên dîtir de (sergîhayî, berdeyam, çîrokî), nayê veguhestin, anku bikar nayê. Lê "Bûn" a asayî, weku hemû karên normal di her dem û raweyê de têt veguhestin.

Dema nuha:

Di dema nuha de "bûn" a Rêzder bi raweyên (im, î, e, in) têt dîtir, bêyî ku tişteke ji binyata wê diyar bibe, lê "bûn" a asayî li gora rêzika xwe têt veguhestin.

Nimûne:

Bûna Rêzder

Erênî:

- Ez dirêj im

- Tu dirêj î

- Ew karmend e

Bûna Asayî

ez dirêj bûm

tu dirêj bûyî

ew bû çi?

em bûn şagirt

hûn bûn şagirt

ew bûn çi?

Bûna asayî

ez dirêj nebûm

tu dirêj nebûyî

ew nebû kes (asayî)

em nebûn şagirt

hûn nebûn şagirt

ew nebûn tişt

Bûna asayî

ma ez dirêj nebûm?

ma tu dirêj nebûyî?

ka ew bû kî?

çima em bûn şagirt?

çire hûn bûn şagirt?

ma ew bûn çi?

Bûna Asayî

ez dirêj dibim

tu dirêj dibî

ew dibe karmend

- Em şagirt in em dibin şagirt
- Hûn şagirt in hûn dibin şagirt
- Ew çi ne? ew dibin çi?

Neyînî:

"Bûn" a Rêzder bi "ne" tê neyînkirin(dikeve ser pêvebir). Lê "bûn" a asayî bi "na" tê neyînkirin:

Neyînî:

- Ez ne dirêj im(12) ez dirêj nabim
- Tu ne dirêj î tu dirêj nabî
- Ew ne karmend e ew nabe karmend
- Em ne şagirt in em nabin şagirt
- Hûn ne şagirt in hûn nabin şagirt
- Ew ne tişt in ew nabin tişt

Pirsyarî:

- Ma ez dirêj im? ma ez dirêj dibim?
- Ma tu dirêj î? ma tu dirêj dibî?
- Gelo ew dirêj e? gelo ew dirêj dibe?
- Em dirêj in? em dirêj dibin?

- Dema paşeroj:

Di vê demê de "bûn" a Rêzder bi binyata dema nuha (b) û paşkokên kesîn tê veguhestin, wek (ez ê bim). Lê "bûn" a asayî bi binyat û pêşgira dema paşeroj (bi) û paşkokê tê veguhestin:

Bûna Rêzder

Erênî:

- Ez ê dirêj bim ez ê dirêj bibim
- tu yê dirêj bî tu yê dirêj bibî
- ew ê dirêj be ew ê dirêj bibe
- em ê dirêj bin em ê dirêj bibin
- hûn ê dirêj bin em ê dirêj bibin
- ew ê dirêj bin ew ê dirêj bibin

Neyînî:

Di paşeroj de "bûn" a Rêzder bi alava "ne" dikeve raweya neyînî. Ev alav dikeve ser pêvebir(pêxistî), ne ser "bûn"ê:

Erênî

- Ez ê dostê te bim Ez ê ne dostê te bim
- Dostê te ez ê bim Dostê te dê ne ez bim

Lê "bûn" a asayî weku her karê sergihayî, bi alava "na" dikeve raweya neyînî:

Bûna Rêzder

- Ez ê ne dirêj bim saleke dî jî ez dirêj nabim
- Tu yê ne dirêj bî saleke dî jî tu dirêj nabî
- Ew ê ne dirêj be saleke dî jî ew dirêj nabe

- Em ê ne dirêj bin saleke dî jî em dirêj nabin
- Hûn ê ne dirêj bin saleke dî jî hûn dirêj nabin
- Ew ê ne dirêj bin saleke dî jî ew dirêj nabin

Pirsyarî:

- Ma ew ê mezin be? ma ew mezin nabe?
- Hûn ê mezin nebin? ma hûn mezin nabin?

Raweya Fermanî:

Bûna Rêzder

Erênî:

- Mirovekî mêrxas be bibe mirovekî mêrxas
- Mirovinî mêrxas bin bibin mirovin mêrxas

Neyînî:

- Ne tirsonek be nebe tirsonek
- Ne tirsonek bin nebin tirsonek

Di raweyên daxwazî, yê dîtir de jî her du "bûn" ji hev cuda dibin:

Xwezî:

- Xwezî ez pêşmerge bim (bûna Rêzder)
- Xwezî ez bibim pêşmerge (bûna asayî)

Bilanî:

- Bila ez pêşmerge bûma (bûna Rêzder)
- Bila ez bûbûma pêşmerge (bûna asayî)

Gerekî:

- Gerek ez pêşmerge bim (bûna Rêzder)
- Gerek ez bibim pêşmerge (bûna asayî)

"Bûn" û paşkokên (im, î, e, in):

Berî nuha me gotibû, "bûn" a Rêzder a bi wateyeke nêzî wateya "hebûn" di dema nuha de vederî forma xwe ya resen tê veguhestin. Lê di demên borî, paşeroj û raweya fermanî de tîpin ji binasaziya wê diyar dibin:

- Em dostên hev bûn (borî)
 - Em ê dostên hev bin (paşeroj)
 - Dostên hev bin (fermanî)
- Di dema nuha de tiştek ji binasaziya "bûn"ê namîne:
- Ez dost im
 - Tu dost î
 - Ew dost e
 - Hûn dost in

Derbarî van kurtebêjeyan (im, î, e, in) pirsek giring û rewşa di nav şareza û xemxurên zimanê Kurdî de digere:gelo ev pirtik (im, î, e, in) çi ne? Şarezayên zimên ew çawa dane nasîn? Zimanzanên Kurd di pirtûkên xwe de, ew kurtebêje ne mîna hev dane nasîn.

- Reşîdê Kurd, Samî Tan û hinin dîtir jî, ew kirine cînavên kesane û navên (cînavên dûmdar, cînavên pêvebestî û cînavên paşgînkirî) li wan kirine.

- Celadet Bedirxan, Kamîran Bedirxan, Sadiq Behadîne Amêdî, Nûrî Elî Emîn û gelekên dîtir, dîtine ku ew karê "bûn" a Rêzder, di dema nuha de ne.

- Qenatê Kurdo jî, ew kirine paşkokên nav û cînavanan. Ev her sê danasînen dûrî hev di pirtûkên rêzimanî de cî girtine û di nav destên xwendevanan de ne. Ev jî ne durist e ku bi vê têvelî û tevheviyê bimînin.

Berî ku ez nerîna xwe derbarî vê kêşeya rêzimanî eşkere bikim, em ê bi hev re wan her sê danasînan di ber çavên xwe re derbas bikin û hindekî li ser wan rawestin:

A – Cînav:

1- em dizanin ku cînav ew bêje ne, yên ku cihê navdêran digrin û li şûna wan bikar tên.

Wek:

- Azad çû dibistanê
(ew çû dibistanê)
- Zînê pirtûk xwend
(Kê çi xwend?)
(Wê ew xwend)

Li gora vê danasîne, gerek ev kurtebêje jî (eger cînav bin) cihê navdêran bigrin û li şûna wan bikar bên. Gelo, di vê mînakê de (Azad şagirt e), ev(e) dikare cihê (Azad) bigre(---- şagirt e)?

Dibe ku di pêvajoya qissekirinê de bê zanîn ku (e) li (Azad) vedigere, lê di vê mînakê de (Azad û Zîn şagirt in),(--- û --- şagirt in), yekcar nayê zanîn ku ev (in) li kîjanî ji van cînavan (em, hûn, ew) vedigere.

2- Di vê mînakê de (ez şagirt im), ev (im) cihê çi girtiye?! Berçav e ku (im) bi cînavê kesîn (ez) ve girêdayî ye, cihê wî girtiye. Lê ku em çavên xwe ji pirsan bigrin û bibêjin, ev (im) cîgirê cînavê (ez) e, gelo bi çi behaneyê û bo çi sûdê (cînav) cihê cînavêkî diyar û eşkere digre?!

3- Di pêvajoya hevokan de nav dibin kara (kiryar) û berkar (bireser). Dema ku nav tên avêtin cînav cihê wan digrin û li şûna wan dibin kara û berkar.

Wek:

1- Hevalan mêvan dîtî
(wan ew dîtî)

2- Heval mêvanan dibînin

(ew wan dibînin)

Di mînaka (1)ê de (in) bi navê (mêvan) û cînavê (ew) ve girêdayî ye. Ev nav û cînav jî, di hevokê de berkar in. vêca ku ev (in) jî cînav be gerek ew jî cihê (mêvan, ew) bigire û wekî wan bibe berkar.

Wek:

- Hevalan (in) dîtî?!

Di mînaka (2)ê de jî (heval, ew) kara (kiryar)in û (in) a (dîtî) bi wan ve girêdayî ye. Gerek ev (in) jî cihê wan bigire û li şûna wan jî bibe kara.

Wek:

- (in) mêvanan dibînin?!

Ev jî nabe û ne durist e ku bibe!

4- Di şêwezare kurmacî de cînavê kurtkirî (ê) tenê cînavêkî pêgir(pêvebestî) ye. Ev cînav bi du şêweyan ji cînavên kesîn (wî, wê) kurt dibe:

1- Bi pêrbestan re(bi, ji, li, di):

-Bi + wî, wê = bê = pê

(Min bi wê nivîsî = min pê nivîsî)

- Li + wî = lê

(min li wî da = min lê da)

2- Bi karan re:

- Mîn da wî = mîn dayê

- Ez ketim wê = ez ketimê

Lê di şêwezare soranî de cînavê (pêvebestî) heye û bi navê (ranawî likaw) tê nasîn. Ji van mînakên jorîn tê zanîn ku ev kurtebêje (im, î, e, in) ne cînavin.

B- Karê "Bûn":

1- Çi karê heye du mercên sereke bi xwe ve digre:

- Demeke destnîşankirî (borî, nuha, paşeroj).

- Bûyere (rûdanek, bizavek) Karê "bûn" jî, di dema borî û paşeroj de, ev her du merc lê xuya dibin:

- Ez şagirtêkî jîr bûm (borî)

- Ez dê şagirtêkî jîr bim (paşeroj)

Lê di dema nuha de: (Ez şagirtêkî jîr im), pêjna dema nuha, bi egera (im)ê ji hevokê tê (nuha ez şagirtêkî jîr im), lê ka rûdana bûyerê?! Anku, buyer, bi şêweyekî diyar û eşkere, di van pirtikan de (im, î, e, in) nine.

2- Dema ku karekî nederhingêv (têneper) di dema borî de bikar tê yek ji van pirtikan (im, î, e, in) digihêje wî karî:- (Ez ketim). Vêca

ku ev (im) karê "bûn"ê di dema nuha de be, çawa karekî borî (ket) digel karekî dema nuha (im), her du kar bi hev re, karekî di nêzboriya xwerû de saz dikin?! Anku, (ket + im = ketim)?!

3- Eger (yî) di vê mînakê de (tu hevalê min bûyî) karê bûn di dema nuha de be, gerek karê (bûyî) karekî lêkdayî (hevedûdanî) be, ji (bû + yî), anku, [(bûn) di dema borî de + (bûn) di dema nuha de = (bûneke) lêkdayî di dema borî de] ?!!

4- Eger rast ev (im, î, e, in) karê (bûn) di dema nuha de bin, gerek hemû kar di zimanê kurdî de lêkdayî bin. Anku, binesaziya her karekî (lêkerê) di zimanê Kurdî de ji (2) karan pêk hatiye, **wek:**

Çûn : Ez diçim = (diç + im)

Hatin : Tu hatî = (hat + î)

Nivîsîn: Ew dinivîse = (dinivîs + e)

Ketin : Em ketin = (ket + in)

Eger em bêjin ev (im, î, e, in), di van mînakan de karê (bûn) in, jixwe (diçim, hatî, dinivîse, ketin) lêkdayî ne û karên xwerû (sade) di zimanê me de nînin. Ev jî gotineke nayê gotin, ku bê gotin jî nayê pejirandin.

C - Paşkok(paşpirtik):

Gotina "paşkok" navlêkirina prof. Qenatê Kurdo ye. Lê Qenat ronî nekiriye, ka çima ev kurtebêje (im, î, e, in) paşkok in (eger gotibe jî min bixwe nedîtiye). Bi dîtina min jî, ev (im, î, e, in) paşkokên nav û cînavan in. Ev paşkok di raweya rast û resen (bê verês/ tewng) de, li pey nav û cînavan bikar tên û weku alavên girêdanê ser û pêgirên hevokan bi hev girêdidin, wateyên wan sergihayî (temam) dikin. **Wek:**

- Dostê te ez im

- Tu dostê min î

- Azad dostê me ye

- Em dostê hev in

Ev paşkok li pey karan jî bikar tên, lê herî bi nav û cînavan ve girêdayî ne, çî ew nav û cînav di hevokan de kara (kiryar)bin.

Wek:

- Ez diçim xwendîgehê

- Tu jî li malê dimînî

Yan jî berkar bin.

Wek:

- Min hûn dîtî

- We ez dîtî

Ji van nimûne û mînakên derbasbûyî tevan tê zanîn ku ev pirtik(im, î, e, in) ne cînav in, ne karê "bûn"ê di dema nuha de ne jî. Bi

baweriya min ew paşkokên nav û cînavên raweya rast (bê tewng) in. Anku, peyrewên wan ên pabendî(lazimî)ne. Ew nav û cînav li kû bikar bînin ev paşkok jî li pey wan bikar tên.

Li dawiya danasîna van paşkokan pirseke giring raberî me radiweste:

- Eger ev (im, î, e, in) paşkokên nav û cînavan bin, vêca karê "bûn"ê di dema nuha de li kû dimîne?!

Em dizanin ku "bûn" di demên borî, paşeroj, û raweya fermanî de diyar û berçav e.

Wek: - Ez dostê we bûm (borî)

- Ez ê dostê we bin (paşeroj)

- Dost be, dost bin (fermanî)

Lê di dema nuha de têgeha karê "bûn"ê bi forma (im) tê rojevê, **wek:**

- Nuha jî dostê we ez im

Pirs xwe dîbare dike: Eger ev (im) ne "bûn" be, gelo ev pêjna karê "bûn"ê di dema nuha de, ji kû, yan ji çî hatiye?! Pirseke rast û rewaya ye. Lê sê encamên rast û ronî jî, beranberî pirsê li dar in:

1- Ev (im) ne karê "bûn"ê ye.

2- tîpek tenê jî, ji binesaziya karê "bûn" di hevokê de nine.

3- pêjna "bûn" a dema nuha ji hevokê tê.

Çawa "bûn" nine û di heman demê de pêjna wê heye?! Ma ev dibe?!

Ji xwe ev e kêşeya vê "bûn" a Rêzder. Bi egera vê kêşeya aloz jî nêrînen zimanzanan, derbarî danasîna wê ne yeksan in.!

Em dizanin ku hevoka navdêrî di zimanên Hindo-Ewropî de nine, lê derbirîneke navdêrî heye, **wek:** (Ka birayê te?). Zimanê Kurdî jî yek ji zimanên Hindo-Ewropî ye.

Vêca ku ev (im, î, e, in) paşkokên nav û cînavan bin(bêyî ku girêdaneke wan bi jêdereke bûyerî ve hebe), dive em mukir bînin ku hevoka navdêrî di zimanê me de heye û ev hevok (ez şagirt im) hevokê navdêrî ye. Ev jî arîşeyeke dîtir e, vederî hevoksaziya zimanên Hindo-Ewropî ye.

Bi baweriya min, hemû hevokên zimanê Kurdî kardarî(lêkerî) ne. Kêşeya hevokên van paşkokan jî bi van mînakên jêrîn ronî dibe:

1- Ez ji te bawer dikim

- Ez ji te bawer(....)im

- Ez ji te bawer im

2- Tu bi min bawer dibî

- Tu bi min bawer(....)î

- Tu bi min bawer î

- 3- Ew cihê baweriya min digire
 - Ew cihê baweriya min(...) e
 - Ew cihê baweriya min e

Di van her sê mînanan de paşkokên (im, î, e) bi karên dema nuha (dik..., dib..., digir...)ve hatine xebitandin, lê ew peyrewên cînavên (ez, tu, ew) û pêgirên wan in. Dema ku her sê kar di mînanan de hatin avêtin, paşkok li şûna wan man û pêjna dem û bûyerên wan bi xwe ve girtin. Loma em dibêjin, pêjna bûyereke nepen di dema nuha de ji hevokên van paşkokan tê. Bi vê egerê jî, pîrrianiya şarezayên zimên guman dikin ku ev paşkok karê "bûn"ê di dema nuha de ne.

Di zimanê Farisî de karê "bûden" beranberî karê "bûn" di dema borî de bikar tê:

Farisî

- Men şagird bûdem
- To şagird bûdî
- Û şagird bûd

Kurdî

- ez şagirt bûm
- tu şagirt bûyî
- ew şagirt bû

Lê di dema nuha de, li şûna "bûden" karê "hasten" bikar tê:

Farisî

- Men şagird hest-em
- To şagird hest-î

Kurdî

- ez şagirt-im
- tu şagirt-î

Carinan jî karê "hesten", bi egera sivikbûnê tê avêtin û hevok bi vî şêweyî tê xebitandin:

- Men şagird(...)em = men şagird-em
- To şagird(...)î = to şagird-î

Di zimanê Kurdî de jî, ez bawer dikim ku karê "bûn"ê di dema nuha de, li dirêjahiya demê, hatiye avêtin û paşkokên nav û cînavan (weku şûnmayên "bûn" a avêtî) li pey pêvebir (pêxistî) mane:

- Ez şagirt (dib-im) = ez şagirt.....im
- Tu şagirt (dib-î) = tu şagirt.....î
- Ew şagirt (dib-e) = ew şagirt.....e
- Em şagirt (dib-in) = em şagirt.....in
- Hûn şagirt (dib-in) = hûn şagirt.....in
- Ew şagirt(dib-in) = ew şagirt.....in

Em dizanin ku her zimanek taybetmendiyên wî hene û zimanê Kurdî li yê Farisî jî nayê pîvan. Lê di vê xala rêzimanî de her du ziman nêzî hev dibin, digel ku di Farisî de hevoka karê girêdanê (hesten), hevokeke navdêrî ye, lê hevoka Kurdî (ez şagirt im), hevokeke kardarî(lêkerî) ye. (bi egera karê avêtî, ku ew jî "bûn" e).

Di zimanê me de karê "hebûn" lêkdayî ye, ji binyata karê "heyîn", ku (he)ye û "bûn" a Rêzder pêk hatiye. De ka em binêrin, çawa ev karê lêkdayî bikar tê:

- Dema borî : Hespekî min hebû
 - Dema nuha: Hespekî min he....ye = heye
- Diyar e ku di dema nuha de "bûn" jî "hebûn" a lêkdayî jî tê avêtin, wekî ku "bûn" a xwerû ji hevoka (ez şagirt...im) hatiye avêtin! Hebûna van paşkokan (im, î, e, in) sê erkên watedarî pêk tînin:

- 1- Heyîn û kiriyariya wan nav û cînavên ku bi wan ve girêdayî tekez dikin:
- Ez hatim
 - Azad mamoste ye
- Dema ku cînav bi egera sivikbûnê tê avêtin, paşkok hebûna wî tekez dike:
- Tu çi karî dikî?
 -mamoste me!

2- Jimara nav û cînavên ku bi wan ve girêdayî:

- Ev mirov mêvan e (yek mirov)
- Ev mirov mêvan in (gelek mirov)

3- Çaxa ku "bûn" a Rêzder di dema nuha de tê avêtin paşkok pêjna dem û bûyeran destnîşan dikin:

- Sala par ez karmend bûm
(bûyera karmendiyê di dema borî de)
- Nuha jî ez xwendekar im
(bûyera xwendekariyê di dema nuha de)

Wisn jî:

- Em heval bûn (borî)
- Em heval in (nuha)
- Em dê heval bin (paşê)

Ji hêla rastnivîsê ve jî ev paşkok (im ,î , e , in) li gora wê ravekirina me , bi vî şêweyî tînin nivîsîn :


- Eger li pey karan bîn xebitandin divê bi wan ve bîn nivîsîn :
- Ez hatim
- Hûn hatin
- Lê ku li pey nav û cînavan bîn xebitandin , divê cuda û serbixwe bîn nivîsîn :
- Ez şagirt im
- Em hevalên hev in

[1] - Pêvebir(pêxistî):ew navdêr û rengdêr ê ku di hevokê de cihê rewşa salixî digire, wek:

(Azad jir bû, gul sor in)
 - Pêvebir: Celadet Bedirxan bikar aniye.
 - Pêxistî: Kmîranê Bedirxan bi kar aniye.

[2] - Li herêmanan (ez dirêj nimim / nînim) jî tê gotin.

*şaristaniya ku êzdiyan
li ser erdnîgariya kurdistanê destpêkiriye
nasbikîn û biparêzin*




Kemal Tolan\ Elmaniya

Gelek kes dizanin ku, min li ser pirsra ka herêm û deverên Êzdî(Ezdahî) lê jiyane çiqasî ji ol û netewa xwe ya Kurdî re xwedî derketine anjî Êzdî çiqasî urf, adet û zimanê Kurdî parastine, gelek caran raya xwe di lêkolîn, gotar, di nav rûpelên pirtûka xwe, ya bi navê **Hebûn û Tûnebûna Êzdiyan Tev Romanên Zindîne û Nasandina Kevneşopên Êzdiyatîyê** de eşkere kiriye. Her weha min di dû gotaren xwe **de***1 bi taybetî bahsa kevnariya dîrok û şûnwarên Êzdiyan yên ku li herêma Hesenkêfê(Heskîfê) jiyân, kiriye.

Nihajî dixwazim dîsa bi taybetî hinekî bahsa erdnîgariya hinek şikeft û çiyayên ku Êzdiyên li herêma Xendeqîyan jiyane bikim.

Belê, dîroknivîsê Kurdan yê herî navdar, mîr Şerefxanê hukumdarê Bedlîsê (yê sala 1597 an) jî, di pirtûka xwe ye „Şerefname“ yê de bahsa hinek eşîrên li derdora Heskîfê-Hesenkêfê dike û dibêje: "Sêzde eşîret û qebileyên giring li navçeya Hesenkêfê hene: Aştî, Mihalbî, Mihranî, Becnewî, Şeqaqî, Îsturkî, Kurdî Mezî, Kurdî Piçuk, Reşan, Kişkî, Çilkî, **Xendeqî**, Suhanî û Bidyan (*2 **rûpel**:191).

Her weha, gava mirov baş li ser vê xarîta xwarê jî binêre, meriv dibîne ku erdnîgariya çiyayên Xendeqîyan bi navê "çiya yê Khaldi" (Xaltî)ya jî hatiye kifşkirin û hingê ji çemê "Yanar Suyu" re jî gotine "Ava Yezîdxanê".




Çavkanî*3

Min jî di rûpelên pirtûkên xwe de daye xwanê kirin ku, Xendeqanî ne tenê navê eşîrekiye. Xendeqanî, navê herêma ku gelek eşîrên me Êzdiyan lê jiyân e. Ev herêma Xendeqîyan li navçeya Qubîn(Beşîrî), Batman, Heskîfê ye û yek ji deverên Ezdahîyan ya herî kevn e .

Li ser vê xarîte de jî xwanê dibe ku çiyayê Xendeqîyan ji bakur-rojhilatê Batmanê bi qasê 8 km pêve, li ser rêya diçe Merdînê(D955), dikeve milê çepê destpêdike, ji wir diçe ber ava çemê dicle û pira bajarê Heskîfê. Ji ber çemê dicle li ser milê çepê jî diçe heta serê herdû ava. Ji ber çemê "Ava Êzîdxanê- Yanar Suyu" li ser milê çepê diçe heta bakurê gundê Dûşa(Kumgeçit), Malêbiniyê, Mizareşê, ji wir dertê diçe heta derdora gundê Şimzê(Oğuz) û jî heta cardinê dizivire ser rêya Merdînê(D955).

Ji ber ku bîst salên min jî di nav vê erdnîgariya çiyayên herêma



Xendeqîyan de derbas bune, ez baş dizanim ku, di nav çiya yê „Khaldî „, Xendeqîyan de gelek kele, zinar, sarince, deşt, şikeft, gelî, newalên kûr û bi taybetî jî tenê li Heskîfê(binêren li ser wêne rastê) nêzî 15 hezar şikeft hene. Ev herêma, yek ji ciyê şûnwarê Kurdan yê herî kevn e.

Navê hinek şikeftên ku bûne şûnwar û sitara Êzdiyên li herêma Xendeqiyên ev in:

Şikeft-ên:

Çinêriya, Zêwê, Baleka, Siloderka, Qelo, Sîxwira, Sina Xirabe, Geliyê Nêrmê(Kela Vireyten), Geliyê Heşîşanê, Malê-biniyê, Sinê, Emer, Qerehê (li binê şikefta Emer e in), Qurê, Berzaneka, Gundê Şikefta Gêrê, Mexera Kerê, Qirna, Zivinga, Şikeftestûn, Girê-Mator, Çale Rijiyê û hwd. Her deverê ku şikeft lê hene, li wirê bi hindikayî Sarinceyeke avê jî heye.

Ez bawer nakim ku, ev şikeft û sarencên avê yên ku piraniya wan di zinaran de ne û meznaiya wan di navbêna 20-500 m² ye, bi destan hatine kolandin. Lê, eşkere

ye ku gelî, zinar, şikeft û kele di dema destpêka şaristaniyê de jî bo ku mirov xwe lê bisitirin û di dema şer de xwe biparêzin hatine bikaranîn. Ji xwe di zargotina me Êzdiyên de vêga hêjî baş xwanê dibe ku gelek ilimdar, babçak, qewal,



dewrêş û rihaniyên olî di nav şikeftan de rê û rismên ola xwe naskirine. Lewma hêjî gelek cejnên olî û parêzgehên pîroz di şikeftan de hene.

Gelek dîrozkane û lêkolîner jî mîna zargotina me dibêjin ku, şikeft bûne symbola gelek berxwedan û serhildanên me Kurdan. Rola şikeftan di nav çîrok, şano, efsane û romanen cihanê û bi taybetî jî di nav yên me Kurdan de gelekî mezine.

Lê mixabin, gelek kesên Kurd nikaren (anjî naxwazen?) eşkere bahsa hêza bav, kal, mîrek, oldar û serokeşîren me Êzdiyên, yên ku di nav van dever û cihên asê de li dijî êrîşkar û dagirkerên Kurdistanê berxwedanê biken. Lewma jî bigumanim, arkeolog û dîrozkane bi tarîxa şaristaniya Ezdahîtiya ku di nav şikeftên erdnîgariya Kurdistanê de destpêkirine nizanen. Û çî gava rêveberên şîrawara, arkeolog û dîrozkane li ser van kele, zinar, sarince, deşt, şikeft, gelî û newalên çiyayên ku Êzdî lê jiyane baş lêkolîn bikin, ewê jî bivînin, ev wargehên Ezdahîyan paytexta padîşahê cin, perî û hemû mîrekên Kurdan bûne.

Hêvîdarim ku Kurd dîroka şûnwar û kevnariya çanda bav-kalên me rast bidine naskirin û parastin.



Çavkanî*:

1. Kemal Tolan, Giringiya dîrok û şûnwarên Êzdiyên yên li herêma Hesenkêfê I û II -
2. Şerefhanê Bedlîsî, ŞEREFNAME (berî çarsed salan di 14.8.1597 de tamam kiriye k.t.)-Tarîxa Kurdistanê ya kevn- Zîya Avcî, Apec çapa yekema kormancî 1998 Swêd
3. Ev Xarîte ji ber Kitêba Dr.P.Müller Simonis, Durch Armenien, Kurdistan und Mesopotmien Mainz 1897, hatiye girtin.
4. Receb DILDAR - Li Wêranşar perestgeha Êzîdiyên - 2007
5. Dr. Mehmet Demirtaş, <http://toplumvetarih.blogcu.com/>, <http://www.ahlat.gov.tr/default.asp?id=70>

Ji dîroka rexneya wêjeyî kurdî\ Kurmancî



Heyder Omer\ Elmaniya

- 1 -

Danasîn :

Peyva (Rexne), di zimanê kurdî de, bi wateya peyva (Kirîtkî) bi kar tê. Ev peyv jî di bingeha xwe de girîkî ye, û ji wir derbas hemî zimanên ewropî bûye. Hemî ferhengên zimanên ewropî didine xuyakirin, ku wateya peyva (Kirîtkî) şirovekirin û gengeşkirina tiştêkî, diyardeyekê, karekî, têorekê, pirtûkekê, û berhemeke hunerî ye.

Gava peyve (Rexne) ya kurdî di warê wêje de bikara tê, mebest jê ew e, ku berhema wêjeyî ji her du aliyên wê ve; durv û naverok, gengeşe bike, warên serkevtî û yên neserkevtî yên wê berhemê diyar bike, jihev veqetîne, û biryara xwe di vê tengê de bide, bê ku nîr û rewşên civakî, wêjeyî û rewşênbirî yên dem û çerxa wê berhemê ji bîra bike.

Dêmek karê û barê rexneya wêjeyî ew e, ku berhemên wêjeyî, wêneyên wêjeyî, celebên wêje, li ber siha rêbazên curbicur û li gor têgehên jiyana wêjeyî, civakî, rewşênbirî, politîkî û dîrokî ya her çerxekê bixwîne, û wan berhemên ji her du warên ramanî û hunerî de binerxîne.

Her weha xuya dibe, ku rêbazên rexne ji bo ristina lêkolîna rexneyî gelek giring in, ji ber ku ewana yekemîn alava xwedî karînen kêrhatî in e di vê meydanê de. Ji ber vê giringiyê jî rexnevan nikare

wan rêbazan bi paş piştî xwe de bavêje, belê ew her tim hewcedarê rêbazekê an jî pira ye, da lêkolîna wî neşimitê û ji rê bi dernekeve. Vê lomê Stanlî Haymin weha diçe, ku rexnevanên hemdem bi xêra rêbazên xwe ji yên berê serkevtîtir in.(1)

Rêbaz, bi wateya zimanewanî, ji peyva (rê) hatiye, rê jî ew şûna ye, ku mirov tê re ber bi mebesta xwe de diçe, lê rêbaz, wek têgehê an wek tîmekê, wateya ristina gengeşkirina mijarekê dide.

Lê tiştê divê, mirov hay jê hebe, ew e ku têgeha rêbaza rexneyî û ya pilana lêgerînê pirîcar tevlihev dibin. Vê lomê divê lêkolîner ji bîra neke, ku rêbaza rexneyî nerîn û hinek lebatin e, ku di goşeyekê an di qoziyekê re li berhema wêjeyî dinêre û wê vedikole, lê pilana lêgerînê mofîrkên, ku di wê goşeyê re tene vekolandin, dirêse, ang wan mofîrkan organîze dike.

Lê her rêbazek di goşeyekê re li berhema wêjeyî dinêre, çî ew goşe dîrokî be, çî jî civakî, derûnî, û hunerî be. Lewre jî rêbazên rexneyî, li gor wê goşeyê û li gor felsefeya, ku rexnevan pê bawer dike, ji hevdu cuda dibin.

Ev yeka bûye sedema serek e, ku gelek rêbazên rexne yên curbicur derkevin holê, û hemî jî ji bo ravakirina berhema wêjeyî ji her du warên naverok û durvên wê ve tene xebitandin.

- 2 -

Destpêk:

Eger em vê mijarê li ba me Kurdan bipelînin, dê pîrsek li vir bête meydanê: Gelo rexneya wêjeyî li ba me heye yan na ?. Kînga peyda bûye, û gîhaye çî radeyê ?.

Prof. Dr. Î. M. Resûl (2) bersiva vê pîrsê bi erênî dide, û weha diçe, ku belê me rexneya wêjeyî heye, û dîroka wê ji Ehmedê Xanî de dest pê dike.

Rêzdar Prof. Dr. Resûl, dibîne ku ramana rexneyî li ba Xanî gelekî bi pêş de bû, û li gor rêbaza wî du refên rexnevan hene :

1. Refek ji wan xêrnexaz in, dilreş in, kîndar in, mebesta wan ew e, ku nivîsevanan dilsar bikin, û ji nivîsînê bi dûr xînin. Vê lomê jî her tim xalên neyênî di berhemên de dişopînin, û mezin dikin.

2. Refê din, ku xwedî karînen payebilind û behreya aferîner e, ewana dilsoz in, rexne di destên wan de alava pêşvebirina wêje ye. Ewana erênîyên nivîsevana berz dikin, û neyênîyan bi dilsojî nîşan dikin, û dibine alîkarên nivîsevanan , da neyênîyên avakirina berhemên xwe derbas kin. Ê van malikên Xanî ji Mem û Zînê werdigire, û ji bo vê boçûna xwe dike deyxax :

*Umîd ew e ji ehlê irfan
Ew dê negirin li min çi herfan.
Teşnî nekin wekî xeyûran
Îslah bikin li min qusûran.
Eshabê kemalê perde poş in
Erbabê xered di pir xiroş in.
Mamûl ew e ji ehlê razan
Ew dê nekin bi min tinazan. (3)*

Weha diyar e, ku Xanî bendewarê wî refê duwem e, ku armancên rexneyê ji bîra nekin, û li gor pêdiviyên rêveçûna wêje li berhema wî temaşê bikin, wê bixwînin û şirove bikin.

Her weha Î. Resûl dide xuyakirin, ku Xanî berztirîn usûlên rexneya wêjeyî diyar kirine û weha çûye, ku divê berhema wejeyî li ber ronahiya têgehên cih û çerxa xwe bête rexnekirin, û ji birêveçûna wêjeyê neyête cudakirin.

Tevî ku ev boçûnên Xanî, li gor dema wî û pergala rewşenbîriya gelê kurd, ya wê demê, gelek balkêş in, lê bi carekê xwe nêzîkî têora rexneyê ya xweser nekiriye, û rêbazên wê diyar nekirine, belê tenê, li gor Î. Resûl, hevtêkiliya berhema wêjeyî û qunaxa wê nîşan kiriye. Lê mirov dikare bi rihetî bêje, ku pêjna hinek usûlên her du rêbazên rexneyî, ku sûd ji raperîna romantîkan wergirtine, ji nerînên wî tê. Ango her du rêbazên bandûrî (impressionismus) û dîrokî.

Rexneya bandûrî (impressionismus) berhema wêjeyî şirove dike, û di dû re jî rexnevan nerîn û boçûnên xwe, li gor çêja xwe, û li gor bandûra, ku berhema li ser wî hêştîye, diyar dike, û rêbaza dîrokî berhema wêjeyî li ber ronahiya çerxa, ku wêjevan tê jiyaye, şirove dike, bê ku nîrên jiyana wêjevan û jînenîgariya wî ji bîra bike. Bi gotineke din, mirov dikare bêje, ku bûyerên dîrokî û kesayetîya wêjevan, li gor vê rêbaza dîrokî, dikarin bibin hêmanên giring ji bo şirovekirina berhema wêjeyî, anga dîrok ji bo wêje karmendiyeke zor giring dike.

Hêjayî gotinê ye, ku rexnevanê Firansa Tîn wek serkêşê vê rêbazê tê naskirin, ji ber ku ew weha diçû, ku divê berhema wêjeyî li ber ronahiya têgihêştina celeb û cî û çerxa wê were nirxandin, bê ku bibe dîla çêja rexnevanan.

- 3 -

Qunaxa HAWARÊ:

Lê pîrsa ku di pey van boçûnan re tê meydanê ew e: gelo çi gav piştî Xanî di vê meydanê de hene?. Bi rastî rewşa Kurdan ya li ber çavan bersiva vê pîrsê gelek zor û

zehmet dike, ji ber ku ji hêlekê de gelek berhemên Kurdan wendabûn, û negihan destan, û jî hêla din de haya nivîsevan û rexnevanên me ji hevdu tune ye, an jî kême e, dibê hinek berhemên rexne li hin deveran hebin, lê haya me jê tune ye. Tiştê li ber destên me hin gotarên curbicur, ku hin caran di kovar û rojnameyan de têne xuyakirin, lê wek pirtûkên xweser gelek kême e. Lê pîrcana ew gotaran jî nakevin destan.

Vê lomê, bi baweriya me divê mirov biryara dawî nestîne, belê divê çavên xwe bigerîne, heye pêrgî tiştina were. Berî pêşî dixwazim li xwe mukir bêm, ku tevî hewildanên xwe, min nikarîbû tiştêkî, ku belkî berî kovara HAWARÊ hebe, bi dest xista. Kovara hawarê para xwe dixwe vê meydanê, û hin gotarên curbicur bi pênuşên C. B û kesine din mîna Havindê Sorî di hej 6,7,8,32 de li ser edebiyata kurdî têne diweşîne, lê ewana ji dîroka wêje ve nêzîk in.

Tevî ku civandin û tomarkirina wêje xem û qisaweta hawarê ya tewrî giring bû, lê mirov di nav hin gotaran de pêrgî hinek nerîn û boçûnên rexneyî, an jî hinek metiryalên, ku ji bo rexne balkêş in, dibe. Wek nimûne, Herekol Azîzan (C . B) sala 1932yê gotarekê dinivîsîne, Melayê Cezîrî dide nasîn, û di hejmara 6ê de belva dike. Nivîsevan di gotara xwe balê ber bi rewşên (sîfet) kesayetî yên Mele de dikşîne, û dibêje:” Bejna Melê ne kurt ne dirêj, lê navîn bû, rûwê wî girover, sipî û sor bû, çav û birihên wî reş bûn, eniya wî fireh, stowê wî dirêj bû...Hergav bi ken bû, bi dora xwe re xweş bû, dilê xelkê ji xwe nedihêşt”. (4)

Herekol Azîzan bi vê yekê, ji hêlekê de, boçûna Xanî didomîne, û bi awayê êşkere balê ber bi kesayetîya wêjevan de dikşîne, û ji hêlekê de jî rê li pêş rexneya kurdî vedike, da alavên rêbaza derûnî bixebitîne, berhema wêjeyî li ber ronahiya wê rêbazê gengeşe bike. Pêre jî eger mirov ji bîra neke, ku rexneya wêjeyî li ba cîranên Kurdan, ku wê hîngê xwediyên karînen payebilin bûn, hîna ji nû de ev rêbaza derûnî nasdikir, dê nîrxê sanistî û dîrokî yê vê helwesta Herekol Azîzan bête naskirin, û dê bête zanîn, ku rexneya wêjeyî gaveke dine teorî ye balkêş ber bi pêş ve davêje, ji ber ku ev rewşên kesayetî li ba rexneya bandûrî û derûnî gelek nîrxdar in, çimkê rola wan di peydabûna û birêveçûna kesayetîya mirov de gelek payebilinde.

Dîsan gava kovara hawarê sala 1941ê, di hejmara 35ê de dest bi weşandina dîwana Melayê Cezîrî, ku Qedrî Cemîl Paşa guhestiye elfabeya latînî, dike, pêşogtineke kurt (ez bawer im bi pênuşa C.

Bedirxan e) di pêşiya xelesa yekê de tête weşandin, tê de ev gotin derbas dibe:” Dîwana Melê di nav Kurdmancan, nemaze di nav mela û feqehan de gelek nas e, û gelek nivîştên wê ên destnivîs hene. Me hêvî ji xwendevanên xwe heye, ko nivîšta Qedrî begî deynin ber nivîştine din û ferqên ko di nav nivîştan de bibînin ji me re bidin zanîn. Em wan di hawarê de belav dikin, û piştî ko dîwan bi temamî qediya em li van ferqan hûr dibin û ji wan nivîşteke tekane difînin pê”.

Nivîsevanê kurtepêşgotinê bi van gotinên jorîn deriyekî dine têorî li pêş rexneya kurdî vedike, û balê ber bi tûjandina (tehqîq, تحف—يق)berhemên kevin de dikşîne. Ji ber ku berhemên kevin li ba her miletan, bi sedema çapnebûnê û destnivîsînê, dikevin ber dava hinek guhertinan, lewre jî ewana beriya çapkirinê têne tûjandin û nivîšta herî rast çap dibe, lê di wê çapê de hemî nivîştên, ku hatine berhevkerin, têne nîşankirin.

Boçûnên Hawarê, nemaze yên C. Bedirxan didine xuyakirin, ku cudahiya, ku di navbera rexneya wêjeyî û dîroka wêje de heye, li pêş wî sayî dihate xuyakirin, ji ber ku gava ew sala 1941ê gotara (Klasîkên me) bi navê Herekol Azîzan di hejmara 33yê de diweşîne, weha diçe:” Heke îro em vê bendê dinivîsîn, mexseda me ne ew e, ko em li vê behsê hûr bibin û klasîkên xwe bisenifînin. Bi tenê em dixwazin vê behsê vekin; bi hêviya ko hinên din pê mijûl bibin û tiştêkî tekûz bi ser xin. Di vê bendê de emê bê awarteyî qala hemî şahir û edîben kurdmanc bikin yên ko bi kurdmancî nivisandine. Heye ko hinekê wan bi tenê şahirê dîwanê ne û ne klasîk in. Bila misenifê klasîkan bi wan mijûl bibe û klasîkan ji neklasîkan bibijêre, û heqê herkesî li gor hêjabûna wî bidiyê”.

Dêmek xwediyê vê boçûna jorîn sînor û tixûbên, ku di navbera zanistên wêje de hene, naskirine, lewre barê her zanistekê jî xwediyê wê re dihêle, da pê rabe. Pêre jî dizane, ku nixandina hunerî ne stubarê gotara, ku hinek helbestvan û nivîsevanan dide naskirin e. Her weha ev boçûna C. Bedirxan bala rexnevanan ber bi warekî rexne yê giring de dikşîne, û dide xuyakirin, ku karê rexneyî li ber deriyê şirovekirina naveroka berhemê û melevaniya di hundirê wê naverokê de tewaw nabe, belê bi ser de jî divê rexne awayê avakirina berhemê ji bîra neke, ji ber ku ew awaya dikare hem berhema wêjeyî ji ya zanistî veqetîne, û hem jî dikare şûna wan berhemên wêjeyî di nav rêbazên hunerî de nîşan bike.

C. Bedirxan, bi vê nerîna xwe, gaveke zor payebilind bi pêş rêbaza bandûrî de diçe, ji ber ku veqetandin û bijartina kilasîkan ji nekilasîkan, ne tenê rola çêja tekane nizim dike, belê bi ser de jî wê napejirîne, çimkê ev cureyê bijartinê xwe bi ser behaneyan de pal dide, ew behaneyan jî divê ji hundirê berhemê bêne derxistin. Nerîna ku bêje ev berhem baş e, û serkevtî ye, û behaneyên wê serkevtinê diyar neke, dê her û her bi biha bimîne.

- 4 -

Qunaxa pey HAWARê, heya 1985:

Bi baweriya me, nerîn û boçûna rexneyî di vê qunaxê de, li ba Dr. N. Zaza gaveke dine balkêş ber bi pêş de davêje. Ewî sala 1957ê ji bo yekemîn çapa dastana Memê Alan pêşgotineke nirxîbiha nivisandiyê, di wê pêşgotinê de balê ber bi hevtêkilya derbirinê û hest û agehan de dikşîne, û weha diçe:” Malik bi xwe ne mewzûn in: beytên pir dirêj û beytên pir kurt hene.....ev tişt li gora bêhna dengbêj tête saz kirin. Li gora rêzê şîrê yên kevn ev awayê ha bê qîmet tête jimartin. Lê li gora edebiyata îro, li gora şîrên serbest dibin eserên pir hêja”.(5)

Ev boçûna Dr. N. Z doza wekheviya her du pevekên helbestî û hestewerî dike, û weha diçe ku divê peveka helbestî li gora ya hestewerî bête guhertin, ji ber ku hest û agehên helbestvan çî carekê li şûnekê namînin, belê wek çawa ava newalan her tim diherike, û li şûnekê namîne, û tu nikarî du caran di avekê de melavaniyê bikî, her weha hestên mirov jî her tim diherikin û têne guhertin, û hevtêkilya mirov li gel jiyan û heyînê her tim bi awakî namîne, belê ji ciyekî ta yê din, ji heyamekê ta ya din, ji çerxekê ta ya din tête guhertin, pêre jî divê peveka helbestî, ku wan hestan û cureyê tégihêştina mirov werdigerîne, bi qaserî ya hestewerî be, ne her tim li kêşekê siwarkirî be û li ba rêzbendekê bi dawî were.

Dr. N. Z bi vê nerîna xwe gaveke din ber bi rêbaza derûnî de diçe, û piştî rêbaza kilasîk dişkîne, û mizgîna serkevtina helbesta serbest dide. Lê bi ser de jî ew ji rêbaza hunerî ve jî nêzik xuya dibe, ji ber ku taybetmendiyên peyvyan ji bîra nake, lewre dibêje:” Di zimên de bêjeyin, dengin hene ku bi dengê ku didin mana wan xuya dike”(6). Rexneya kurdî bi evan her du boçûnan gavên hêja ber bi pêş ve qevastine, ta ku mirov dikare bêje ew ji hundirê deqê wêjeyî vê nêzik bûye, ku ji hundir de lê binere, ango ew bi gaveke berbiçav ber bi rêbaza hunerî de diçe; ev rêbaza, ku Yong dibêje bê wê mirov nikare rastiya huner binase (7).

Pejirandinina evan nerînan, heya îro li ba gelek rexnevanên cîhanê, nirxbihayê wan û yê xwediyên wan diparêze. Piştî derçûna pêşgotina Memê Alan heya sala 1969ê, destên me negihane çî tişt û boçûnên din, belkî tiştê li hin deveran hebe, lê me hay jê tune. Di wê salê de lêkolînerê kurdên Azerbeycanê, navê wî Esker Şamilov e, hinek helbestên Cegerxwîn vedikole, pirtûkekê bi sernavê (Efrandinên şayîrê kurd Cegerxwîn) amade dike. Şamilov di vê xebata xwe de balê ber bi ritme û awaza helbestê de dikêşîne, û nixr û bihayê ritmê di avkirina tevgera hundirê helbestê de dide xuyakirin. Şamilov bi vê berhema xwe gaveke dine balkêş, lê vê carê pratîkî, di meydana rexneya wêjeyî kurdî de ber bi pêş de davêje. Ev pirtûka Şamilov, wek ku ji pêşgotina Prof. Dr. Q. Kurdo ji bo dîwana Cegerxwîn (Zenda-Avesta) nivisandiyê tê xuyakirin, gaveke hêja ye di qada rexneya wêjeyî kurdî de, nemaz jî ewî li ba şirovekirina durvên helbesta Cegerxwîn ya wê hîngê gelek cefa daye(8).

Ritme û awaza helbestê bala seydayê Tîrêj jî kişandiye, ewî jî di hevpeyvînekê de li gel kovara Gelawêj sala 1979ê biha û rola kêşê di helbestê de gelekî bilind nixradiye. Tevî ku awir û boçûnên rexneyî yên nîfşê pêşîn ji helbestvanên me gelekî kêr hatine diyarkirin, lê hin caran mirov pêrgî tiştina tê, wek vê nerîna Cegerxwîn, ku nikare helbestê bê kêş bipejirîne:” Hin xortên nûhatî dixwazin ristê jî weke stranê serbest bikin û guh nedin kêş û dawiyê”. (9)

Seydayê Cegerxwîn bi vê boçûna xwe berzîrîn mercên rêbaza kîlasîk nîşan dike, çimkê helbest li ba wî rist e, û serkevtirîn mercên ristê jî hebûna kêşê û rêzbandê ye.

Cegerxwîn careke din boçûnîna teorî diyar dike:”Rojekê li dikana mela Hesên, xortan doza ristekê li min kirin. Di hindirê dikanê de min rista (Em guhderz in) got... Xelkê wan navan bi carekê li hawîr dikana mela Hesên civiyan û derê dikanê hate girtin. Yekî Xerab Babanî, mirovekî girs, bilind ko rengê Kurdên çiya dida xuyakirin, ew çeper çirand û xwe gihande derê dikanê. Çawa ez dîtîm, axînek kişand û got:”Tiya, heyfa kurê bavên ko wilo dihn dibin!.. Vî camêrî hîngê xwendiyê, dihn bûye”. Lê min dengê xwe nekir û dev ji rista xwe berneda. Tenê heval pê kenîyan. Zanîbûn ko ew nizanî ka ez çî dibêjim, nizanî ko doza serbilindîya wî û mîletê wî dikim, . Nizanî ko dixwazim wî û bi milyonan weke wî ji bin darê zorê û setemê derxim, û ji pêlên xwîn, şer, berberî, dubandî, talan, şewatê bi şewitandina laşê xwe, bi dîniya xwe, bi van ristên

xwe, wan bigênim delavê serbestî û peravên azadî û felatê” (10). Ev boçûn helwesteke teorî ye, ji hêlekê de asta zanîn û hişyariya civakê û karmendiya helbestê nîşan dike, ev yeka jî nerîna Cegerxwîn ber bi dîrokî de dikêşîne, û ji aliyê din de hinek rûdaw û rewşên huneriya helbestê diyar dike. Lewre jî mirov dikare du taybetiyên sereke û giring ên bingeha helbestê, li gor nerîna Cegerxwîn, di nav xêz û paş gotinên wê de bibîne, yek ji wan li gel zimanê axiftina helbestî girêdayî ye, û ya din li gel şeweyê derbirina helbestî standî ye. Lê berî pêşî divê ji bîra nebe, ku helbest li ba Cegerxwîn rist e. Ev yeka jî nerîna wî ber bi rêbaza hunerî de dikêşîne.

Sê rewşên axiftina helbestî, li gor vê gotina Cegerxwîn hene ;yek ji wan ravabûn e (eşkere),ku divê helbest hêsan be, her kesek têbigihîne, û ya din yekserî ye, ku divê wêneyên wê hêsan bin, û ya sisîyê xiroşanî ye(hemasî), divê peyv û pevekên wê bi teqil bin, dev û gulman dagirin, da delameta xwe ya civakî, ku hişyarkirina civakê mebesta wê ye, zû pêk bîne, û bandûra wê li xweneran zû kef bide. Ango divê helbest li gora asta têgihêştina civakê bête ristin. Her çiqas ev boçûn li ser huneriya helbestê giran e, û wê nizim dike jî, lê ji hêleke din de, nemaze ji warê kêşê û ravabûna helbestê de, ew ji pêdiviyên rêbaza kîlasîk bi dûr de nakeve.

Rexneya wêjeyî sala 1980 careke din boçûna Dr. N. Zaza, ku me li jor nîşan kiribû, didomîne.

Me gotibû, ku Dr. N. Zaza doza wekheviya her du pevekên helbestî û hestewrî dike, lê vaye Kemal Burkay sala 1980 hevgerêdana naverok û durvê berhema wêjê pêwîst dibîne. Tevî ku Kemal Burkay di nav Kurdan de wek siyasetmedar hatiye naskirin, lê ew helbestvan e jî, gelek helbestên wî wek dîwan hatine çapkirin.

Kemal Burkay di wê salê de pêşgotina dîwana Cegerxwîn (Ronak) dinivîsîne. Ev pêşgotin du xalên berbiçav nîşan dike ; yek ji wan ew e ku, nivîsevanê pêşgotinê delameta pêşgotinan baş naskiriye. Tevî ku ew jî wek hemî nivîsevanên pêşgotinan, tenê li ba naveroka helbestên wê dîmanê rawestiye, lê hinek boçûnên wî rê li pêş nivîsevanên pêşgotinan vedikin, da delameta wêjeyî û rexneyî ya pêşgotinê bi cih bînin, û wê ji warê pesnên bê biha bi dûr de bixin.

Xala din ew e, ku Kemal Burkay doza yekîtiya durv û naveroka berhema wêjeyî dike gava dibêje:”kere ye ku xweşikî û delaliya şîer bi yekîtiya raman û his û şîkil pêk tê »(11). Tevî ku ev boçûn li ba rexneya mîletên din ne nû ye, ew ji bermayên rêbaza romantîkê ye,

û heya îro jî tê dubarekirin, lê di tenga rexneya kurdî re, tevî ku dereng jî hatiye, gelek balkêş e.

Belkî hinek bibêjin, ku hevtêkiliya durv û naveroka berhema wêje ji zû de li ba wêjevanên me diyar e, û helbestên helbestvanê mafwenda Qedrî Can wek nimûne nîşan bikin, emê jî xwe bidin kêlek nerîna wan, ji ber ku, ji hêlekê de, aferîn, bi gelemperî, her tim di pêş tevgera rexneyî de dest pê bûye, lê ji hêla din de divê ji bîra nebe, ku boçûnên ji wî cureyî her tim li ba aferînerên kurdan lêvane mane, û dereng derbas nivîsîna kurdî bûne.

Helwesta Herekol Azizan, ku sala 1932yê di gotareke wî de diyar bûbû, û ya Dr.N.Z wek çawa me berê jî ew nîşankiribû, ku hinek giranî dabûne pêdiviyên rêbaza derûnî, ev helwest sala 1983yê li ba Ordîxanê Celîl deng vedide.

Ordîxanê Celîl, di pêşgotina ku ji dîwana Cegerxwîn (Hêvî) re nivisandîye de, bi awayê êşkere doza xebitandîna rêbaza derûnî dike, gava dibêje : « Cigerxwîn emrê xweda neî xort e, lê xort e û xurt e bi şuxulê xweva, bi qewata helbestê xweva. Ew xort e, çimkî her dem xwe dide ber çetîna û bi qewata xortaniyê ew çetîneyê alt dike »(12).

Weha diyar e, tevî ku tevgera rexneya wêjeyî li ba me Kurdan lawaz e, lê ewê li gora vê rewşa tehl û dijwar, ku Kurdan dorpeç dike, ne xwendin, ne dibistan, ne sazîyên wêjeyî, ne û ne...ewê gavên ber bi çav qevastine, lê me çî caran dîroka wêjeya xwe baş tev nedaye, da ser wan çirûskên, ku di bin tariya salan de hîna jî pêtekî mane, vedin û zêtê bi ser wan de kin, da ronîtir bibin.

Belê, tevî ku ew çirûskan, li gor rewşa tevgera me ya wêjeyî, gelek nixrdar in jî, lê ewana nikarîbûn têora rexneyê ya xweser peyda bikin, ji ber ku pirên cefayên rexneya kurdî li ba gava yekem ya karê rexne mane, û her duwên mayîn bi paş piştî xwe de hêştine.

Wek tê zanîn, xebata rexneyî di sê gavan re derbas dibe. Tevî ku ew her sê gav di nav hev re derbas dibin jî, lê mirov dikare ya yekem bi gava şirovekirinê binavîne, ku rexnevan hîngê wateyên berhema wêjeyî (naverok), ku nivîsevan dixwaze biderbirîne, diyar dike, û gava duwem jî bi gava şînkirinê (tehlîl) binavîne, ku rexnevan hîngê awayê derbirîna wan wate û raman û hestan vedikole. Ango gengeşekirina durvê hunerî yê berhemê, ku naverok û hest û nestên nivîsevan hilgirtîye, qisawet û kar û barê vê gava duwemîn e. Gava sêyem jî ew e, ku rexne serkevtin yan jî neserkevtina nivîsevan di lihevkerina durv û naverokê de dipelîne û

biryarê dide. Her gavek ji van her sêyan gelek şaxên wê hene, rexneya wêjî nikare çavên xwe li ser wan damirîne.

Jêder :

- (1) Stanlî Haymin. Rexneya wêjî û rêbazên wê yên nû. Wegera erebî : Îhasan Ebbas û Mihemed Yûsif Necim. Beş 1, nimra çapê nediyar e. Bêrût 1958, rû 12.
- (2) Ehmed Xanî helbestvan û ramanbîr, filosof û mitesewuf. Çapxaneya Elhewadis, nimra çapê nediyar e, Bexda 1979, rû 236-238.
- (3) E. Xanî: Mem û Zîn, vekolîn û şirovekirina Mihemed Emînê Osman, çapa yekem, çapxana El-Cahiz, Bexda 1990, rû 70, ma 353-356. Umîd: Hêvî, Teşnî: Kirêtkirin, Perde poş: Sir, raz veşêr, Xiroş: pîrbêj, Raz: Sir.
- (4) Hemî nimûneyên me ji ber kovara hawarê wergirtine, ji berhevoka, ku rêzdar Ferat Cewerî sala 1998 li Siwêdê çapkiriyê hatine wergirtin.
- (5) Dr.N. Zaza (çîroknivîs): Memê Alan, pêşgotin, weşanên Riya Azadî, çapa duwemîn (rastî çapa sêyemîn e) Köln 1990, rû 16.
- (6) Jêdera navborî, pêşgotin, rû 18.
- (7) Mistefa Siwêf. Bingehên derûnî yên aferîna hunerî nemaz di helbestê de. Bi zimanê erebî. Navê çapxanê û nimra çapê ne diyar in, Elqahîre 1981, rû 88.
- (8) Pêşgotina, ku Prof. Dr. Qenatê Kurdo ji bo dîwana Cegerxwîn (Zend-Avesta) nivisandîye, em bi vê xebata Eskerov Şamil haydar kirine.
- (9) Cegerxwîn: Folkilora kurdî. Nimra çapê ne diyar e, stockholm 1988, rû 111.
- (10) Cegerxwîn, Jînenîgariya min. Weşanên Apec , çapa yekemîn, Stockholm 1995, rû 191.
- (11) Kemal Burkay. Pêşgotina dîwana Cegerxwîn: Ronak, weşanên Roja nu, nimra çapê ne diyar e, Stockholm 1980, rû 9.
- (12) Ordîxanê Celîl. Pêşgotina dîwana Cegerxwîn: Hêvî, weşanên Roja nu, nimra çapê ne diyar e, Stockholm 1983, rû 8.

Mehfel

Govareke rewşenbîrî werzaneye

jimare

(3)

Zivistan
2011

Xudanê imtiyazê
Rêsan Hesên Cindî
resandinay@yahoo.com
07504501690

Sernivêskar
kovan rêsan Xankî
Xanki_kovan@yahoo.com
07504969810

Sikirtêrê nivêsinê
Hecî Mexso Heso
Hijy_mag2010@yahoo.com
07504576304

Desteka nivêseran:
Misto Liyas Dinanî
Merwan Şêx Hesên Reşkanî
Liyas Ne'mo Xetarî

Derhênana Honerî
Xankî

g.mehfel@yahoo.com

çapxana Hawar - Dihok

*Mehfel ye destur
daye ji bal sendîka
rojnamenivêsen
kurdistanê ve, li pê
biryara jimare (272)
li roja (10\6\2010).*

*Şiklê rexa erebî; hilêlên qubên xasên êzidiyanin. Yê rexa latînî; jinek êzidî
ye di dema du'ayê de li ber dara mirazan li ser çiyayê Erefatê li peristgeha
pîroza Lalîş. Herdu şiklî ji bal Xankî ve hatine girtin.*

Babetên di govarê de derbirîne ji boçona nivêskaran dikin

www.arsivakurdi.org